

# Kenê Parsek

Hesen Qizilcî

avesta

HESEN QIZILCÎ•Kenê Parsek

**avesta | EDEBIYAT: 95 | 18**
*Pêkenînî Geda (Kenê Parsek)*
*Hesen Qizilcî*
*Ji Soranî bo Kurmancî*
*Şikriya Salih*
*Firat Kelehkî*

Edîtor: Abdullah Keskin
Berg: Ahmet Naci Fırat
Tîprêzî û Mîzanpaj: Avesta
Çapa Yekem: 2001, Stenbol
Çap: Berdan Matbacılık

© Weşanên Avesta, 2001
Ji xeynî danasînê bêyî destûra nivîskar û weşanxanê
bi tu awayî nayê kopîkirin

AVESTA BASIN YAYIN
REKLAM TANITIM MÜZIK DAĞITIM LTD. ŞTİ.
Meşrutiyet Caddesi
Özbek İşhanı 136 / 4
BEYOĞLU / ISTANBUL
Tel-Faks: (0212) 251 71 39
(0212) 251 44 80

Ekinciler Caddesi
Nurlan Apt. Giriş Katı No: 2
OFİS / DİYARBAKIR
Tel-Faks: (0412) 222 64 91

**ISBN: 975-7112-49-6**

Hesen Qizilcî

# KENÊ PARSEK

*Ji Soranî bo Kurmancî*
Şikriya Salih
Firat Kelehkî

avesta

HESEN QIZILCÎ - Di sala 1914'an de li gundekî di navbera Bokan û Mehabadê de hatiye dinyayê. Di nav malbatek zana de mezin bû. Li ber destê mamên xwe hînî farisî û erebî bû, lê melatî nekir. Piştî avakirina PDK bû endamê partiyê. Di 1946'an de bi avakirina Komara Mehabad re gelek kovar û rojnaman dest bi weşanê kirin. Qizilcî, sernivîskarê kovara *Helale* bû ku bi taybetî ji bo keçan derdiket û di kovara *Kurdistan* de jî nivîsên wî derdiketin. Piştî hilweşîna Mehabad derbasî Kurdistana Iraqê bû, ji wir jî çû derveyî welat. Bi ketina rejîma Şah re, di 1979'an de vegeriya Îranê. Endamê Tudeh û berpirsê rojnama *Nameyê Mardom* bû. Di sibata 1984'an de hate girtin. Ji hingê heya niha kesî tu xeber jê nesitand, kes nizane çi pê hat û li kû ye.

# NAVEROK

Pêşek-Hêmin Mukriyanî / 7

Kenê Parsek / 17
Edetên bazarê / 23
Bîne lê bi nav neke / 29
Tac û textê Emer Axa / 35
Ocaxa Axa ronak e / 41
Xemla pembû / 47
Serfitre / 53
Keşkola efsûnî / 59
Şehîdê zilmê ye kefen û şûştin jê re navê / 69
Nivişta Amîne Xan / 75
Hêkên Hadî Xanî / 83
Ji bedêla pereyên bertîlê xwendina Qur'anê / 91
Ne bi dîtina hecî ne bi xewa mizgeftê / 97
Çaya dîwanxanê / 103

Ferhengok / 111

# Pêşek

Şev dereng e, bêdengiyeke bi saw, odeyeke sar û seqem û vala; ez bi nîvtariyekê dagirtî me. Ji xwendina van çîrokan ve bûm. Di rewşeke ku karekî zor xistiye ser mix û damarê min, rondikên hûr bi min werandin. Ez bi hêdî deftera xwe dideynim û rondikên xwe pak dikim, çiraya xwe vedimirînim, dikevim nav cihê xwe û çavê xwe digrim; belkî bikaribim hinekî razim ji xwe re û xemên xwe ji bîr bikim.

Lê xeyal min hildigirin û dibin.. dibin.. dibin nav dar û deviyan, deverên dijwar, ser berfê, serê çiya û zozanan, nav daristanan û ser çîr û piran... Min dibin ber bi newaleke xweş û bi heywanan dagirtî, ber bi deşt û gor û riyeke bêxîz, bêber û nerm de; ber bi besta Çemê Tetehû de û heya bi bajarê piçûk ê Mamoste, Bokan... Min dibin bûka bajarên Kurdistanê, kaniya evîn û dildariyê, kemîna xebat û fedakariyê; min dibin bo gora serdarê şehîd, bo ser hewz û kaniyên ciwan û bi nav û deng; ji bo temaşekirina bejn û bal, xal û mil, çav û birh, kezî

û por, paqên belek û ser û serpêç û desmal û newq û piştêniyên keçên Bokanî ku dest bi dest û komik komik wek refên xezalan bi naz û nazdarî têne ser hewz, cêrên sor û neqişandî bi nazî di avê dadikin û di wêneyên neynika ronak û pakî ya hewz de sîmayeke asîmanî heye weke ku ferişte û perî tên ber çavê mirov; hiş û zewqê tije û zêde dikin û hest û xeyal winda dibin.

Guhê xwe didim dengê wan zarokên xwînşêrîn, nesekinî û rût ên helawfiroş ku sêniyên helawê digerînin bi miqamekî xweş û dikin hawar:

"Helawa Tentenanî

Heya nexwî nizanî"

Di nav cihê xwe de bi vî alî û wî aliyî de diçim. Bi bêhevî axînekê dikêşim û di ber xwe de dibêjim, xwezî û hezar xwezî ez jî wisa pîr, nexweş, bêhez û birîndar nebûma; ew çende hêz, gurr û tîna min hebûya da ku ji wan çîrokan min himbêza xwe tije bikira û li her bajar, gund, kolan û kuçeyên Kurdistanê bigeriyama û bi dengekî bilind min jî hawar bikira:

"Xelkno! Heger we tiştek ji helawa Tentenanî şêrîntir û ji gulên newalan bi bêhn û bêhnxweştir divê, divê hûn werin; werin bixwînin, dîsa bixwînin heya axîneke xweş di dil û hinavên we de bigere. Bixwînin heya tîna we bişike, bixwînin heya agir û şewata nava we vemire. Bixwînin heya ku hûn civaka xwe binasin û derd û êşên wê fêm bikin. Bixwînin heya ku bêhtir kêfa we ji zimanê we re bê. Heya ku hûn nexwînin, hûnê nizanibin ku pênûsa bi sêr a Mamoste Qizilcî çi şiwênwarekî (wargehekî) bi nirx û bêmîsal afirandiye. Bîr û baweriyên azad, xeyalên berz û hestên nazik ên vî nivîskarê hêja çi mînakeke edebî ya bilind rijandiye û tiliyên bi hêz û rengîn ên vî hunermendê mezin risteyeke çawa ji durr û mirwer û gewherê hêjatir ji bo we hûnaye."

Li Mukriyan bav wiha dibêjin; "Malbata Qizilcî weke çîçi-

kên werdekan, nû ji hêkan derdikevin, melevan in." Mebesta wan ew e ku her kî ji wê malbatê be, hê ji zarokatiyê ve zana û jêhatî ne. Bi rastî jî ji vê malbata bi rêz gelek zilamên hêja û zana derketine. Bêyî xwesteka wan nav û dengê wan bi zanist û hunerê li cîhanê belav bûye.

Hesen Qizilcî neviyekî têgihiştî ye ji vê malbata mezin ku cihê şanaziya neteweya me ye. Wî rêbaza bav û kalên xwe negirtiye û riyeke din hilbijartiye ji bedêla xizmeta ayînî ku riya bav û kalên wî bû. Wî karê edebî hilbijartiye. Lê edebiyateke çawa? Edebiyateke bilind a civakî...

Yek ji siyaseta serxur a Rizaxan Pehlewî ku di dema desthilatdariya xwe ya reş a faşîst de, xebata bêwijdan û bêrehmane bû ji bo sertewandina gelê kurd li Kurdistana Îranê. Ji bo bicihkirina vê mebesta şeytanî tore, dever, cil û berg, ziman, edeb, muzîk û govendên kurdan bi tundî qedexe kiribû.

Lê belê bi ser wê hêza şeytanî de ne ku her kurdê xweragir nebeziya û ji heqî wê derneket; belkî jî ev siyaseta zilm û zorê ya polîsên Rizaxan bû sedema serhildaneke fireh a ramanî li Kurdistanê.

Bi hezaran cemedan û şûtik, şal û şapik û kulavên zilamên kurd; serpêç, desmal û xeftanên jinên kurd hatin dirandin û şewitandin. Lê dîsa jî cil û bergên kurdî her weke remzeke neteweyî ma.

Li xwendegeh û dayireyan, li ser kuçe û kolanan bi hezaran kurd bi tawanbarkirina axaftina kurdî hatin girtin û îşkence û sivikayetî li wan hat kirin. Lê zimanê kurdî weke sermiyanê neteweya xwe hat parastin. Kurd têk neçûn û şermezarî û rezîliya dîrokê her ji bo polîsên Rizaxan ma.

Di wê serdema reş, tarîk û nexweş de li Herêma Mukriyan li dijberî siyaseta jinavbirîna (bişaftina) kurdan, komeke nehênî ji zana, rewşenbîr û rîspiyên kurd bi rêberiya Mamoste Mele Ehmedê Fewzî, Seyfî Qazî, Pêşewayê Nemir, Qazî Bo-

kan, Şêx Ehmedê Sirêlaawa û bi beşdarbûna gelek ji rewşenbîrên wê serdemê, pêk hatibû. Ku armanca wan a bingehîn û herî mezin parastin û rûmetdayîna ziman û edebiyata kurdî bû. Pirtûk û rojnameyên ku li Iraqê belav dibûn, bi zehmetî peyda dikirin û bi nehênî li wan gencên cihê baweriyê belav dikirin heya ku fêrî xwendina kurdî bibin. Wan -bi taybetî Mamoste Fewzî- komeke gencên rewşenbîr têgihand ku di diwarojê (pêşeroj-dahatû) de şair, nivîskar û gelek xebatkarên bi nav û deng ji wan derket. Yek ji wanê ku Mamoste Fewzî û hevbîrên wî ew perwerde kiribûn jî, Kak Hesen Qizilciyê me ye û her di wê demê de fêrî xwendina kurdî bûbû. Wê dema ku desthilatdariya serxur a Pehlewî bi dawî bû, mij û dûmana bedbextî û çarereşiya kurdan jî nema; dem bû weke stêrkeke geş û ronak li asîmanê edebiyata kurdî û laperên kovar û rojnameyên kurdî bi nivîsînên ciwan hat xemilandin. Di dema Komara Demokratîk a Kurdistanê de Mamoste Qizilcî bêyî ku sînga xwe bi pêş de bibe û xwe diyar bike, yek ji wan dostên xoşevîst û herî nêzîk ê Pêşewa Qazî Mihemedê edebdost û hunerperwer bû. Ji bilî ku li Rojnameya Kurdistan Organî Hizb* dinivîsî, sernivîskarê kovara ciwan a Helale** jî bû.

Pêşewa, di dawiya rojên desthilatdariya xwe de bi nêt bû ku Mamoste Qizilcî û çend şaîr û nivîskarên genc ên nûtêgihiştî bişîne derve, -li gor baweriya xwe- da ku derdora xwe bibînin û tiştine nû fêr bibin. Lê mixabin ev daxwaza wî jî nebû weke wan daxwazên wî yên din ên pîroz ku bi cih nebûn. Wekû niha li bîra min e û heya axê jî berdin ser çavê min ji bîra min naçê; rojeke sar û cemidî ya Mehabad bû, bagereke sar dihat û gulokên berfê hildida. Min xwe qof kiribû û bi lez diçûm da ku cihekî germ bibînim. Min temaşe kir ku Pêşewa li ber hê-

* Organî Hizb: Rojnameya siyasî a partî-hikûmetê bû, di dema Komara Mehabad de. (W)

** Kovarek edebî a wê demê. (W)

wanê diçû û dihat û Rojnameya Kurdistan di destê wî de ye, yek ji nivîskarên rojnameyê jî li cem e. Bi nêt bûm xwe veşêrim û bibihûrim. Wî ez dîtim û bangî min kir. Hê ez li dûr bûm wî got; "Ma te dîtiye Qizilcî çawa nivîsiye?"

Min zanî ku mebesta wî ew nivîsîna edebî û ciwan a Qizilcî ye ku di wê jimarê de hatiye çapkirin. Min got; "Belê, min dîtiye û bi rastî xweş nivîsiye..." Kekê nivîskar xwe avêt nav û got; "Belê, xweş dinivîse, lê kêm dinivîse."

Pêşewa, di bin lêvan re keniya, serê xwe hejand û ev her du beytên Sadî xwendin:

Xak mexrîb şenîdeam ke konend
Be çihel sal kaseyê çînî
Sed be rûzî konend der Bexdad
Lacirim qîmeteş hemî bînî

Bi Xwedê xweş lê hat! Mela Mistefayê Sefwetî ev wiha kiriye bi kurdî:

Min bihîstiye ku li Rojhilat
Di çil salî de şûşeyekê çêdikin
Li Merdeşt sedî di rojekê de çêdikin
Ji ber wê qîmetê wê wiha dibînin

Dîsa berê xwe da min û got; "Xwezî gelekên me yên wiha hebûyana!.." û berî ez bersivê bidimê wî bi xwe got; "Ger em ji bo xwe bin, wê gelekên wiha ji nav me rabin."

Mixabin, hêlîna me gelekî zû li me xerabû; sîbera wan mirovên niştimanperwer, edebdost, hunerperwer û qedirzanên me ji ser me çû. Qizilcî jî mîna gelek şaîr û nivîskarên kurd bê enwa' û bê alîkarî, dilsoz maye û ji ber zilm û zora rejîmê aware û derbiderî Ewrûpa bû.

Her ew bi xwe dizane, di wê dema dûr û dirêj de, di wê lêqewmîn û derbideriyê de çiqasî talî û şoriya jiyanê tam kiriye... Çiqasî serma û germa cîhanê dîtiye, çend bela û nexweşî bi ser de hatine... Çiqasî hatiye girtin û îşkence lê hatiye kirin;

wî birine vî alî û wî alî... Ji bo peydakirina pariyek nanê bêminet neçar bûye, bi wê bêdesthilatiya xwe karê sext û giran bi fizîkiya xwe bike û serî ji bo tu kesê nekes netewîne.

Mamoste, di meydana xebatê de şareza bû; pak e û ji axê derketiye. Ji wê rencê, derdeserî û derbideriyê fêrî tiştan bûye. Di warê zanistî de ber bi pêş çûye, gelek tecrube wergirtine, civaka xwe baştir nas kiriye, hest bi êş û janê kiriye, derman jê re dîtiye û bûye feylesofekî pispor û nivîskarekî realîst û rastbîn.

Pêlewanên çîrokên Qizilcî, qet yek ji wan jî ji xwendevanên kurd re xerîb nayên. Hemû ji çîn û tebeqeyên civaka kurd hilbijartine, karesatên jiyana wan bi kurdiyeke sade (zelal, petî) û bi zimanekî wisa nivîsiye û şîrove kiriye ku kurdekî ne xwendevan, cahil jî têbigihê.

Xwendevan bi ciwanî têdigihe, Mamoste Qizilcî heya bi çi radeyê şarezayî, zanistî, rawanşinasî (psîkolojî) ye û çawa giyanê pêlewanan nas kiriye û çûye kûriya dil û hinavên wan.

Mamoste Qizilcî civaka kurdan ji hemû kesî bêhtir nas kiriye. Xwendevan di van çîrokên kurt de nimûneya jiyana derebegekî zalim (çekmereq), kevnebegekî barkêş î kewitî, şêxekî destbir, derwêşekî zergweşên (şîş li xwe dan), cotkarekî zilm lê hatî kirin, zirnokerekî zimandirêj, karbidestekî bertîlxwer û biyanî, bazirganekî sûtxwer (faîzxwer) û temakar, casûsekî niştimanfiroş, jineke tenê ya bedbext û bêbeş a kurd dibîne.

Xwendevan piştî xwendina gelek ji van çîrokan, kenê wan tê. Lê kenekî çawa? Kenekî ji jaleyê taltir...

Tişta ji bo kurdekî dilsoz cihê xem û xefletê ew e ku pirî ji rûdanên naveroka van çîrokan digihîje sî sal berî niha. Lê xuya ye niha jî tu guherîn di rewşa civaka kurdan de rû nedaye ku ev çîrok nûbûna xwe winda bikin. Niha jî cotkar bi rengekî nû tê bişaftin û ji ber zêdebûna kirê, ji ber teqsît, sût (faîz)

û sadê dev ji zeviyên xwe berdidin û berê xwe didin bajaran. Niha jî tenûrên himaman pir in ji xelkên hejar û bêcih. Niha jî bazirganên sûtxwer û fêlbaz, şêxên kevneperest û destbir, derwêşên nezan û zergweşên li Kurdistanê pir in.

Niha jî dê û bavên kurd ji bo çareserkirina nexweşiyên zarokên xwe diçin dest û delinga Emîne Xanima nivîştnivîs. Gelek Emîne Xanimên bêbeş û çareres mane ji ber rewşa civakî ya xirab, dixwazin ku bi fen Reşîd fêr bikin da nivîştan ji wan re çêke.

Niha jî Serkar Rezayî polîsxanên Kurdistanê ji Serheng bi kirê digire ji bo sitandina bertîl û mahnegirtinê û Hiseyn Qulî jî her di destê wî de ye.

Xwendevanên hêja! Min di vê pêşeka kurt de nikariye Mamoste Qizilcî bi we bidim naskirin. Hûn pirtûka wî bi baldarî bixwînin heya hûn vî nivîskarê hêja binasin û ji bîrbirina wî ya berz sûdeyê wergirin.

Em hemû bi hev re gotinên Pêşewayê Nemir dubare bikin û bibêjin: "Xwezî gelekên wiha ji me hebûyana!"

**Hêmin Mukriyanî**

(ÇÎROK)

# Kenê Parsek

Li berberojekê xwe dirêj kiribû, rotek di destê wî de bû û toza li ber pozê xwe diweşand. Sibeha rojeke meha duyem a payîzê bû. Xwelî bi şeha şevê şil bûbû. Cihê rotê bi başî lê xuya bû. Di ber hev re du xêzên dirêj û rast kişandin. Li aliyê din jî xîşkeke xalî û betaliyê kişand.

Ev gişt nîşana wê bûn ku dikete dilê wî lê bîr û hişê wî li cihekî din bû. Ew ne amade bû ku guhê xwe bide qata zêrîn a rojê ku ji kîjan alî ve û ji pişta kîjan çiyayî hilatiye. Bi bêhntengî û perîşanî dikeve nava gundê Tepereş. Ewê ku heya niha daxwaz û armanca wî tîna rojê bû ku sira şevê ji laşê wî derxe û hinekî wî germ bike.

Eger wê çaxê serê xwe rakira û li hilatina rojê binêriya, dibe ku ji bilî nanekî genimî yê germ tu tiştekî din neketa bîra wî. "Bêkes bostek caw di xewna xwe de dibînin." Zilamê nexweş û birçî jî ku li avşorkê dinêrî, ne dûr e ku rojekê jê re bibe nanekî germ î genimî yê sêleke sor.

Laşê wî ku heta berî rojhilatinê sar bûbû û cemidîbû, hêdî hêdî bi tîna rojê germ dibû û ji hev vedibû. Destên wî yên hişk û çîmên wî westiyabûn. Êdî dev ji rotkirina xweliyê berda, li ser erda ter û şil rûnişt. Bi herdu destên xwe çogên xwe girtin û xwe guvişande ser hev. Di wê rewşê de ku namilpanekî sitûsûr û porşehkirî bûya te ê bigota sofiyekî evîndar e ku ketiye zikra Xwedê.

Nêzîkî saetekê bi wî awayî ma, mirov digot ku ji ber tîna rojê ji xwe çûye û razaye. Lê belê ji livandina dest û pî û serê wî ku car caran dihejand diyar bû ku mehşera xem û xeyalên xwe radike.

Destpêka mehşerê jî ji tozweşandina bi rotê dest pê kiribû. Bi du xêzên ku kişandibû, sînorên zeviya xwe kifş kiribû û bi cixîzê jî cihê xerman û kadînê nîşan dida ku heta niha jî şene û bêjing li ser xwe nedîtibû. Ji ber ku wê salê Şarezor berhem nedabû û hişk bûbû. Temen û kul û derdan wisa pê kiribû û nedihişt kul li wan bifikire. Lê belê, kul û derdên wisa ewqas zêde bûn ku nedihiştin mêjiyê wî piçekî vehise.

Ji hemû aliyî ve bi ser de girtibûn, yek bi du yekî bandora xwe nîşan dabûn. Dihate pêş çavên wî, ji ber ku ew û jina wî bi sêberoyê ketibûn û sê mehan razabûn. Çawa ku Hecî Reşîd ji Silêmaniyê hat herdu gayên cot ji dêvla deynê xwe birin û çû. Ji ber ku zaroka wî bi nexweşiya hawleyê ket û mir. Ji ber ku jina wî ji qehra zaroka xwe û ji birçîtiyê jiyana xwe ji dest da û Yasîn jî nebû nesîbê wê. Mirov bi rehetî dizane ku ew li wan nexweşî û karesatan difikire. Lê dijwar bû ku mirov bizane ku tenê bûyeran tîne ber çavên xwe yan jî wisa li ser disekine heta ku bigihîje biryarekê.

Bi awayekî sewsî û xewixî serê xwe rakir. Te digot stûyê wî mîna fenereke jihevdeketî ye û hêza ku serê wî ragire tê de nemaye. Hêdî hêdî serê xwe rakir heta ku li ser stûyê wî sekinî.

Vêca piyên xwe di ber xwe re dirêj kirin û destên xwe da-

nîn erdê û xwest bi hêza ku di destên wî de maye alîkariya lingên xwe bike. Hemû hestiyên wî kirin qirçe qirç heta ku rast bûn. Bi giranî meşiya û çû mal. Ji tiştên navmalê tenê lihêfek mabû. Bi du benikan du aliyê lihêfê girêdabû û di rojên ku baran dibarî de diavête ser milê xwe û li çogên xwe girêdida.

Lihêfa xwe avête ser milê xwe, benikên wê bi dest girt û bi rê ket. Kesî nedizanî berê xwe dide kû û dixwaze heta kû biçe. Lê wisa xuya dikir ku hê jî îrade xwe ji dest nedaye û hê jî dilê wî ji dest û piyên wî bihêztir e. Çû û çû heta piştî demekê ji ber çavan winda bû.

Piştî çend rojan Hemereş li Helebçeyê xuya kir. Bi wê rewşê diçû sûkê û dixebitî. Lê çi xebat û çi kar?

Xelkê karkerên wisa dixwestin ku ji sibehê heya êvarê pişta xwe rast neke û weke livlivokê bilive. Pir caran Hemereş ji bo xebatê digirtin, piştî ku dest bi xebatê dikir, wan serê xwe dihejand û diçûn. Ji xwe re digotin:

- Tu karkerekî baş î. Ha wext e ku tu li ser karê min bimrî û kefen û mefenê te jî bikeve stûyê min û gorkolan û veşartina te jî bimîne ser milê min.

Hêdî hêdî ber bi wî ve dimeşiyan û jê re digotin:

- Bavê min tu nikarî bixebitî. Ha ji xwe re bide bi nanekî û dev jê berde.

Hemereş di temenê xwe de mêrê jiyanê bû û bi hêza milên xwe jiyabû. Ew gurzên ku wî badidan û amade dikirin tu kes û tu paleyekî nedikarî weke wî bike. Îro ku ketibû rewşeke wisa reş de ku wiha bersivê bidinê, kezeba wî dişewitî û kirîn ji kezeba wî dihat. Bexşîş nedigirt û her carê digot:

- Lawo, ez parsekiyê û xwazokiyê nakim, ez doza kar dikim.

Lê belê gava ku agirê birçîtiyê gur bû û alav da, ter û hişk weke hev dişewitîne. Dema fêm kir ku kes wî ji bo kar nagire, bexşîş qebûl kir û çû du sê nan kirîn. Li ber dîwarekî rûnişt.

Birçîtiyê ewqas zor lê kiribû, heta ku tu bêjî yek û du, iw ket ser nan û hemû xwar. Lihêf bi xwe dakir û got:

- A baş ew e ku, ez cihekî ji bo razanê bibînim. Heke ne di vê sir û seqema zivistanê de ezê li bin dîwaran bicemidim û hişk bibim.

Rabû, bêyî ku bizane bi ku de diçe, ji vê kolanê çû kolana din û hinekî bi wî aliyî de vegeriya, gihîşte kolana sêyem. Li wir dît ku dûkeleke reş ber bi ezmên ve diçe. Got:

"Her çi be, ew agirekî mezin e, baş e, ez herim bi şev li ber razêm." Weke şûngerekî baş bi dû şûna agir ket û heya ku ew dît. Dûkel ji qulereşeke mezin a weke şikeftan derdiket. Kete hundirê qulereşê. Di nav dûkela tarî de zilamekî din hêdî hêdî agir geş dikir. Silavek dayê, "qewet bê" got û jê pirsî:

- Lawo, ev çi agir e ku tu bê rawestan geş dikî?

Agirgeşker got:

- Birayê min, ev hêtûna hemamê ye. Karê min ev e ku ez vê hêtûnê amade bikim.

Hemereş: Lawo were camêriyekê bike, di riya Xwedê de cihê min bike ez îşev li wir bihewim, bila ez ji serma nequfilim.

Hêtûnger: Birayê min, hêtûna hemamê cihdanê naxwaze, were ji xwe re li vir razê.

Hemereş bi hêtûnger re li hev kir û bi şev alîkariya wî dikir da ku piçekî vehese û hinekî razê. Bi roj jî diçû sûkê li sûkê û kolanan çend heb nan pars dikir û dihat. Armanca wî ew bû ku her çawa be bike bihar, êdî biçe li gundan, şivanî dibe, gavanî dibe, rêncberî dibe, çi dibe bila bibe karekî bike da ku ji tenêtiyê rizgar bibe.

Rojekê tofan rabû. Bayek dihat ku kesî nedikarî ji vê malê here wê malê. Hemereş heta berî nîvro sebir kir, belkî hewa piçekî xweş bibe, lê güve guva bê tundtir û tûjtir dibû. Berf û bahoz dizivirand û dikir qula hêtûnê. Te digot qey li ezmanan berfê dihelînin.

Hemereş got: "Ez îro nagihîjim sûkê, ez nikarim her mal bi mal jî bigerim. Ya baş ew e ku ez herim mala dewlemendekî û daxwaza du nanan jê bikim, her çawa be ez îro pê derbas bikim, heta sibehê Xwedê mezin e. Lihêfa xwe avête ser milê xwe û benikên wê bi dest girt û hêdî hêdî bi rê ket. Ba ew qas bi hêz divîziya ku berf weke boyaxa spî lê diçû. Fêde nedikir. Te digot ser û pê di nava qîrê de ne. Reşavek lê diçû û xêzeke reş li ser berfa spî dikişand. Lê wê demê kî hebû ku karibe wê xetê bixwîne û bi serpêhatiya wî bizane.

Li wî aliyî hin xaniyên xwaro maro û koşkeke mezin û bi rêk û pêk ber çavên wî ket, di nav hewşeke mezin de. Ji çend cihan ve ji banan dûkel berz dibû û bi reşeba re şer dikir. Wisa diyar bû ku li wan odeyan sobe pêdikeve û ew ode germ û gur in. Perdeyên spî bi pencereyan ve bûn û dihate dîtin ku di vî çileyê zivistanê de gul jî lê ne. Hemereş fikirî û got: "Dibêjin ku li wê cîhanê bihuşt heye, ku çi, ev li vir di bihuştê de ne."

Çû heta ku gihîşte ber deriyê hewşê. Deriyê hewşê ew qas kesk û xweşik bû newêrî bi dest li derî bide. Çimkî destên wî reş û bi tenî bûn. Ditirsiya ku derî bilewitîne û ditirsiya ku ew lê hêrs bibin. Li dorûdora xwe geriya da ku dar û berekî bibîne û pê li derî bide. Berfê her der pêçabûn, tu tişt bi dest neket. Di dawiyê de çend mist li derî dan. Destên wî ku tenê hestî bû, teqînek ji derî anî, weke ku bi dar lê dabe dengek kete hewşê.

Zilamekî sermezin, serqot û namilpan ku nanekî rûnî di destê wî de bû û dixwar, serê xwe di pencereyê re derxist û nêrî:

- Se'e, ew kî ye bi vê sibehê li derî dide?

Hemereş dengê zilam bihîst û di dilê xwe de got:

- Hey malmîrat, sibeha çi? Ev e nêzîkî nîvro ye!

Se'e derî vekir, çav li Hemereş kir. Bersiva zilamê sermezin da:

- Begê min, ez çi bibêjim! Tiştekî reş e, wisa diyar e ku parsek e.

Hemereş got:

- Xêrxwaz, Xwedê kêm neke, ez gelek birçî me, du nanan bidin min.

Se'e bi ser de qîjand:

- Here bi riya xwe de mêro! Xanim ne li mal e. Çûye hemamê.

Hemereş berê xwe da bejn û bala Se'e, devê wî heta ber guhên wî ve hatibû û zeniya wî ji hev derketibû. Ku mirovekî têr û li ser xwe bûya, wê wisa bizaniya ku bi wî dikene. Bi dengekî (Hemereş) ketî û xîse xîs got:

- Lawê camêr, rast gotine: "Her kes gwîzan di dawa xwe de dijmêre." Qey guh bi te ve tune ne, ez nan dixwazim, Xanima çi? Ez birçî me, pêdiviya min bi tiştekî heye ku ez bixwim, pêdiviya min nîn e ku henekan bi te re bikim.

# Edetên bazarê

Li Bexdadê, dema tu ji Heyderxan bi Cadeya Reşîd de, ber bi Babeşercî diçûyî, meydana yekem navê wê Sehetul Emîn bû. Li vê meydanê cadeyeke kurt di ber Xana Hecî Qedurî de diçû wî aliyê Dicleyê; ji wê re jî digotin, Cadeya Emîn.

Berî ku bigihe Xana Hecî Qedurî, kolanek jî ji wê cadeyê diçû Sûka Sefaran. Ew kolan ewqasî teng bû, dema barkêşên tûtinê bi barê xwe di wir re diçûn rê dihat girtin. Tenê dengê qorneyan nedihat û polîsên trafîkê nerawestiyayî bûn. Heger na, divabû rawestî heya ku barkêş herin.

Wan barkêşan kîsên tûtinê dibirin Xana Evdilqadir Xefaf a serafan. Her çawa be, tu ne barkêş î, ne jî tûtinkir. Ew çi seraf be yan jî xefaf, ji bo te ferq nake. Bila em jî mîna barkêşan jê re bibêjin Evdilqadir Efendî da ku di vê riyê de ji bo navê wî astengiyan nebînin.

Bexdad mîna qetên pîvazê ye. Ew li ber çavê qaşûlê pîvazê ye şarezabûna wê asan e. Cadeya li vî aliyî û wî aliyî firoşgeh

in. Li ser firoşgehan cihê bijîşk, diransaz, parêzer û tiştên ji van babetan hene. Li ser dergehên xwe tablo danîne weke xefka ji bo muşteriyan. Her yek ji wan gulokek nehêniyên xwe hene. Ev sîmaya Bexdadê yan jî qaşûlên ser pîvazê ne. Heger bikaribî di nav van qaşûlan re tu xwe bigihînî naveroka wê, tu tiştên gelek ecêb dibînî. Ne dûr e riya te bigihîje Xezîneya Elî Baba.

Li navika vê pîvazê sîmayeke din heye, navê wê bazar e. Bazar hemû, senger û mewzî ne di tenişt hev de. Di her sengerekî de nêçîrvanekî destê xwe avêtiye çekeke nîvgez yan jî terazî weke xefkekê daniye û xwe mat kiriye. Nêçîr weke lehiyê ji vî serî ve bi saxî tên, ji wî serî ve dema derdikevin hinek ji wan hene nîvgezê berîka wan qetandiye; hinek ji wan jî hene kîsê wan di xefkê de mane.

Ev jî hê ne gelekî tişta ecêb e. Car caran di nav wan senger û mewziyan de derzek, qelşek heye. Ger tu xwe zirav bikî û di derzekê ji wan re herî, tuyê bigihîjî gelek tiştên ecêb. Jê re dibêjin: Xan. Mişkê ser xezîneyê bi nav û deng e. Dibêjin mişk quleke zîvronek, dirêj û tarîk dikole. Zêran didize û li enîşkekê kom dike. Bi şev bi wan dilîze û kêfa wî tê. Ew xan jî qulên mişkan ên li ser xezîneyan in.

Yek ji wan qulên mişkan jî Xana Evdilqadir Efendî bû. Deriyê wê piçûk bû. Barkêşan kîsên tûtinê, sîkotîn, mazî, hirî û tiştên wiha li ber dergeh didanîn û pişt re dianîn hundir. Ji dergeh heya bi hundir hêwaneke du-sê metreyî hebû. Jê re digotin, 'hundir'. Ji ber ku navekî din nebû ku jê re bibêjin. Wiha dixuya ku ew berê hewş be. Tu nizanî kengî û çi demê? Serê wê hatiye girtin! Niha qata duyem banekî qewîn li ser e û ew hewş kiriye hol. Evdilqadir Efendî ji ezman ve sînorê milkê xwe diyar kiriye. Tenê tav jî bi dilê xwe nikare bide wir.

Li enîşkeke vê holê qapaneke mezin weke xefkekê hatiye danîn. Li cem dergeh cihek heye, berî ku hewşê sergirtî bike

hêwan bûye. Îdareya Evdilqadir Efendî li wir e. Du qenepe lê danîne û mêzek (sehpa) jî xistiye nîvê wan. Xuya ye ew jî hevtemenê Xanê ne. Lê şerbikê avê û qedeh bêguman ji van qenepeyan ciwantir in. Li tenişta wê hêwana kevin dergehekî giran û qalin heye. Tim û dayîm girtî ye û mifte di bêrîka Evdilqadir Efendî de ye. Ew dergeh wek ku Zakîrê Xancî digot, diçe jêrzemîneke (qebo) mezin ku sê sindoqên pola lê ne.

Roja yekem ku heyvê bi çar dînaran min li cem Efendî kar kir, karê min ê rojane diyar kir: Serfiyeta rojane ya mal li vê defterê binivîse, çend kîsê tûtinê tên û çend diçin li wê deftere binivîse. Li jûreyên qata duyem bi Zakîr re kîsan bijmêrin, yên nû cihê, kevnên baş cihê, yên qetiyayî cihê deynin û tu li wê defterê binivîse. Karê din jî, ez bi roj li vir im, ezê ji te re bêjim.

Serfiyeta mal a roja yekem: Tirî 50 fils, goşt 150 fils, nan 60 fils, bacanên sor û şînahî 30 fils, rojname 10 fils.

Roja duwem: Zebeş 50 fils, ewên din weke xwe.

Roja sêyem: Ji bedêla zebeş, petîx.

Dawiya heyvê Efendî got: Ka deftera mal?

- Ha ji te re.

- Ma te hesabê hemû rojan nivîsiye?

- Na. Ez çi binivîsim? Hemû rojê 300 fils e. Va ye ezê niha binivîsim. Serfiyeta vê heyvê 9 dînar in.

- Keko, ev tu çi dibêjî? Ne ji xwe û me re ye, ev bazirganî ye. (Bi dizî) Keça min jî li mal dinivîse. Serê heyvê tên ber hev. Belkî Zakîr fen kiribin.

- Şerm e Efendî! Di 300 filsî de wê çi fen bibin.

- Keko tu niqaş meke. Ev bazirganî ye.

- Baş e Efendî, baş e.

Rojekê bi Zakîr re çend saetekê me kîs ji hev diveqetandin, qirka me ji tozê tijî bibû, em ji têhna dihejiyan. Min got: "Zakîr, here du pepsiyan ji me re bîne da ku em ji têhna nexeni-

qin." Zakîr ecêbmayî ma, di rengê wî de wiha dihat xuyakirin ku di dîroka vê xanê de cara yekem e ku tiştekî wiha dibihîze. Min got: "Çima wilo qudûmên te şikestin? Ji te re 32 fils, bi bazdan zû were!"

Em rûniştibûn û me pepsî vedixwar, Efendî xuya bû, bêyî ku silav bike, bi mirûsekî tirş rûnişt. Zakîr pepsiya xwe bi nêvî hişt û çû cem kîsan. Min di xwe neanî der ka çima mirûsê Efendî kiriye û min pepsiya xwe vexwar. Min got: "Zakîr, were wê pepsiya te germ bibe." Efendî devê wî weke meşka qul teqiya û kir hawar: "Keko, ev Xan e ne gazîno ye! Tu bi xwe kar nakî, bitr î û nahêlî Zakîr jî kar bike? Ez bi xwe pepsî venaxwim, pereyên we li ku bûn heya ku hûn pepsiyan vedixwin? Ma karkirin wilo dibe?"

- Efendî, me kîs neguvaştine da ku pepsî ji wan birijin. Min ew bi pereyên xwe kirîne. Wekî din jî ez ne barkêş im, ez katib im, ez bi rastî ji te re bêjim, ne ji bo te ez alîkariya Zakîr dikim, gunehê min pê tê.

- Gunehê çi? Zakîr xancî ye, divê karê xwe bike, diyar e tu bi kêrî bazarê nayî. Wek ku ez dizanim bêhna jiyan û rûxanê (*Yaîş we Yesqut*) ji mêjiyê te tê!

- Na wele, Efendî, ez mirovekî karker im, ji Kurdistanê hatime, ez ji van mişkuleyan fêm nakim. Heger tu ne razî yî ezê herim.

Wextê ku hat bîra wî ku bi 6 dînaran kêmtir ji katibê din min kar dikir xav bû û got: "Bavê mino, birayê mino, tu xerîb î, dixwazim tu fêrî karkirinê bibî, aqilê xwendevaniyê ji serê xwe derxe. Rojê 32 fils pepsî, heyvê dike nêzîkî dînarekî, kom bike piştî çend salên din dibe sermiyan. Pê kar bike êdî tuyê jixwe bibî zilam, me jî her wiha kir."

Heya wê rojê min bi hûrbînî li rûyê Efendî temaşe nekiribû, bi rastî mişkê ser xezîneyê hat bîra min. Serekî girover, du çavên piçûk û zîq, bêvileke zirav, devekî dirêj, çermekî weke

meşkên kevin... Li ser qenepe dîk bûye û zû bi zû li min temaşe dikir, li qenepe temaşe dikir û li dergehê jêr xanê. Car caran bi acizî li şûşeyên pepsiyan temaşe dikir, wiha tê gihîştim ku ew şûşe mîna jehrê wî diêşînin, min rahişt wan û ez çûm cem Zakîr. Her çend min ji bedêla Zakîr pepsî venexwar jî rengê wî spî bûbû û bi lez kîs dijimartin. Min got: "Kuro çima tu ditirsî, dinya xera nebûye!" Bi dengekî bilind da ku Efendî jî bibihîze, got:

- Efendî rast dibêje, em karker in. Nabe em wisa serf bikin! (Pişt re bi hêdî dewam kir) Ev zilam min derxe, li xaneke din qet min nagirin. Wê bibêjin yan destpîs e yan jî serserî ye. Ez tu karê din jî nizanim, wê zarokên min ji nêza bimirin.

Gelek tê ve neçû, Efendî bang kir û got "Werin". Em hatin xwar. Mam Sadûn û çend kesên din jî ji Dihokê sîkotîn anîbûn.

- Keko tu here rûne û binivîse, Zakîr were bikişîne!

Zakîr kîs didanîn ser qapanê û Efendî temaşe dikir, binvîse: "48 kîlo... 40 kîlo... 32 kîlo... 46 kîlo..." Piştî bole boleke zêde nirx danîn: Kîloyek bi 200 filsî.

- Hemû bû çend kîlo?

- 166 kîlo.

- 4 cih in 8 kîloyan jê bavêje.

Mam Sadûn:

- Evdilqadir Efendî çawa 8 kîlo, ev kîs her yek kîloyek jî jê dernakeve.

- Keko, ev adeta bazarê ye, ev der Bexdad e, Bexdad. 6 kîloyên toz û pîsiyê jê bavêje.

Mam Sadûn:

- Kuro zilamekî baş be! Sikotîn mîna gewher e. Toz û pîsiya çi?

- Keko ev tu çi dibêjî? Ev çend caran ji te re dibêjim edeta bazarê ye.

- Belê dimîne 152 kîlo.
- Bike bi batman (elb).
- 10 batman û 2 kîlo.
- Na, na ne wiha ye, kêmtir e.
- Çima ne wilo ye?
- 152 kîlo ye, her batmanek 15 kîlo, dike 10 batman û 2 kîlo, vêca çi? Ne tiştekî evqasî zehmet e.
- Keko tu şaş î, edeta bazarê 16 bi 15'an e.
- Ez fêm nakim 16 bi 15'an, yanî çi?
- Ez dizanim tu fêm nakî, gunehê min e ku min tu girtiye; 16 kîlo dijmêrin û dibêjin ev 15 û bi batmanekê hesab dikin.

Ez ewqasî ecêbmayî mam û ji xwe re keniyam û min got: "Vêca bila ev jî edeta bazarê be, emê jî 16 dînaran jê re bijmêrin û dibe ji te re bi 15 dînaran." Mam Sadûn got: "Ne hevceyî muşkileyan e. Ev Mîrza çawa hesab dike û li wê gorê pereyan dide min, baş e? Heger na, ezê bibim xaneke din."

- Kuro ev edeta bazarê ye. Hemû xan weke hev in.
- Ez edet û medetan nizanim, ev e tiştê ku min ji te re got.

Efendî ji acizî çavên wî ziq bûn: "Baş e, çi qas dike?"

- 30 dînar û 400 fils.
- 4 cih in. Delalî dike 4 dînar, tu sê dînaran jê derxe ji bo ku Mam Sadûn bi xisar neçe.
- 27 dînar û 400 fils.
- Dînarekî kêşan û qapanê jî jê derxe.
- 26 dînar û 400 fils.
- 400 fils jî barkêşiya Zakîr.

Mam Sadûn ew çûn. Efendî got:

- Çendê heyvê ye?
- 15'ê heyvê ye.
- Ha ji te re bigire 2 dînaran û here bi riya xwe de, tu bi kêrî karê bazarê nayî.

# Bîne lê bi nav neke

Koşka Axa weke kundekî bi gemar li berberojka Gundê Serkêl xwe bêdeng kiribû. Li hinek cihan sefikên banan ketibûn xwar, li hinek cihan jî tewiyabûn. Te digot belkî Axayê Pîr li ber hestiyên paşxwer û bole bola bi salan bi rêncberan re diran di devan de yek yek mabûn; ewên ku mabûn jî xwar û xêç bûbûn. Ji zû de şirik herikîbûn û çayê pê çêkiribûn. Ava ser banan qelş xistibû dîwaran û devê xwe ji Gundê Serkêl re vekiribû. Te digot belkî bi qest wiha dibe ku ew çend malên rêncberan ku li gund mane, bi ga û ker û deştê ve newq bibin. Keviran serê xwe ji nav sîwaxê derxistibû û diranên xwe di bin ve biribûn. Xuya bû nêta wan ew e ku xwe ji navbera dîwaran rizgar bikin.

Beşê derveyî kelehê, dîwanxane û hêwan, kox û kadîn, hê li ser pê bûn. Dîwarên derdor û banên serî mabûn. Lê li koxan ne hêrîna hesp û mehînan dihat û ne jî sipîtiya kayê di kadînê de xuya bû. Li aqdê sirsirkan dixwend û li xwar jî kêzikan

baz dida. Salek bû ku merşên dîwanxaneyê firotibûn; berikê pêş xanî lê raxistibûn. Hemû tişt li mala Mecîd Xan ber bi sivikî û çirûkî ve diçû. Lê wan berikan rêz û hurmetek peyda kiribûn; ji hêwanê hatibûn dîwanxaneyê û cihê merşan girtibûn. Esîreke ku serî lê têk çû bû jî ji mizgeftê hatibû enîşkeke hêwanê.

Dezgehê derve yê Mecîd Beg bi sê tiştan digeriya: Ferecê Feraş, Heloyê Tajî, hêstira boz. Bi şev hêstira boz mezinê koxê bû, serbixwe diziriya. Helo li ser esîra hêwanê û Ferec jî li mizgeftê radizan.

Ji nû tavê avêtibû avaniyê. Ferec ji mizgeftê derket. Dora mala Sofî Rehîm bû, çû cihêrek ka û sênîkek mast jê sitand. Ka xiste ber hêstira boz, mast jî bir hundir, ber Axa. Derket, ji sefika ser banê kadînê pênc-şeş dar derxistin û ocaxa dîwanxaneyê pêxist, berda Helo ji ser esîrê û ew rûnişt. Kêliyek tê ve çû, Mecîd Beg xuya kir. Bi hêdî gavên xwe diavêtin. Di her gavekê de pêlavên wî li gwîzeka wî diketin. Herdu destên xwe xistibûn kêleka xwe, ew ji bayê sar veşartibûn û axatiya xwe dida diyarkirin. Mecîd Beg hat hundir û li tenişt ocaxê rûnişt. Ferec weke ku destê xwe bibe ber bi jîjo ve balgehekî bi mû, pîs û mezin ku rûyê wî bi du-sê cihan qetiyayî -li ber pencerê bû cihê Axa yê do êvarî- bi hêdî rahiştiyê û anî li pişt Axa danî. Mecîd Beg pal da û got: “Here nan bîne.” Piştî bi kêliyekê Ferec sifreyeke mezin anî. Du nan, sênîkek mast û du-sê piyaleyên çayê li ser bûn. Li ber devê Axa danî û çû hêwanê.

Mecîd Beg bi axaftin, çend parî nan û mast xwar û du piyale çayê vexwarin. Berê xwe dabû sêniyan û ketibû nav xeyalan. Destê wî fêrî ber şûtikê bû. Ji xwe re qotiya tûtinê derxist, cigareyek pêça û bi agirê ocaxê pêxist. Çirûskeke agir pekiya ser destê wî. Şiyar bû û bang kir: “Were bibe.”

Ferec hat sifre bir. Mecîd Beg car caran mijek li cixareya xwe dida û bi hûrbînî li aqdê dimeyizand. Tevna pîrê nedidît,

fikrê wî dûrtir çûbû, di ber xwe de dijimart: "Yek... du... sê..." Heya gihîşt sihî.

Ferec digot belkî malên ku çûne dijimêre. Ji hêwanê bang kir: "Na Axa, bîst û pênc."

Mecîd Beg hingî ketibû nav xeyalan guhê wî ne li Ferec bû. Mijeke din li cixareya xwe da, dû nehat devê wî. Qûnika cixareyê jî xelas bûbû. Tîrika xwe xiste ber şûtikê xwe û hate derve. Orîna ga û zirîna keran ew şiyar kir. Temaşe kir ku maleke din jî li ber çûnê ye. Bêvila xwe piçekî firkand, pişt re di ber xwe de got: "Ji gora bavê wî ve, bila here." Darên xaniyê wî têra heyvekê dikin ji bo ocaxê. Mecîd Beg çû mal, sifre bi sê piyaleyan û yeke vala li wê bû. Dîsa xeyalên dîwanxaneyê hatinê. Got: "Erê Xanim! Tu ji min re nabêjî ev sifre çima wilo ye?"

Zara Xanim got: "Çi bi sifreyê hatiye? Çawa ye?"

- Keçê! Ev tu çi dibêjî? Temaşe bike hingî mezin e, gêrê li ser bike. Li dîwanxaneyê min temaşe kir, nan jî bi zorê li enîşkekê xuya dikir. Dîwanxane jî tu dibêjî devehxane ye. Hingî mezin û bilind e sê darên mezin tê de ne.

- Vêca tu çima nabêjî, ew jî ji ber hev çûne.

- Belê belê, jixwe hemû tişt ji ber hev çûne, pêlavên min jî bi zorê di piyên min de disekinin. Li xeftanê ber min meyzîne, tu dibêjî qey eba ye. Cihê duye weke min tê de heye.

- Kuro! Axaftinên baş bike. Wê hetka me here.

- Çawa bawer nakî, tu jî her wiha yî. Tu dibêjî belkî tu keç î û te kirasê diya xwe li xwe kiriye.

Zara Xan bêhna xwe berda û got: "Wan rêncberên bêwefa û nezilam em ji hev veqetandin. Di gundekî vala de baş e ku em dîn jî nabin. Seyîdê Zenbîl agir berde mal û canê wan."

Û Metika Pîroz, jina Xalo Rehman ku ji bo xatirxwestinê hatibûn cem Xanim, got: "Pepû! Xanim Can, tu bi Xwedê kî, çima duayên şer li cîranan dikî? Ew jî weke te zarokên wan ên şêrîn hene.

- Metika Pîroz, tu bi Xwedê kî, ma ev zilamtî ye ku bi me re dikin? Ev nan û wefa ye?! We gund vala kir û em bi tenê lê hiştin.

- Xanim Can, em çi bibêjin? Ewê ji bal Xwedê bê xweş e. Ma em çi bikin? Xwedê barê we giran e, heya ku ji me hat me xizmet kir. Niha jî em betilîn û em nema dikarin. Ne Şukrî nebe, bêqidoşiyê bi gund girtî ye. Em dibêjin belkî Xwedê li devereke din derî li me veke û bêqidoşî me berde.

Xanim, ji axaftinên Metika Pîroz ên weke "Xwedê", "bêqidoşî", "deriyê xêrê"... fikrek hatiyê û got: "Metika Pîroz, dilê xwe negire, min ne ji te re got. Hûn rêncberên baş bûn. Heya we karî, we kir û hûn li cem me man. Oxir be. Oxira we ya xêrê be."

- Xanim Can! Devê te xweş, qet nifiran li xelkê nekin. Hûn Necîmzade ne, nifir nebaş in.

- Oxir be Metika Pîroz, oxir be, karê we rast be!

Metika Pîroz çû, Zara Xanim bi ser Mecîd Beg de qîjand: "Xwedê te nehêle, sermezinê bêdev û ehmeq û bê desthilat, ma tu zilam î?!.. Bêqidoşiyê ez jî girtim, bûm nesîbê te. 'Dîwanxane mîna devehxaneyê ye. Sifre çima mezin e?' Mêjî di serê te de nemaye. Li cem wê jina rêncber van axaftinan dikî. Ew têniyên xwîna serê me ne, her diçî û dibêjî, dawiyê axaftineke nexweş dikî û hetka me diçe.

"Ma weke berê ye, nanê genimî û sifreyê pir bike; şeş heft mersef û sênîk li ser bin? Du nanên mîna periyên mêşê, ma wê çawa sifreyê pir bike, ma tu bîr nabî ji nêza û xem û xefletê weke darê hişk li me hatiye, kiras û xeftan li me bûne eba, dîwanxane çol, hol, rût û qût e?! Devehxane ye ma çi?

"Ji nû wê ji min re bibe Axa û wê li dîwanxaneyê nan bixwe. Baş e gund vala ye û kes tê de nîn e. Heger na, em dibûne henekê alemê."

Mecîd Beg weke meymûnê bêvila wî bi ser lêva wî de xwar

bûbû û li erdê dinêrî, bi hêdîka got: "Ez çi bêjim, ez jî dizanim wext di ser dîwanxane û mêvanxaneyan re çûye. Min got ber-cejn e, niha bila wilo be, belkî rêncber roja cejnê, eydanê ji me re bînin. Êdî pişt re emê ber û meran kom bikin."

- Cejna çi? Hê nû tu li hêviya cejnan î? Va ye îro maleke din çû. Mane çar mal, nagihe cejnê, ew jî wê bar bikin. Li hêviya cejnaneyê tu xwe ji serma nakujî. Rabe here cem Zenbîl, belkî Seyîd tiştekî ji me re bike. Xwedê deriyekî xêrê li me veke û bêqidoşî me berde.

Mecîd Beg suwarî hêstira boz bû. Ferec kete pêşiya wî û çûne Zenbîl. Ne weke her car bar û tişt pê re bûn ne jî diyarî û sewqat. Kes nehat pêşiyê. Şevê lihêfek jê re anîne Xanîqe, çû nav her du tewên lihêfê. Di xew de wiha dizanî weke berê ye û dema desthilatdariya wî ye. Ji xew rabû, çavbixew bang kir: "Kî li wê derê ye?" Ferec got: "Belê Axa."

- Tiştekî bi min dake, min sar e.

- Tu tişt nîn e, ji bilî cilikên hêstirê.

- Bêdeng be, segbav!

Hinekî din pê de çû, gelekî sermayê dayê, bang kir: "Ferec tiştekî bi min dake, min gelekî sar e."

Ferec got: "Bes cilikên hêstirê hene. Tiştekî din nîn e."

Mecîd Beg got: "Hiş be, kero!"

Xew ket çavên wî, di xew de Zara Xan pê pev diçû. Sixêfan dike û çi tê ber zimanê wê dibêje. Veciniqî. Ji serma dilerizî, got:

- Ferec, min gelekî sar e, tiştekî bike.

Ferec got: "Axa, di vê şevê de kî dibîne ma çi ye? Ezê cilên hêstirê bi te dakim."

Mecîd Beg got: "Baş e, bêne lê bi nav neke."

# Tac û textê Emer Axa

Çend sal berî Şerê Cîhanê yê Duyem, rojekê ji sibehî ve li Bazara Mehabad, kirîn û firotin sekinîbû. Dikandarê ku hemû tiştî bi bosta xwe dipîvin û hemû tiştî bi kîlo û teraziya xwe diwezinînin, heya bost û teraziyên wan di kar de bin, hayê wan ji tiştekî nîn e. Dinya bibe kavil, lê firotina wan bibe, ji wan re ne xem e. Wê rojê nîv bost weke qumaşê havînê li layekî ketibû, terazî jî weke mirîşka kurk mit bûbû. Ji nişka ve denge deng kete bajêr. Yekî ji yekî dipirsî: "Çi mesele ye, ji bo derman jî kurmancek bi dest nakeve?"

Gelek tê ve neçû zanîn: Serbazan derdora bajêr girtiye. Suxre ye; mehîn, hesp, deveh, ker û her çi bi kêrî bar û siwariyê bê ji bo suxreyê digrin.

Vê carê xelk bêhtir tîniyên nûçeyan bûn. Çi ye? Çi qewimiye? Kesî nizanîbû. Kesî jî newêrîbû gelekî lêkolînan li ser bike. Kar û barê leşkerên dewletê ye, nehênî ye, lêkolîn serêşî ye.

Du sê roj tê ve çûn, hino hino suxre nema û rewş bû weke berê. Nûçe belav bûn: Hinek ji wan leşkerên Mehabadê, çûne nav Gewrikan. Pişt re xeber hat; ji Gewrikan jî ber bi Serdeştê çûne. Êdî nûçe bi dawî hatin. Hinekan digot: "Dibe ku ev çûbin Erzî Serdeşt biguherin." Hinekan jî digot: "Dibe ku li wan deran şer be." Çûnûhatina Serdeştê nebû, nedihiştin kes tiştekî bibihîze. Ew bûbû metelokek û kesî dernedixist. Heya şîn û hawar ji mala Heyder Elî Xan daket. Heyder Elî Xan Efserê Fermandarî Beşa Şestîrê yê wan leşkeran bû ku çûbûn Serdeştê. Xuya bû ku Seyîd Elî Xan, hatiye kuştin.

Xelk ji jimara kuştina serbazan ketibû şikê. Yekî digot: "Sed serbaz hatiye kuştin." Yekî digot: "Du sed." Hinekan ji wan jî digot ku ji wan serbazan qet kesek nemaye.

Xelkê gelekî dixwest leşkerên dewletê nemîne. Van dilê xwe bi zêdekirina kuştina leşkeran dianîn der û bi vî rengî dilê xwe xweş dikirin. Lê her rastiyek di axaftinên wan de hebû. Ji ber ku leşkerên dewletê yên li Serdeştê, nikarîbûn qet tiştekî bikin.

Dewletê nedixwest weke berê li her devereke Kurdistana Îranê tevgerek çêbûya. Tivinga bi Elî Axayê Hecî Êlxanî û Qerenî Axayê Mameş û çend serokeşîrên xwefiroş ên din kom bike û tevgera kurd bi kurd bişkîne. Vê carê jî wiha bike. Dewletê xwe bi desthilatdar dizanî, çek ji wan jî wergirtibûn, êdî nedixwest careke din çekan bide wan. Digot: "Reş her reş e." Ev her xayînên gelê xwe bin jî, her kurd in û ne cihê baweriyê ne.

Nedixwest ji bajarên din jî leşkeran bîne da ku xelk nizanibe kesî wiha maye û bikaribe di dema Şah Riza de tevgereke wisa ava bike. Li Tehranê biryar dan da ku meseleyê bi kurtî xelas bikin û pûş pê dakin.

Fermandarê leşkerên Urmiye, Mehabad û Serdeştê ketin rê û şivîleyan. Dawiyê biryar dan bi Emer Axayê Swêsinê re biaxivin. "Kî yê vî zengilî ji stûyê pisîkê veke?" Dest bi pirsya-

ran kirin ji bazirgan û derebegên hevkarên dewletê û bi hev şêwirîn. Ji hemûyan "Ka-Hisên" hilbijartin.

Ka Hisên seyîd jî bû û bi zimanê eşîran dizanîbû. Di dema Şerê Cîhanê yê Yekem de zilamê Bapîr Axayê Mengur bû. Pişt re bi dorê zilamê Elî Axayê Hecî Êlxanî û Qerenî Axayê Mameş bû. Serokên eşîran ew nas dikirin û zilamekî bi aqil dihesibandin. Teqûreqa dinyayê gelekî dîtibû. Di Şerê Cîhanê yê Yekem de dema leşkerên Osmanî li Seblax bûn, daxwaz li Bapîr Axa kirin ku ew bi xwe û leşkerên xwe ve herin şer. Bapîr Axa bersiveke tund û tûj bi Ka Hisên re şand ji efserên Osmanî re. Efserên Osmanî jî destê wan nedigihîşt Bapîr Axa, biryara îdama Ka Hisên dan.

Ka Hisên bi saxiya serê Qazî Elî -bavê Şehîd Qazî Mihemed- rizgar bû. Dema leşkerên Rûsî hatin û leşkerên Osmanî şikandin, rojekê Ka Hisên ji bo karê Bapîr Axa diçû Mehabadê. Di rê de tûşî mifrezeyek serbazên Rûsî bû, serbaz ku li zilamekî din digeriyan, bi xeletî çûn Ka Hisên girtin û bi dîlên din re şandin Kafkasyayê. Di şoreşa Mezin a Oktobrê de hate berdan û vegeriya.

Ka Hisênê ku bi sarî û germiya dinyayê şareza bûbû, ji bo vî karî hate hilbijartin û bi efserekî re şandin cem Emer Axayê Gundê Qelereşa.

Ka Hisên got: "Fermandarê Serdeştê li pêş me zilam rê kiribû cem Emer Axa, wê ji bo dan û standinê du kes ji aliyê dewletê ve werin. Emer Axa qebûl kiribû. Li ser wê peymanê em ketin rê. Dema em ji Serdeştê derketin û ketin nav zinar, du zilamên Siwêsinî rût, ji nav deviyekê derketin. Tivingên wan qarîş pê ve nebûn, ji bedêla qarîşê ben pê ve kiribûn. Pirsîn: 'Hûn kîn e, hûnê bi ku ve herin?'

Me got: 'Ji aliyê dewletê ve emê herin bal Emer Axa.'

Gotin: 'Rawestin heya ku em pirsiyar bikin.' Yek ji wan çû, piştî nîv saetê hat.

"Got: 'Bila, de herin.'

Em çûn, gihîştin hevrazekî. Dîsa du Siwêsinî ji bin darekê derketin:

- Hûn kî ne û hûnê bi ku ve herin?

- Ji aliyê dewletê ve emê herin ba Emer Axa.

- Rawestin, heya ku em pirsiyar bikin.

Yek ji wan çû û piştî saetekê hat, got: 'Baş e, herin.'

Em ber bi dola Qelereş de daketin. Ji navbera du latan du Siwêsinî derketin:

- Hûn kî ne? Hûnê herin bi ku ve?

- Ji aliyê dewletê ve emê herin ba Emer Axa.

- Rawestin, heya ku em pirsiyar bikin.

Yek ji wan çû, piştî saet û nîvekê hat, got: 'Bila herin.'

Em çûn heya ku em gihîştin ber qiraxê avahiyên Qelereşan. Du Siwêsinî li wir rawestiyabûn.

- Hûn kî ne? Hûnê bi ku ve herin?

- Ji aliyê dewletê ve emê herin ba Emer Axa.

- Rawestin heya ku em pirsiyar bikin.

Yek ji wan çû, piştî du saetan hat got: 'Bila herin.'

Em çûn, gihîştin ber hewşeke sênckirî, deriyekî mezin li ber bû. Siwêsiniyek bi tivinga xwe ve li wî aliyê derî rawestiyabû.

- Hûn kî ne, hûn çi digerin?

- Ji aliyê dewletê ve em hatine ba Emer Axa.

Bang kir: 'Pîrot! Ev dixwazin werin ba Emer Axa.'

Piştî çarîkekê Pîrot ji hêwana odeyekê bang kir: 'Bila bên.' Em çûn, gihîştin hêwanê. Pîrot got: 'Rawestin.'

Pîrot çû hundir. Piştî kêlikekê hat derve, got: 'Herin hundir' Em çûne hundir. Gava çi bibînin? Tiştên ecêb! Odeyeke axî, dîwar ji dûkelê reş bûbûn, eqd qurmavî bûbû. Li aliyê hêwanê pencereyeke piçûk tê de bû, cama wê ji dûkelê reş bûbû, tiştekî raxistî nebû. Di nîvê odeyê de kursiyek -zivistanan dema li ser tenûrê dideynin, lihêfê pê dadikin û li ber rûdinin-

danîbûn. Emer Axa li ser kursî rûniştibû, çîmek avêtibû ser çîmekî, di ser serê wî re bi ben sebetek bi eqdê ve girêdayî bû. Emer Axa serê xwe xistibû bin sebetê. Emer Axa ne temaşeyî me kir û ne jî bersiv da me. Pîrot qelûnek tije kir û da dest Emer Axa. Emer Axa li pencereyê temaşe dikir û car caran mij li qelûna xwe didan. Em jî rawestiyabûn. Efserê bi min re spî mabû, di rûyê wî re wilo xuya dikir ger hezar can pê ve be yek bi saxî ji destê vî dêwî dernakeve. Bi çavan min îşaret dayê: Metirse. Piştî demekê Emer Axa got: 'Pîrot, çayê bîne.'

Pîrot çayek anî û danî. Emer Axa car car hilmek li qelûna xwe dida û firek ji çaya xwe vedixwar. Dema ji qelûna xwe û çaya xwe vebû berê xwe da me û got: 'Hûn kî ne? Hûn çi dibêjin?'

Min got: 'Emer Axa, ev ne edetên kurdewarî ne. Li hemû malan rêz û qedrê mêvanan digirin. Em mêvanê te ne.'

- Belê, tiştek ji we nayê, hûn van axaftinan dikin. Niha hûn çi dixwazin, bêjin.

- Berê zilam şandibûn cem te û te qebûl kiribû ku em bên. Em jî ji aliyê dewletê ve hatine, bi te re biaxivin.

- Hûn çawa hatin?

- Em ji Serdeştê ketine rê û va ye gihîştine vê derê, cem te.

- Na, na, bi hûrî jî min re bêjin, hûn rastî kê hatin û çi ji we pirsîn?

Bi hûrî min hemû jê re got, çend car em sekinandin, em çiqasî birçî û tî bûn.

Got: 'Li vir, di vê odeyê de, çawa?'

Min got: 'Te silava me venegerand, te negot qewet be ji we re. Ji hingî ve heya niha te em li ser piyan hiştin.'

- Hûnê çi axaftinan bi min re bikin? Bersiva we ev e. Teserufatê zilamê dewleta we li Serdeştê bi me re wiha ye. Ji Şahê xwe re bêjin teserufatê zilamê xwe bi me re baş dike û dibin weke mirovan, ew baş e. Heger her bi vî rengî be, tac û textê

wî heye, ê min jî ev in; tac (sebeta ser serê xwe pê nişan da), ev jî (kursiyê xwe pê nîşan da) textê min e. Dest bi dest, qewet ji bal Xwedê.

Emer Axa mecal neda em biaxivin, got: 'Pîrot wan bibe.'

Pîrot em birin odeyeke mezin, ronak û pak. Ferş lê raxistibûn, balîf lê danîbûn, belqe belqa semawer bû. Em rûniştin, çayê ji me re dagirt. Pişt me re bi kêliyekê Emer Axa hat û li aliyê xwar rûnişt. Devliken bixêrhatineke germ kir. Nan û xwarineke baş anîn û me xwar.

Min got:

- Emer Axa, vêca em biaxivin.

- Em çi biaxivin? Hezar axaftin e, yek bi kêr tê. Min bersiva we daye. Tu zilamekî bi aqil î. Ez bawer nakim ku te fêm nekiribe.

Me xatir jê xwest. Emer Axa bi dilekî xweş em bi rê kirin.

Ez hatim, min serleşker têgihand ku gunehê cendirme ye û wan Siwêsinî tengav kirine ta ku li hember dewletê rabin. Dewletê çûna nav xaka Siwêsiniyan li cendirmeyan qedexe kir. Li wê derê dayîreyek danîn bi navê Dayîreya Întîzamata Eşîrî). Zilamek bi navê Serheng Pizîşkiyan kirin serokê wê dayîreyê. Serbazên Pizîşkiyan jî piştî salekê duyan bûn weke cendirmeyan, dema rejîma Şah Riza hilweşiya. Sala 1941'ê rojek ji rojên havînê Pizîşkiyan û serbazên xwe weke silkê rût, bi derpî û fanêre hatin Mehabadê û ji wê çûne paytexta Şehînşah."

# Ocaxa Axa ronak e

Reşîd Axa di temenê ciwanî de bû. Ev çend sal bû, bûbû Axa. Ew jî weke "Gayê Hakim"* ji terî dixwar û li hişkî radiza. Ji wextê mezîn bûbû, bi şev qumar dikir û bi rojê nêçîrvan bû. Hunera wî tenê zanîna zimanê tajî bû.

Reşîd Axa: "Hew... hew... hew... Ezê benê hevrîşim û toqên zîv têxim stûyê te, ezê dest û tiliyên te hine bikim û cilkên hevrîşim ji te re çêkim!"

Tawis, weke cendirmeyekî ku nû çend kurd girtibin û sipasiyek wergirtibe û efserê wî bangî bike yan weke jineke pale di nav dar û direhan re bi pey çêleka xwe ya windabûyî de baz bide, zû û bi rev diçû ber bi Reşîd Axa ve. Dengê piyê wî jî nedihat, bi toqên zîv û cilkên hevrîşim di dora Axê re diçû û dihat, tiriya xwe dihejand, dileyîst û dikuzî, yanî: Amade me ji bo rev û nêçîrê.

* Gayê Hakim: Axaftina pêşiyan e, ji mirovên wisa re dibêjin "Wele gayê Hakim e, ji terî dixwe, li hişkî radize."

Axa û tajî, bi hev re, ber bi xwar ve hatibûn. Her çend her du ji du regezên cuda bûn, lê nisbet bi dîroka kevin, bê tercuman ji hev fêm dikirin.

Êvareke nêzîkî zivistanê bû. Li hêwana dîwanxaneya Nobar,* Reşîd Axa û Tawis, bi zimanê xwe ew axaftin dikirin.

Xulamên Reşîd Axa gelek ji wan bi Nobar û dîwanxane, hesp û tajî ve ku mîrata Axayê rehmetî bûn, ji ziraviya dest û pê û reva Tawis mabûn ecêbmayî; hêvî dikirin wan û Axayê wan bê goşt nehêle. Yeko yeko pîrozbahiya Tawis li Reşîd Axa dikirin. Pişt re Koxe Evdile xwe avête nava axaftinê û got: "Bi gora Axayê rehmetî, ev tajî yê diziyê ye. Heger na, ev Helo û du ribe genim tiştek negotine hev."

Reşîd Axa: "Nareye, qewad, te serê min bir! Xuya ye heger Heme Weys ji nêza qorîna nava wî nehata, ji bo du ribe genim ji vir nediçû Tîleko** di tarîka şevê de, sînga xwe bide ber guleyan û Tawis ji min re bidize. Ev du sal in min nav û dengê Tawis bihîstiye. Ez li ezmanan lê digeriyam, li ser zeviyê kete destê min. Heger tu gelekî çavên xwe berdidî her du ribên genimê Heme Weys ê ku bi dest ketiye hê maye. Ger tu dixwazî ezê te bixemilînim û berdim. Heger te temalek (kîvroşka berî) kuşt, ezê du ribe genim bidim te jî.

Koxe Evdile: "De baş e, Axa. Tu li ser peymana xwe yî? Ezê temalekê ji te re bibînim, heger dixwazî ezê di hêlînê de bi saxî bigirim û tu dixwazî jî Tawis berdiyê."

Reşîd Axa: "De here temal bibîne."

Koxe Evdile: "Axa hinekî raweste heya hinek berf bikeve. Êdî bizane du ribê genim helal dikim yan na?

Di wê demê de, Tawis, Reşîd Axa tê gihan ku dixwaze nêçîrê bike. Li pêş Axa sê çar caran xwe lebitand. Bi zorê neynûkên pencê xwe bi erdê dixwerandin. (Ji Tawis re): "Ez bi qur-

* Nobar: Gundekî li devera Bokanê ye.

** Tîleko: Navçeyek li devera Seqizê ye.

bana reva te bim." (Vêca ji Koxe Evdile re): "Bi serê Marif Axa, sibe heya taştê tu temalekê nebînî ezê bi mal ve te derxim. Heke te dît jî, ji bilî du ribe genim, ev şal û şapê li ber min jî yên te ne. De here ez temaşe kim, ka tu ê çi bikî?"

Koxe Evdile: "Axa! Sonda te bi gul be. Heger berf nebare, ezê ji ku temalekê ji te re bibînim? Bes sebir bike, heya hinek berf bibare, êdî bibîne."

Reşîd Axa: "Pêwîstiya me bi wan axaftinan nîn e. Te qala temal kir, divê tu bibînî. Heger na, ezê te bikim temal û sa berdim te.

Bayiz (yek ji wan xulamên bi rêz, li cem Axa, li ber dîwarê hêwanê rawestiyabû) di ber xwe de: Evdile xwe zana dibîne. De here bi reşiyê temal bibîne.

Cafer (yekî din ji xulaman): Ewqasî gêj e jê were kîvroşk jî rêncber e û wê bi zor werîne kar. Em jî dikarin rêncberan bi zorê bibin vi alî û wî alî. De here Celal bibîne. Te bi zimanê xwe, xwe pê ve kir!

Mam Selîm (bi zorê kelb di devê wî de mabûn, di dema xwe de mezinê xulamê Marif Axayê bavê Reşîd Axa bû) bû pelpela wî di ber de: Mala minê ma tu jî Axa yî. Min jî dixwest niha Axayê rehmetî ba û wiha daba di ber re. Bê wê ka xistiba nav çermê serê wî yan na.

Reşîd Axa dema di ber xulaman re diçû û dihat guh li wê axaftinê bû, xwe xiste eyarê bavê xwe û got: "Mam Selîm! Sibe heya nîvro sebrê bikşîne, pişt re axaftina Axayê xwe biceribîne, bizane ka çawa ezê wî bikim temal."

Koxe Evdile, her çiqas ne bavê xulaman bû, weke Mam Selîm çavê wî bi paş xwe re Axayê rehmetî re nevebûbû. Lê te digot ji ber çakûçê şeytan pekiyaye. Di fen û fêlên axatî û xulaman de hoste bû, dizanîbû aqilê Axa bi heya ku diçe. Tedbîra xwe sitandibû, lê dixwest wiha li Reşîd Axa bike. Da ku du ribe genim bi dest bixe. Berê xwe da Mîrza Simaîl, katibê Axa

li wî alî rawestiyabû, pirtûkeke pîs di destê wî de bû: "Mam Mîrza ji bo min temaşeyî vê pirtûkê bike, ezê ribe yekê ji wî genimî bidim te."

Mîrza Simaîl: "De here bimre. Niha li Qendîl jî berf neketiye, ferheng jî temal nagire. Vêca ezê ji bo te çi li pirtûkê temaşe bikim?

Koxe Evdile: "Bi serê wî Axayî riba genim ji kîsê te çû.

Reşîd Axa: "Aho... ha... ha... ji sibeha nehatî, ji temala nedîtî, ji genimê nesitandî, dilê Mîrza dişewitîne!"

Xulam: "Belê, Axa tu xweş diaxivî. Aha... ha... ha..."

Koxe Evdile (Ji bo ku kenê Axa bînê, dixwest bêtir bi Mîrza re biaxive): "Baş e, li pirtûka xwe ya pîs temaşe neke. Bi serê wî Axayî çavê te bi genim nakeve."

Mîrza: "Kuro, bavê min, birayê min! Devî bi aşî çi fêm dike? (Çima tu deviyê min dixe aş?) Tu bixwe bi nêta masiyê nav deryayê yî, dev ji min berde."

Reşîd Axa: "Ez Evdile nas dikim, bavê xwe jî bi ribek genim difiroşe."

Mîrza (Hingî jî Evdile aciz bûbû): Şikir bavê wî nemaye. Heger na, bê genim jî wê bianiya sema. Koxe Evdile di mebesta Mîrza gihîşt. Ji ber ku bavê Evdile jî xulam bû. Heger maba jî wê weke xulamên din lê bikira. Got: "Ez ne bê emek im. Axa çi bixwaze ezê wisa bikim."

Mîrza, dema zanî axaftin nazik dibe, got: "Axa dixwaze tu temal jê re bibînî."

Koxe Evdile: "Baş e, bi wî şertî tu dev li goştê wê nedî."

Mam Selîm: "Kuro, Evdile, tu din î? Ji berfa nebarî, ji temalê nebûyî, ji nêçîra nekirî, ji têneberdana tajî, ji kîvroşka nekuştî, ji xwarina neçêkirî, Mîrza dev li çi goştî nade?"

Mîrza: "Bi Xwedê ma ez çi bêjim? Ez ji van axaftinan fêm nakim."

Koxe Evdile: "Rast dibêje. Tenê zanê ji bo xulaman rica bi-

ke û tiştan bixwaze. Ewqas kaxiz û maxiz xwendine û hat û çûya bajaran kiriye, axaftina me jê re hîç e."

Mîrza: "Tu here temal bibîne û dev ji min û kaxiz û maxizên min berde. Her tiştekî dema xwe heye. Niha dema temal û nêçîrê ye."

Reşîd Axa (bi ketina hundir re): "Evdile! Tawis bibe dest û piyên wî hine bike. Ji bo temalê sibehî."

Koxe Evdile: "Belê, Axa."

Reşîd Axa (Piştî nan û çaya sibehê): "Evdile!"

Koxe Evdile (Li hêwanê li bal xulaman xerîkî nanxwarinê bû, pariyê xwe bi saxî qurpand): "Belê... belê... Axa..."

Reşîd Axa: "Ma te dest û piyên Tawis hine kir?"

Evdile: "Belê Axa."

Reşîd Axa: "Axaftina min ji bîra min neçûye. Ma te temal dît?"

Evdile: "Belê Axa."

Reşîd Axa : "Hespan bînin, da em herin nêçîrê."

Tawis li ber hespê Reşîd Axa sema dikir. Li qeraxa Terexe* nêçîr girêdan. Dema gihîştin şêwlekî Evdile yekser temalek ji qulê derxist:

- Ez xulamê Axayê xwe me, Tem.. al!

Reşîd Axa tajî berdayê, lê kîvroşk ranebû.

Evdile: "Axa, di hêlînê de xwe mit kiriye, ezê herim rakim." Bi dilxweşî çû bi pêş ve.

Çû xwar hinek ji pirça kîvroşkê jê kir û avête derve.

Reşîd Axa (Duyem car Tawis berdayê): "Bigre Tawis, bigre!.. Dernexî ha!.." Bi serê min... Tawis yek du car serê xwe hejand û kîvroşk hilgirt.

Evdile bi bazdan çû kîvroşk ji tajî stand û bi pişt xwe ve daleqand.

Dema vegeriyan çavê Evdile bi Birahîmê Şel ket ji serma di-

* Terexe : Dareke mezin e li devera Bokanê.

lerizî, ku çi li ber dergehê mizgeftê rawestiyaye û ji Mîrza re diaxive.

Koxe Evdile (zû): "Birahîm hê tu neçûyî?"

Birahîm: "Herim ku? Ma te tiştek ji min re negotiye."

Koxe Evdile: "Min ji te re negotibû, va ye ezê bêjim. Rabe here Bokan tenekeyek neft ji mala Axê re bîne. Zû were, bigihîne êvarê."

Bi şev li dîwanxaneyê, di ber xwarina goştê kîvroşkê re behs, behsa nêçîrê û pesindana Tawis bû.

Reşîd Axa: "Mam Selîm! Çawa min temal bi Evdile peyda kir? Ez zanim tu çawa yî? Axa."

Mam Selîm: "Çiqas ax bi ser gora Axayê rehmetî de ye, temenê te jî ewqas dirêj be. Şikir ocaxa Axa ronak e."

Mîrza (Kenek hatiyê): "Belê, ocaxa Axa ronak e!"

Reşîd Axa: "Mam Selîm! Sibê du ribe genim bide Evdile, ezê jî şal û şapikan jê re bişînim."

Bi şev dîwanxane vala bû, Evdile ber bi mal diçû, li ber dergehê Birahîmê Şel rawestiya û bang kir derve û got: "Birahîm, heger ji devê te derkeve û tu bibêjî 'kîvroşka min winda bûye', ezê te di bin bar de bikujim. Do te tiştek ji Mîrza re negotibe?"

Birahîm: "Vêca bila min jê re jî gotibe çi tê de ye. Ew jî her ê me ye."

Evdile: "Na, na, ew zilamekî bajarî ye û zimandirêj e, heke li ba Axa behs kir, tu wî li derve biqelibîne, êdî ez karê giran bi te nakim."

# Xemla pembû

Havîna sala 1956'an bû. Mizgeft çol û hol bû, Xwedê dizane cara çendan bû zevî li rojê bûbû û têhn û tîrêj zêde ji rojê werdigirt. Weke hemû havînên din, pale bi îş û karê kiştûkaliyê (çandinî) ve mijûl bûn. Wextê wan nebû serekî jî li mala Şêx bidin. Heger wextê wan çêbûya jî, şerm dikirin bi destê vala herin ziyaretê. Ji ber ku kiştûkal hê ber nedabû. Perdeya kiş û matiyê bi ser mizgeft û mala şêx de kişiyabû. Tenê rojê pênc caran dengê bangdana Sofî Qadirê Hewramî bêdengî dişkand. Ji bedêla xitm û tehlîlê Sofî, zikr, defa derwêş û mêşên ku ji nêza gêj bûbûn, diketin nav hev û dibû wîze wîza wan.

Şêx berî nivro û êvaran heya nêzîkî bangdanê yan li hewşa mizgeftê hatûçû dikir, yan jî li hêwana mizgeftê, li ser kursiyê ku bi taybetî jê re danîbûn rûdinişt û bi tizbiya xwe dileyist. Xuya bû dahatiyên (hatin) payîza par dianî bîra xwe, bê ma çiqas bû û wê îsal çiqas be.

Mele Celal, ger nimêj kar û bar ba mirov dikare bibêje kar-

kerê ayînî bû. Heyvê bi pênc dînaran ew kirê kiribûn ji bo li pêşiya wan nimêj bike. Weke kirêkarekî feqîr ku çavê wî li devê xwedîkar be û şiyarê dema karê xwe be, guh nedidayê kes li pey nimêj dike yan na. Bi dengê bangdanê re yekser diçû mihrabê. Sofî Qadir jî, li ba wî nimêj, beşekî girîng bû. Bi rastî em bêjin, demmaya jiyana wî bû, li pişt radiwestiya. Yê sisiyan jî Mîrza Elî bû. Lê Şêx yan bêzar bûbû, yan ji bo wî ne pêwîst bû; yan jî li mal nimêj dikir, di wê demê de nedihat mizgeftê.

Mele Celal û Sofî Qadir qesîdên ayînî diavêtin ber hev, bi xavî û bêdengiyekê digotin. Xuya bû tenê erkên xwe bi cih dianîn. Wekî din qet kêfa wan ji wî karî re nedihat. Mîrza Elî jî weke reşayiya leşker bû, ji bilî ku nimêjkerekî sade be pê ve tu rola wî nebû.

Ew mizgefta mezin û fireh, bi sê kesî ve, di dema cemaetê de weke himameke qedîm bû. Himamcî, avgêr û yekî bi xêra xwe xwe tê de bişo. Wan hemû rojan ne diyariyek ji bo şêx û ne jî xitm û tehlîlek ji bo Xwedê tê de hebû. Rojekê Sofî Qadir berî nîvro hewş û hêwan paqij û avreşandî kiribû. Kursiyê şêx jî paqij kiribû. Rawestiyabû û milê xwe dabû enîşka dergehê mala şêx.

Şêx hate derve:

- Çi heye? Sofî Qadir!

Sofî Qadir (bi şêweyekî nîve hewramî): "Saxiya serê Şêx. Neşikrî nebe mizgeft vala ye." Şêx hat li ser kursî rûnişt û berê xwe da dergehê hewşê. Yekser Mele Celal bi şan û eba ve xwe xiste hundir. Xuya bû do êvarî heyv dîtibû.

Çavê Şêx li hatina xelkê bû, lê ne yekî weke Mele Celal ji bilî ku xêr di nav çavê wî de nebû, ne ku daxwaza heyvane jî bike. Şêx dema bixêrhatina Mele Celal kir û li rewşa wî pirsî, di rengê wî de xuya kir ku di dilê xwe de dibêje: 'Zilam tu pêşnimêjkerê mizgeftê yî, divê ji hatina rojane ya mizgeftê pere-

yan bidin te. Mizgeft jî van rojan çol û hol e. Êdî çi dixwazî, tu piçekî ji xwe re aqil nagirî?'

Di vî wextî de Sofî Namiq dawa xeftanê xwe xistibû ber xwe, doxîna wî bi ser derpiyê wî yê spî yî pîs de diçû dihat. Wisa yekser xwe xiste hundir. Ji bîra wî çû ku dawa xwe berde. Dema çavên Şêx bi Sofî Namiq ket, mad û mirûsê wî piçekî jî nema, bangî kir:

- Tu bi xêr hatî, Sofî Namiq, xêr e şikir?

Sofî Namiq: "Bi Xwedê qurban, heke hîmmeta pîran alîkariya min bike! Xêra çi!"

Heqê Şêx hebû bi hatina Sofî Namiq dilxweş be. Mirîdekî bi soz û muxlis bû, xizmeta mizgeftê gelekî dikir. Qet destvala nedihat ziyaretê. "Qet nebe dînarek aniye da Mele Celal pê bêdeng bikim; heger qet neanîbe jî dîsa xem nake. Havîn e dexl negihîştiye. Dar salekê ber negre jî, nabe bibirî."

Sofî Namiq bi ser ket, silav kir û destê Şêx maç kir.

- Bi xêr hatî Sofî Namiq. Şikir tu baş î?

- Qurban, Xwedê ya baş ji te re bike. Bi alîkariya Xwedê û hîmmet û bereketa Şêx.

- Mal û zarokên te çawa ne?

- Qurban, destê te maç dikin. Xizmetkarê te ne.

- Kiştûkal çawa ye, ber nedaye?

- Ax qurban berê çi? Xwezî her neba. Îsal pembûyê me ne baş bû, bi jin û zaro em xerîk bûn. Ev çend heyv e em eziyetê dikşînin. Niha jî tiştek jê derneket. Heger tu hîmmetekê ji min re bikî... Min hawar gihandiye mizgeftê, heya çareyekê ji min re nekî, ez naçim.

Şêx (li gor devê Sofî Namiq): "Sofî Namiq, her Xwedê kerîm e, çi qewimiye?"

- Qurban, wekîlê Zorav Beg hatiye û deftera xwe aniye. Xemla wî ewqasî giran e pembû hemûyî jî bidimê incex azad bibim. Va ye ez hatime mizgeftê. Bi Xwedê divê tu alîkariya min bikî.

- Tiştê wilo, çawa dibe? Xeml jî rê û şivîle û qaîdeyeke xwe heye.

- Qurban, wekîlê Beg kengî guh didin rê û şivîle û qaîdeyan?

Di wê demê de Sofî Qadir banga nîvro da.

Şêx: "Baş e, Sofî Namiq, baş e. Niha ezê yekî bişînim ba Zorav Beg. Mele Celal! Tu jî meçe, emê cimeta xwe bikin bi Sofî Namiq re. Tu li hucreyê rûne, pey re li vir firavîn bixwe."

Piştî fîravînê Şêx hate derve: "Sofî Namiq! Min Sofî Reşîd şand xizmeta Zorav Beg. Wê niha were. Xwedê kerîm û rehîm e."

Hinek tê ve çû, Sofî Reşîd hat.

Şêx: "Erê Sofî Reşîd, Zorav Beg çi got?!"

Sofî Reşîd: "Qurban, te çi ji min re got, min jî gihande wî, gelek silav li te dikirin."

- Eleykumeselam, Xwedê karê wî rast bike. Karê Sofî Namiq çawa çêbû?

- Ezê ji te re bêjim. (Çû pêş û tiştek di guhê Şêx de got).

Ya rast, Zorav Beg gotibû, Şêx gelekî rû dide wan miskînan. Ew bi xwe jî xwedî milk e. Çavê wan zêde vebû, tiştekî nadin wî jî.

Axaftina Şêx hat guhertin, got: "Ev zilamên ji bo dinyayê ne. Her ji xwe re dixwazin. Bîra qebr û qiyametê nabin, ricayên me jî qebûl nakin. Here, bê ma tu bi wekîlê wî re bi rê nakevî."

Sofî Namiq: "Qurban, rêketina çi? Tu dibêjî belkî beraz e. Hemû pembûyî dixwaze."

Şêx: "Vêca em çi bêjin? Zeman xerabûye. Zilmê dinya dagîr kiriye. Xwedê rehmê li îmana me bike."

Sofî Namiq: "Ez bi qurbana te bim. Tu rast dibêjî, axir zeman e. Ev pênc heyv in ez û zarokên xwe kar dikin. Niha jî wê hemûyî bibe. Ma Xwedê jî qebûl dike?"

Şêx: "Em çi bêjin Sofî Namiq, qeza û qedera Xwedê ye."

Sofî Namiq: "Ya Şêx, ma tu çi dibêjî? Ma wî xemilandiye ku niha ez hemû pembûyî jî bidimê?"

Şêx: "Neçarî ye Sofî Namiq. Zeman xerabûye. Xwedê xerabtir neke."

Sofî Namiq: "Ya Şêx, madem wiha ye bibêje, 'Tu fermo, em miyaw.'"

Mele Celal dixwest Sofî Namiq têbigihîne da ku di rûyê Şêx de van axaftinan neke, got: "Sofî Namiq, maneya vê çi ye?" Sofî Namiq ji êş û derdê dilê xwe tênegihîşt bê ma ka mebesta Mele Celal çi ye, got:

- Mamoste, dema ez ciwan bûm, em diçûn germiyan û zozanan. Havînan em diçûn şewlê Seqiz. Zilamekî Seqizî bi navê Lalo Hewaz, mirovê me bû. Me kar pê re dikir. Rojekê hate cihê me û rûn û hirî ji me kirî. Barê rûn û hiriyê me bire Seqiz û ez mêvanê wî bûm. Bi şev pîreka wî sêniyek li ber me danî. Goştav çêkiribû. Me nan çandiyê. Kitika bor xuya kir, dest bi miyaw miyawê kir. Xwediyê malê pariyek jê re avêt, yekser qurpand. Dîsa 'miyaw!', pariyekî din jî jê re avêt. Kitika bor ew jî qurpand û dîsa 'miyaw!'... Ewqasî parî jê re avêtin, dev ji miyaw miyawa xwe berneda û nehişt em xwarina xwe bixwin. Lalo Hewaz rahişt sêniyê û danî ber kitika bor û got:

- Madem wa ye, tu fermo, emê bikin miyaw miyaw!

Sofî Namiq destê Şêx maç kir û çû. Bi rê de digot:

- Hezar qeza û qeder be, ez pembûyê xwe nadimê...

Ji Mele Celal ve Sofî Namiq, tiştek ji Şêx re aniye, firset dît û got:

-Qurban! Çayê û şekirê me nemaye. Ma tu heyvaneya min nadî min?

Şêx xwe di axaftina Mele Celal tê negihand û got:

- Heqê Zorav Beg heye. Temaşe ke, tu dibêjî belkî Şeytan ders daye vî xelkî. Axaftinên wan çiqas hişk û nexweş bûne. Axir zeman e, Xwedê me ji îmanê qut neke!

# Serfitre

Hecî Elî dewlemendekî giran bû, bazara wî ew qasî germ bû, nikarîbû serê xwe jî bixwerîne; ne qumaşfiroş, ne çeqal û ne jî xurdefiroş bû. Heger na, qet pê re nedigihîşt. Ji ber vê, karê wî baş bû. Komek tişt difiroşt, dîsa bi tenê pê re nedigihîşt. Heyvê bi heşt dînar û nîvan Mîrza Salihê mirovê xwe girtibû. Da ku hesabê wî bike, çûn û hatina benqeyê bike û pereyan ji ba beqal û qumaşfiroşan jê re kom bike.

Çiqas serê Hecî tevlîhev bû jî -lê Xwedê heye-, serê wî jî biçûya, nimêj lê nediçû. Jixwe qala rojiya Remezanê nayê kirin. Mirovekî şiyar û bi aqil bû. Hesabê dinya û qiyametê baş dizanîbû. Bi hûrî hesabê wê kiribû. Remezan hem ziyaret e û hem jî ticaret. Xwedê jî jê razî dibe û xwarina sî nîvroyî jî jê re dimîne. Xwedê neke dûr ji canê Hecî, ew ne şert e mirov tenê feqîr be û dest pê ve bigre. Mirovekî bazirgan bû, xelkê bazarê bû. Di bazarê de jî divê hesab û kîtab hebe. Sermiyan çiqas gelek jî be, dema tu hesab bikî her bi fils e, fils hatiye komki-

rin. Her filsek di defterê de cihê xwe heye. Bi wê serfiyeta mala Hecî ya zêde, ji kêmayî ve sî roj dike panzdeh dînar. Ev ne pereyekî kêm bû; kirêya du heyvên Mîrza Salih jê re dima, yan jî dikarîbû pênc-şeş caran ji bo karê xwe pê çûn û hatina Bexdadê bike. Bi kurtî, rojî û Remezan ji hemû aliyekî ve fêde bû.

Hecî, heyva Remezanê bi rêk û pêkî girtibû û terawîhên xwe jî bi tevayî kiribûn. Ji Melê bihîstibû ku ewên şikra Xwedê bikin, wê Xwedê ji wan re zêde bike. Ji bo wilo hemû şevan di ber terawîhan re heya hêz di zimane wî de hebû, sipasiya Xwedê dikir. Xwedê jî qebûl kiribû, roj bi roj bi ser de dirijand.

Roja 28'ê Remezanê Hecî li mizgeftê nimêja êvarî bi cemaet kir û di rê de, hûrik hûrik duayên xwe dikirin. Heya gihîşte mal duayên wî bi dumayî hatin. Bismilahek kir û dest bi şîva xwe kir. Xweşiya can be, berhema keda wî ye. Weke sinetê ket ber rêza peqleweyan, tevlî şerbetê bi nîvgezî diqurpand, sê-çar qet di qirika wî de man û bêhna wî nema derket. Qirika xwe bi qedehek dew şûşt û kuxikek peyda kir. Rê, ji bo xwarina din bi tevahî hate vekirin, rahişt sêniya birincê, bi hebûna bamya û goşt, baştir xuya dikir, bi xweşî di navbera reh û simbêlên wî re xwe dixist devê Hecî û diçû xwarê.

Car caran qedehek dew vedixwar, (dûr ji Hecî û şîva wî) şifteyek jî dikir meze. Weke paleyekî zana sêniya xwe baş dibijart. Destê xwe bi ser reha xwe de anî, 'Elhemdulilah, spas ji Xwedê re.' Berê xwe da jina xwe:

- Zû çayekê ji min re dagre, da ez bigihim cemaet û terawîhan.

Jina Hecî hê serpêça nimêja şevê li serê wê bû, piyaleyek çayê ji Hecî re anî:

- Hecî, ma te serfitre dane?

- Tu di nav xêrê de bî û Xwedê ji te razî be jinê, baş bû te anî bîra min. Ey hawar! Bi hemû fena Şeytanê kor xerîk e ren-

ca me hemûyî bi avê de berde. Hindik mabû rojî û nimêja me bi avê de biçûya. Tu çi dibêjî, ez dibêjim emê fitrên xwe hemûyan bidin Mîrza.

Jina Hecî: "Mîrza Salih, zilamê te ye. Ji bilî wî jî meaşê wî heye. Ji ku serfitre lê diçin?!"

Hecî: "Xwelîserê, jinek û sê zarokên wî hene, çima lê naçe. Berî çend şevan li mizgeftê Mela digot, xêr û hesenetan bidin mirovên xwe, baştir e. Mîrza Salih mirovê me ye jî."

Jina Hecî: "Tu du dînaran cejnane bidiyê, hem xêr e û hem jî mezinbûn e ji te re. Serfitre jî bide yekî ku pê pêwîst e û pêdiviya wî pê heye."

Hecî: "Tu bi vê destbelaviyê li cihê min bûyayî, ne ez dibûm Hecî Elî, ne jî tu dibûyî Jina Hecî! Her Mîrza Salih li bîra min bû. Qencî jî min pê kiriye. Ez dibêjim ev jî bila zêde be."

Jina Hecî: "Baş e wisa bike. Ez nabim rêgirê xêrên te."

Hecî, berê xwe da kurê xwe yê mezin: "Evrehman baz de, bang ke Mîrza Salih!.."

Mirza Salih hat, bi dengekî nizm û bi derd silavek da û çû aliyê xwar rûnişt.

Hecî ji bo çûna cemaetê bi lez bû, li aliyekî berê xwe da Mîrza Salih û got: "Ez dixwazim serfitreya îsal bidim te", ji aliyê din ve jî bang kir jina xwe:

- Fatê, zû, nêzîkê du oqe genim bîne!

Jina Hecî: "Genimê me nîn e. Tenê birinc li mal heye, ma dibe?"

Hecî: "Çi ferqa wan heye? Ew jî zad e. Zû du oqe birinc bîne!"

Mîrza Salih: "Heke ne pêwîst bûya, min wernedigirt. Dema mirov neçar dibe, xêr û sedeqeyê jî werdigre."

Hecî: "Dûr ji te, Mîrza, tu xwendevan î, tiştê wiha nebêje. Çi pêwîst e? Tu sax û selîm heyvê heft dînar û nîvan werdigrî, sipasiya Xwedê bike." Birinc anî. Hecî bang kir Mîrza Salih û hat bi pêş ve:

- Va ye ez vî birincî didim te, serfitreya me ya îsal e ku Xwedê li ser me ferz kiriye...

Mîrza Salih got: "Va ye min qebûl kir û ez didim te bi deyn." Birinc heft caran li serfitreya Hecî, jina Hecî, sê kur û du keçên wî, di navbera Hecî û Mîrza de dest bi dest kir.

Hecî dikir ku here cemaetê, li ser piyan got: "Mirov serfitreyan bi zêdeyî bide baştir e. Ji bo Mîrza Salih jî bi xisar naçe. Emê her seriyekî bi çarîkek dînar deynin, dike du dînar kêm çarîkek." Hecî çû cemaetê. Mîrza Salih kir ku here, Jina Hecî ew bi zorê sekinand û çayek jê re dagirt. Jina Hecî pirsa rewşa zarokên Mirza Salih dikir, Mîrza Salih şaşo maşo bersiva Jina Hecî da. Bêhtir bîr li pereyê serfitreyan dikir; çawa serf bike, têra cejnê bike û cejnane jî ji bo jin û zarokên xwe bikire?.. Çayê vexwar, malavayî kir û çû.

Şeveqê Mîrza Salih, wek ku xelkê bazarê dibêjin, mehelê xwe vekir. Ew der maliştin, defter û tiştên xwe amade kirin û rûnişt. Piştî kêliyekê Hecî xuya kir.

Hecî: "Mirza, hê ku zû ye û kes nehatiye, rahêje kaxiz û qelemê xwe da em hesabê xwe bikin."

Mîrza: "Hesabê çi?"

- Çawa hesabê çi? Du dînar kêm çarîkekî te li ba min heye.

- Baş e, vêca ev hesab jê re divê?

- Tu dibêjî belkî tu nû hatiye bazarê. Çawa hesab navê? Ji hemû tiştî re hesab divê. Bira bira ye bazar li dera ha ye.

- Baş e, de fermo. Ha va ye kaxiz û qelem.

- Du dînar kêm çarîkek, binivîse.

- Va ye min nivîsî.

- Vêca çî min, li ba te heye?

- Wele nizanim. Nayê bîra min ku tiştekî te li ba min mabe.

- Nayê bîra te, lê tê bîra min. Zivistan bû, pêlava te qetiyabû, dikan pîs dikir, min cotek pêlav da te. Xem nake, emê ji bo te bi dînarekî deynin. Dînarekî binivîse.

- Çima, ma te bi çiqasî kirîbû? Wilo bi kevnî jî bi dînarekî li ser min hesab dikî?

- Kekê min tu ehlê bazarê yî. Em qala wê nakin ka bi çiqasî hatiye kirîn, niha em qala nirxê îro dikin. Kevnê çi û halê çî? Tenê zivistanekê min xistibû piyê xwe. Hê nû û taze bû.

- De baş e, va ye ezê dînarekî binivîsim.

- Wê roja Hecî Fetileyê Pencewînî sindoqa çayê ji me kirî, te çarîkek ji çaya nimûne rijand. Ew jî sê sed fils.

- Çaya nimûne min kom kir û xiste sindoqekê.

- Çi komkirin? Te hinek kom kir. Ewa din tevlî ax û maxê bû, te malişt. Xem nake, du sed filsî binivîse.

- De baş e, ev dînarek û dused fils.

- Te textê du sindoqên pêlavan birîbû da ku tu kursî pê çêkî. Ew jî her yek nîv dînar. Dînarekî binivîse.

- Tu qala nirxê rojane dikî. Niha textê sindoqên te çiqas dike?

- Wê demê zivistan bû, zêdetir jî dikir. Baş e, emê bi nirxê îro deynin. Heşsed filsî binivîse. Ev tam bû du dînar.

- Belê temam e.

- Dînarek û hefsed û pênceh filsê te, ji pereyê serfitreyan li ba min e. Wan ji du dînaran derxe, tu dibî deyndarê min bi çarîkek dînar. Ew jî bila cejnaneya vê cejnê be ji te re. Êdî bê hesab.

Mîrza, bi nîv kenekî: "Vêca çima tu wê çarîka dînar jî nakî pêşekiya serfitreya saleke din?"

Hecî: "Hesabê saleke din emê di wextê wê de bikin. Niha ezê çawa bihêlim tu bê cejnane û bi destê betal ji mehel derkevî?!"

# Keşkola efsûnî

Weyse û Naskol tekaneyên dê û bavê xwe bûn, bi nazdarî hatibûn perwerdekirin. Navbera bavên wan Yare û Pîrot gelekî xweş bû. Ew bi salan bû dilê hev neşkandibûn. Bi hevparî li ser mal mabûn û dijîn. Pez û mezê wan hebû. Di zeviyê Ferîdun Beg de diçêrandin û rojaneya xwe jê peyda dikirin. Her çiqas ne dewlemend bûn, lê ji ber ku bêdeng û bêzirar bûn kêfa gundiyan ji wan re dihat.

Weyse û Naskol, her du zarokên malê bûn, hevalê hev bûn û ji hev nediveqetiyan. Diçûn deştê cem bavên xwe bi hev re û dihatin mal cem diyên xwe, her bi hev re. Ji xwe re bi berxikan re dileyistin.

Sal û heyv derbas bûn. Weyse û Naskol jî bi xwe hatibûn û mezin dibûn. Çiqas mezin dibûn hezkirina wan zêdetir dibû û hevaltiya wan germtir dibû.

Rojekê ji rojan Yare û Pîrot bi hev re rûniştibûn û qala rewşa xwe dikirin. Bavê Weyse, Yare ji Pîrot re got: "Ev çend sal

in me biratiya xwe ragirtiye û bi tebayî û dilxweşî jiyana xwe biriye serî. Niha jî me karekî wisa bikira da ku zarokên me jî li me bên û ji hev veneqetin. Tu bi xwe jî dizanî ji zarokî ve bi hev re mezin bûne û gelekî ji hev hez dikin."

Pîrot got: "Yare, ez qet nabim direhê Mem û Zînê û gunehê Weyse û Naskol ji xwe re nayînim. Bira, ez jî dizanim parî ji dev bikeve ji bo dawiyê baş e. Madem em birayê hev in, keça min jî ji bo kurê te baş e. Bêyî tu bibêjî, ev her di dilê min de hebû."

Şevekê, Melayê gund û du-sê kes ji cîranan anîn û Naskol li Weyse mar kirin. Mela, dest pê kir û bi pesindana Yare û Pîrot ve hate xwar, duayên xêrê ji Naskol û Weyse re kirin û pîrozbahiya wî karê baş li Yare û Pîrot kir. Yare bi hêdîka destê xwe bi ber Melê ve bir û du dînarên marbirînê da mamoste. Mela dîsa ji nû dest bi pîrozbahiyê û duayên xêrê kir û paşê jî rabûn û çûn.

Êdî Weyse û Naskol ji du zarokên mal û du hevalên xoşevist derketin û bûne destgirtiyên hev. Şerm dikirin êdî, weke caran nema bi hev re digeriyan. Lê çiqas diçû eşq û evîna dilê wan zêdetir dibû.

Payîzê piştî hirî, rûn, berx û kavir firotin, dest bi amadekirina şahiya Weyse û Naskol kirin. Ji bilî xelkê gund, bang kirin nas û dostên xwe û sê rojan şahî li dar ma û bi gume guma dahol û zirneyê govend gerandin. Keç, kur, jin û zilamên gund bi çepî, reyîne, suskî û şêxanî govend dikirin. Hê ku Koxe daxwaza şêraniyê nekiribû, Yare bi xwe deh dînar birin ji Ferîdun Beg re, du dînarên şêraniyê dane Koxe û kavirek jî pêşkêşî jina Axê kir.

Du-sê sal bi ser şahiya Naskol û Weyse re çûn. Salekê êş kete nav pezê wan û hemû kuşt. Hineke ku ji êşê filitîn jî, ew jî firotin û dan bi nan, êdî tiştekî wan nema. Diviyabû êdî bi rêncberî û xizmeta xelkê jiyana xwe bi rê ve bibin. Rewşa wan

ne weke caran baş bû, neçar man ew bi xwe bibin rêncber û xulamê Axa.

Wextekî Koxe hat û ji bo kar bangî wan kir. Pîrot got: “Ezê herim.” Yare nehişt û got: “Tu ji min pîrtir î û birayê min î mezin î, heya ez mabim nahêlim tu bi zarok û gencan re herî karê giran. Weyse jî rêncberê xelkê ye, ezê bi xwe herim.” Yare nan, şekir, çayê, çaydan û piyaleya xwe xistin nav cilikekê, pêlava xwe xist piyê xwe, rahişt dasê û kete pey Koxe. Dema gihîştin cem rêncberan temaşe kir ku kesî di temenê wî de nîn e. Hemû genc û zarok in, dilê wî pê şewitî û di dilê xwe de wilo li hev dida: ‘Heger bêqidoşiyê berê xwe nedabayê û hejar nebûya, yan bêş didan, yan jî karîbûn Weyse bişînin. Her çawa be ketine hevraz û berê xwe dane kemacarê Ferîdun Beg.

Kemacar bi hevrazekî dijwar û dirêj û girekî pîs û bi ber ve bû. Aliyê xwar jî serberjêrekî zer û çiya bû. Dest bi paleyiyê kirin. Yare ketibû cihekî nexweş û bi kevir. Ji xeynî betilandinê hingî derd ji xwe re çêdikir, zêde aciz dibû. Gencan bi dengê bilind didan di ber hev re û bi pêşiya hev diketin. Yareyê hejar, pîr û bê hêz bû, nikarîbû bide di ber wan re. Ji aliyekî ve jî ditirsiya, ne ku serkarê wan axaftineke sivik jê re bibêje. Ji neçarî wî jî dilezand û paleyiya xwe dikir. Çavê wî jî kiz bûbûn, baş ber piyê xwe nedidît. Ji nişka ve lingê wî ji ber çû û ket. Dema çûn ser bêhiş ketibû. Êvarî ew bi sêdarê birin mal. Pişta Yareyê bedbext şikestibû.

Çend rojan bi êş û jan jiya û paşê mir. Xelkê gund û derdorê hatin serxweşiya wî. ‘Şîn û şahî weke hev e’. Îro jî van e, sibê ji wan. Divê mirov bi xweşî û nexweşiyê ve bi mirovê xwe û cîranê xwe re be.

Tiştekî wan ê ku mabû jî di şînê de serf kiribûn. Vêca Pîrot her çiqas Weyse nedihişt kar bike, guh nedida axaftina wî û her bi wê pîriya xwe ve diçû kar. Ew jî ji derd û xefleta birayê xwe, ji kêmxwerî û betilandinê, dawiyê nexweş ket û çend ro-

jan di nav cihan de bû, ewqas xêr û sedeqe dan, dua û nivişt jê re çêkirin, lê bê fêde bû û ji dinyayê çû...

Weyse bi tenê ma. Diviyabû barê Axa jî hilde ser milê xwe, Naskol, diya xwe û xesûya xwe jî xwedî bike. Vî xwelîserî her dikir û Şeytan dixwar. Heya nan peyda dikir, şekir û çayê nedima. Heya nan û xwarin peyda dikir, cil û berg nediman. Serê wî tevlîhev bûbû. Bi xwe jî nizanîbû çi bike... Ev jî her ne tiştek bû. Zû bi zû bang dikirinê ji bo karê giran û rêncberiyê. Weyse ji bo ku xwe ji karê giran rizgar bike, çend darên Xwedê ji Ferîdun Beg bi kirê girt da ku benîşt ji wan çêke.

Bi roj di wan hevraz û zinarên bi dar û devî re digeriya heya ku çend darê benikan didîtin, ew birîndar dikirin û kovik datanî ber wan ji bo benîşt. Daristaneke tijî dar û devî bû. Tirsa hirç û pilingan û dirindeyan lê hebû. Heger ne yekî weke Weyse neçar û hejar ba kesî ewqasî newêrîbû here nav. Darê benikan stewr bûn û benîşt gelek di wan de hebû. Weyse dema dît ku kovik zû tijî dibin, gelekî kêfxweş bû û gelekî hêviya wî bi berhema karê wî çêbûbû.

Rojekê karê xwe zû xelas kir. Bi kêf bi nav dar û deviyan de çû da ku kaniyekê bibîne û ji qula avê xelas bibe. Gelekî bi nav çiyê de çûbû, bi tevahî ji rê û gund dûr ketibû. Di nav zinaran de gelek devî, darên stûr û kevin ên mezin hebûn. Di şêwlekî de pûng û zel û giram xuya kir. Bi ber û ber û dar û dar ve çû heya gihîşt nêzîk. Temaşe kir ku aveke kêm e ji ser ve tê xwar. Zanîbû nêzîk yan dûr kaniyek li van deran heye. Berjor çû heya gihîşt dareke berûyan a stûr û kevin. Şax û pelên wê sîbereke mezin li derdora xwe çêkiribû. Cihê çûn û hatina xelkê ya bi salan bû û kuwarek ketibû nava wê. Kaniyeke piçûk li binê dara berûyê bû, lê heya tu bibêjî bes, ava wê zelal û sar bû. Rûnişt, hinekî derdora kaniyê paqij kir. Dest û rûyê xwe şûşt, du-sê kulm av vexwarin û pala xwe da berekî da ku piçekî bîna xwe berde. Dema serê xwe rakir, dît ku hinek

cil û milên kevin li beramber, di nav kuwara darê de ne. Got: "Belkî ew jî bedbextekî weke min be, ezê li bendî bim, belkî were." Her baş e di vî zinarê bi sahm de hevalek ji min re çêbûya. Hinekî çavê wî ma li rê, di nav daran re zilamekî rehspî û rûpak derket, hino hino hat bi pêş ve. Weyse ji ber rabû û silav dayê. Wî jî devliken bersiv da û li rewşa wî pirsî? Weyse pirsî: "Mamo can! Navê te bi xêr?" Mamê Pîr got: "Însan."

Weyse ji wî navî ma ecêbmayî. Êdî nexwest pirsan jê bike; tu kî yî, çi karî dikî û li vir çi dikî. Bi firset zanî û di dilê xwe de got her çi be yan zilamekî baş e, yan jî ji kêmayî dinya dîtiye û zana ye. Ya baş ew e ez derdê xwe jê re bibêjim û çareyekê ji min re bike.

Dema qala şepirzeyiya xwe jê re kir, dilê Mamê Pîr pê şewitî û bi nîvkenekî got: "Her wiha namîne, çi zû, çi dereng. Her çawa be du keşkolên min hene, emê par ve bikin; yek ji min re û ya din jî ji te re." Weyse gelekî sipasiya wî kir û di dilê xwe de got ev jî her baş e bi kêrî tiştekî tê. Dema Mamê Pîr tiştên xwe ji kuwara darê derxistin û keşkol da dest, temaşe kir tiştekî gelekî xweşik û neqişandiye û karekî baş li ser hatiye kirin. Qelpaxek li ser e, dema tu tiştekî bixiyê toz lê nadeyne. Êdî xeyal kir û tişt jê re dîtin. Dawiyê got: "Ji bo çayê û şekir baş e."

Keşkol wergirt, gelekî sipasî û malavayiya Mamê Pîr kir û vegeriya. Dema lê temaşe kir weke ku tiştek lê nivîsandîbû, lê nizanîbû bixwîne. Hinekî çû, birçî bû û got, xwezî niha nan û xwarineke baş di vê keşkolê de ba! Di rê de bi keşkola xwe dileyist û qelpaxa wê rakir, bê ma ka çawa ye. Dema temaşe kir ku nan û penîrekî baş tê de ye, ma ecêbmayî û got: "Naxwe ev weke hebaneke bor be yan keşkoleke efsûnî be, mirov çi bixwaze tê de be?!" Nan û penîr xwar û got: "Xwezî tijî bibûya ji ava sar!" Dema qelpax ji ser rakir, tijî ava sar bû. Têr av jî vexar. Vêca got: "Xwezî sê çar piyale çayê jî tê de ba!" Dîsa dema qelpax rakir, çayê jî tê de bû.

Baş bû ji kêfa Weyse nedifiriya. Got: "Êdî wê bêhna min fireh bibe. Êdî Naskol, diya min û xesûya min nema birçî dimînin. Êdî bi giranî û erzaniyê nizanim. Êdî emê ji nanê cehî û berûyî rizgar bibin. Ber bi malê ket rê, da zû mala xwe têr bike û têhna wan bişkîne. Ji kêf û xweşiyan hayê wî ji dar û beran, pûş û direhan nebû, di ser wan re diqevast. Carna stran digotin. Carna jî li keşkola xwe temaşe dikir û dibû tiqe tiqa kenê wî. Du gav dikirin gavek û dilezand heya ku nêzîkî gund bû.

Koşka Ferîdun Beg di ser gund re, li cihekî bilind bû. Di pencereya dîwanxaneya wî re, hemû gund mal bi mal xuya dikir. Ferîdun Beg tim û dayîm li aliyê serî yê dîwanxaneyê, li ber pencereyekê rûdinişt û temaşeyî xelkê dikir. Weyse gihîşt ber gund û Ferîdun Beg ew dît. Ji çûna bilez a Weyse û ji hatina wî ya zû şik jê re çêbû, gav bi gav temaşe dikir. Dema nêzîktir bû, temaşe kir devliken e û tiştek di bin çengê xwe de şidandiye, Ferîdun Beg got: "Hebe nebe ev dilxweşiya Weyse ji bo wî tiştê di bin çengê wî de ye." Dema nêzîkî dîwanxaneyê bû, Ferîdûn Beg bang kiriyê: "Weyse, were vê derê." Weyse ji tirsa newêrîbû bersivê nediyê. Neçar çû dîwanxaneya Ferîdun. Ferîdun Beg got: "Ew çi ye di bin çengê te de?" Weyse got: "Ne tiştek e, keşkoleke derwêşan e." Ferîdun Beg keşkol jê sitand û temaşe kir neqş û nîgareke ecêb li ser e. Dema temaşeyî qiraxa wê kir, bi destxeteke xweşik nivîsîbû 'Kişt û kal', fêm kir bê çiqas bi nirx û buha ye. Got: "Ev ji min re baş e. Tu zilamekî pale û bê ser û ber î, ev ne layîqê te ye. Çiqas Weyse rica kir û li ber xwe da bê fêde bû, bi zorê ew ji dîwanxaneyê derxistin. Ferîdun Beg êdî ji xwarin û razanê ketibû. Tim û dayîm bi keşkolê lebikî bû. Mala Ferîdun Beg ji dexl û çiltûk, tûtîn, pembû, nîsk, nok û tiştên din ew qasî tijî bûbû, êdî bûbû weke bazara kevinfiroşan. Ew der tijî bazirgan û etar bûbû. Sermiyanekî gelekî mezin ketibû destê wî. Dîwanxane-

ya wî ji karker û xizmetkarên zêde, zire zira radyo û şewqa kehreba, wîre wîra tirembêlan û çize miza xwarinê, ji şinge şinga şûşeyên mey û pêkan her te digot kabareyeke bajarên mezin e.

Weyseyê bedbext ji derdê keşkolê haya wî ji benîşt nema û bin dar û bin dar li Mamê Pîr digeriya.

Serê kaniyê kiribû wargehê sibeh û êvarî, lê mixabin, bi tu şiklî Mamê Pîr xuya nekir. Demeke dirêj bi vî rengî berdewam kir, lê bê fêde bû. Êdî hinekî li rewşa xwe fikirî û got: "Ez ji nû bi çi mijûl dibim, piştî ku min fêm nekir û keşkola xwe min ji dest xwe berda, çima ezê dev ji benîşt berdim. Êdî ezê çawa mala xwe xwedî bikim û du roje din çawa bêşa Beg bidim?"

Weyse dema li ser kaniyê ji xwe re wiha difikirî, hinekî hişê wî hate serê wî, dest û rûyê xwe şûşt, hinek av vexwar û bi axîn temaşeyî cihê Mamê Pîr kir; vik û vala bû. Rabû û bi bîntengî çû ser karê xwe. Benîştê xwe kom kir. Xist meşkê û bire bajêr firot. Dema pere sitandin û hesab kir, tenê têra bêşa Ferîdun Beg dikirin. Ji derdan kaboka wî lerizî û got: "Wê vê zivistanê maliyên me ji nêza bimirin." Pereyên xwe xist pişta xwe û ji bajêr derket. Li qiraxa bajêr xaniyekî mezin ji nû ava dikirin. Weyse li cem rawestiya û temaşeyî hosta û kirêkar û karê wan dikir. Di dilê xwe de got: 'Heger bi kirêkarî min bigirin, ezê demekê kar bikim û tiştekî ji mal re kom bikim.' Weyse di nav bîr û ramanên xwe de bû, çavê zilamê hoste pê ket û bi navê wî bang kiriyê: "Were vê derê." Weyse ecêbmayî çû bi pêş ve. Hoste got: "Weyse, ma tu min nas nakî?" Weyse got: "Na bi Xwedê, ma min tu li ku dîtîyî heya ku ez te nas bikim?" Hoste got: "Ez ew zilamê ku min keşkole da te me." Weyse çû bi pêş ve, destê xwe xist milê wî û got: "Tu wê demê li zinar bûyî, niha li bajêr hostatiyê dikî. Ma ji ku dihat bîra min?" Hosta got: "Erê Weyse, mirov ber bi pêş ve diçe. Niha rewşa te çawa ye?"

Weyse serpêhatiya xwe jê re got. Her wisa gelek gilî û gazinc jî ji Ferîdun Beg kirin. Hosteyê ku ciwan bûbû wekî xortekî qît û qenc diçû û dihat, got: "Weyse, bêxem be. Keşkola din jî min ji te re hiştiye. Li vir be heya ku ez bêm."

Kêliyek derbas bû Mamê Însan hat û keşkol da Weyse. Weyse jê wergirt û malavayî lê kir û bi dilekî xweş ket rê. Hinekî çû, di rê de xwest ku biceribîne. Çiqas li ber xwe da nikarîbû qelpaxê ji ser hilîne. Êdî dev jê ber da. Ji kêfa karesatên berê ji bîra wî çûn, zû çû malê.

Gihîşte gund. Ji nû dîsa Ferîdun Beg ew dît û bang kiriyê. Dema çû dîwanxaneyê yekser ew keşkol jî jê sitand. Hê Weyse li wir rawestiyayî bû, weke cismeke bi navê wî be destê xwe avête qelpaxê û ji ser rabû. Yekser du destên giran û qewîn ji keşkolê derketin û çep û rast serê Ferîdun Beg girtin û bi şeqama pê ketin. Gelek tê ve neçû, ewqasî lê dabûn hindik mabû mêjiyê wî di qulên bêvila wî re bavêje. Ferîdun Beg xwe negirt û yekser hawara xwe gihand Weyse: "Kuro Weyse, bigihîje min. Weyse, tu bav û birayê min î. Min kir, tu neke. Carek bû û çû, eman Weyse! Dexîlê te me, Weyse!"

Weyse axînek kişand. Pişta wî bi keşkolê qewîn bû, got: "Axa, bibêje bila keşkola din jî ji min re bînin, êdî ezê te rizgar bikim."

Ferîdun Beg bang kir: "Kî li wê derê ye? Zû bi bazdan keşkolê jê re bînin. Zû bin ruhê min derçû. Serê min hûr hûr bû. Kuro Weyse! Ma ezê çi bi malê dinyayê bikim? Canê min jî yê te ye." Xizmetkarek hate hundir û keşkola pêşî anî û da destê Weyse. Dema Weyse keşkol wergirt, dest di cihê xwe de rawestiyan û ji ser û çavê Ferîdun Beg vebûn. Zimanê Ferîdun Beg bostekê hatibû der. Çavên wî beq bûbûn, zinge zinga serê wî bû. Temaşeyî keşkolê kir da ku bizane çi efsûnek tê de ye ku ev karesat anî serê wî. Dema bi hûrî hinekî temaşe kir, li ser nivîsîbû: 'Zevî ji pale re, mirin ji derebegan re'. Êdî we-

ke mar pê vede keşkol ji Weyse re avêt û bazda, bi wê çûnê çû û venegeriya. Êdî careke din kişt û kal ji pale û hejaran re hat wergirtin, herkes renca wî ya wî bû. Heger kesekî xwestiba zordariyê bike û renca xelkê dagîr bike dest li ber çena wî radiwestiyan û dest bi şeqaman dikirin.

Weyse jî êdî bi têrî û xweşî jiya û ji nanê cehî û berûyî rizgar bû.

# Şehîdê zilmê ye kefen û şûştin jê re navê

Salek ji salan dêwê neman û giraniyê milê xwe yê reş bi ser navçeya Jawero de kişand. Rehêla perîşanî, xembarî û şepirzeyiyê barî. Cotkar ji kişt û kala beharê, ji şînahî û awêneya payîzê, bê maf û bê berhem man. Hejarî, bêdermanî û lawazî ket û jiyana wan tal û aloz bû. Ji bilî van hemûyan jî ewqasî biribûn kar û palûteyan, wek ku tê gotin 'Ji çarpela guhê wî sax bû'. Zikê birçî, pişta birîndar, dest û milê wî şikandibûn. Ji barkêşana zêde û giran hêz û taqet tê de nemabû. Birçîbûn û bê xwarinî jiyana wî nexweş kiribû.

Cotkar ew qasî serê xwe bir û anî, ji xwe re bîr kir û fikirî, nikarîbû riyeke çareseriyê ji xwe re bibîne da ku xwe ji bedbextiyê rizgar bike. Ji aliyekî ve suxreyan rê nedidayê li rewşa xwe bifikire û ji aliyê din ve jî neşarezayî û nezanî, roja ronak lê kiribû şeva tarî.

Salek hişkî û bê baran bû. Dexl giran bû. Kar nebû. Kar li ber rêncber û kirêkaran çûbû ser pişta şêran. Tişta ku di wê

demê de bê nirx û erzan bû, bi tenê term û cendekên hejaran û firîn û derkirin û awarebûna canê cotkaran bû. Di nava laşan de şer û nexweşî bû. Ewên mabûn jî nikarîbûn di nav cendekan de bimînin û ji neçarî belav dibûn û ber bi ezmanan ve dibezîn.

Ebasê Cotkar berî can ji dest bide, dev ji mal û zarokan berda û çû. Bi bêhêzî û şele şel kete rê da ku li cihekî çareseriyekê ji xwe re bike. Bi çalepk û neperûşk û çîmê lerizî, bi ser çend gir, zinar, çiya û hevrazî de hilkişiya. Di çend şêwl û newal û serberjêran re hat xwar, çend çem û robar derbas kirin. Bi her çi nexweşiyekê be xwe gihand bajarekî ji bajarên nêzîk li Germên.

Dema nêzîkî bajar bû, bayê hêviyê li dilê wî yê birîndar da. Di xeyala wî de jê wa bû, êdî avahî ye; cihê mirovahî, zilamtî û şaristaniyê ye. Zikê têr laşê xwe tîmar dike û dema hat ser xwe dest bi kar dike, xwe jî dide jiyandin û pereyan ji bo mal û zarokên xwe dişîne û wan jî ji birçîbûn û mirinê xelas dike. Êdî wê wan jî bîne bajar û wan niştecih bike. Wê her yek xwe bi karekî ve mijûl bike. Di şaristaniya bi xêr û bêr û welatê têr û pir de, bi dilxweşî û bê tirs bêhna xwe berdin û careke din bi xeyal jî venagerin.

Cotkarê nezan û dilpak her wiha zû jiyana xwe û malbata xwe di wî bajarî de, sivik û asan, bi xeyalî pêk anî. Bi hêvî dikeniya û di ber xwe de digot: "Min nizanîbû Kurdistan wiha ye; cihên bi berhem û bereket weke vê derê tê de hene. Ya Xweda, ev xelkê ha çiqas têr û pir in, çiqas cil û bergên wan ciwan in û bi hêz û geş in, çiqas xweşik û bejinzirav in, çiqas rengsar û mijûl û karbidest in. Heger Kurdistan wiha ava ye, erê çima li ba me xamoş û berdelan, kavil û wêran e? Dema ku nehatinî û nemanê berê xwe da aliyekî, aliyê din divê çavê xwe negire û alîkariyê bike! Dîsa her baş e, emê bên li vir bijîn heya ku ji salên reş û nehatî rizgar bibin. Xwedê deriyekî

baş ji min re vekir. Ji ber derd û xefletan ez anîme vê derê. Pîr û pêşiyan gotine: 'Xwedê dema bi zanebûn deriyekî bigre, bi mihrebanî kelêneke din vedike.' Êdî dest û milê min ji karê giran xelas dibe û miriyên gor û goristanên min jî ji sixêf, dijûn û cîwênan rehet dibin."

Cotkar geş bû û gelekî kêfa wî hat ku ji cenderme, xan û beg û karê giran rizgar bûye. Bi hêvî û dilekî xweş ket nav bajêr û hinekî li nav bazar û ser cadeyan ji xwe re geriya. Şerm kir daxwaza tiştekî li hîç kesekî bike û li rûyê wî nedihat ji kuçe û kolanan du-sê nanan ji xwe re peyda bike. Bi zikê birçî û laşê betilî çû û berê xwe da mizgeftê, belkî li wir dilnermek, dîndarek, xwedî îmanek, çend filsekî yan yek-du nanî bidiyê da bi şev bêhna xwe berde û sibehî jêhatî bibe ji bo îş û karekî. Tenê rojek dijwar e, dema yek du caran têr bû êdî hêdî hêdî kar dike û pere bi dest dikeve, geş dibe û vedigere weke caran. (Çi bike? Ma bibêje çi? Kar ji bo rêncberan bêhnfirehî ye. Karê kirêkar renc û bindestî ye. Kar cil û bergek e, li gor bejn û bala kirêkar û cotkar hatiye birîn. Wê roja ne bêkar bin, cejn û xweşî ye ji wan re.)

Çû li hêwana mizgeftê rûnişt û çav li rê, xwe mat kir. Gelek tê neçû zilamekî pîs û çavbeq ji hundirê wê mizgeftê di dergeh re hate der û gihîşte cem wî bedbextî. Pîske ew hejand û got: "Kuro tu xelkê ku yî?"

Cotkar, bi xavî û bêhêzî bersiv da: "Ja..we..ro.."

Piske got: "Zû rabe here!"

Cotkar got: "Ez ji te re ne bar û pişt im, çima tu min der dikî? Ev der mizgeft e, xana Xwedê ye, cihê hejar û awareyan û bê cihan e. Tu ji xwedê natirsî wilo min dihejînî, bi ser min de dikî hawar û ji vê xana xwedê bi sivikî min dikî der? Tu jî her weke min xwedî maf î. Êdî çima tu nahêlî ez bêhna xwe berdim?"

Pîske: "Bila ez micewir bim jî, ne ku bi min nexweş e û wi-

lo çavteng û bexîl im ku yekî weke te bedbext li vir be. Lê ez ji bo Xwedê wilo ji te re dibêjim, xuya ye tu neşareza û nezan î. Xwelîser, te bibînin wê bibêjin biyanî ye û wê te bigirin. Vê ca tu bi kêfa xwe yî."

Cotkar got: "Çima, ma ez û tu herdu ne kurd in? Ma em ne yek regez û yek xwîn in? Ma ev der jî her ne Kurdistan e? Ez û xelkê vî bajarî, ma em hemû ne kurd in û ne li Kurdistanê ne? Vêca wê ji bo çi min bigrin? Ev, ez û tu ne, duberekî çi ye û ev çi ferq û cudahî ye, ma ne şerm e? Ma ez nehatime beşê kesî bixwim û li ser kesekî bibim bar. Ez dixwazim li vir bimînim û bi keda mil û kirêya destê xwe bijîm. Êdî çi tawana min heye û wê ji bo çi min bigrin?"

Pîske got: "Ez tê digihîjim û ev weke rojê li ba min ron û ronak e. Lê kî guh li van axaftinên te digire? Bê fêde ye, bazde, wê te bigirin û bixin zindanê. Piştî demekê wê te berdin û rê bikin welatê te."

Dema cotkar ev bihîst, zêde tirsiya û hewş û hêwana mizgeftê lê bû weke qula mişk. Sixêf, lêdan, birçîbûn, karê giran, darê zordar hate bîra wî û birînên wî vebûn. Axînek kişand û berê xwe da ezman; çi meyizandin û çavpexşandinek! Mîna sed pirtûkî pir bû ji gilî û gazinan. Bi zorê da xwe û rabû. Çîmê wî dilerizî û te digot qey dibêje: 'Êdî bes e, hêz di min de nemaye, bê şerm bûm, ez ne dar û ber û hesin û pola me, goşt û hestî me, tiştek di min de nemaye, rastî ew e bi min naçe serî!'

Cotkar guh nedayê, bi alîkariya gopalê xwe, xwe pê xirxirand û bi kulkulî xwe gihand qiraxa bajêr. Êdî li wir derd û xeflet bi dawî hatin. Çîm lerizî. Laş kete ser zeviyê, ruhê hêlak û bêtaqet firiya, çû ezmanan.

Axaftinên mezin û rengê xembar ên Cotkar, tesîr li Micewir kiribû û dilê wî diêşand. Hestên hevxemî şiyar bûn û got:

"Gunehê me hejaran bi hev nayê, wê gunehê kê bi me were?" Rabû û bi pey ket da ku wî bîne, belkî xêrdar li mizgeftê xêrinan lê bikin heya hinekî bi xwe tê. Êdî yan karekî ji xwe re bike, yan jî here. Li bazar, cade û kolanan bi pey de geriya û qujbinî û kelên bajar pişkinî, lê rastî nehat. Heya ku dawiyê li qiraxa bajêr ew dît, lê çi? Laşekî bê ruh û birîndar! Zanîbû tawaneke mezin kiriye û bûye sebebê mirina wî. Şerm kir û hawara xwe bire term. Duayek kir û fatîheyek xwend ji bo canê derbiderî, hejar, belkî lê bibore û wî ji wî tawanî efû bike. Di ber xwe de digot: "Bi milê şikestî, min dilsozî kir, bi wan axaftinan min xwest xêrxwaziyê bikim, ne ji bo yekî ku bigihîje van rojan."

Bi şermezarî da milê xwe û zû bi zû di bin lêvên xwe de digot: "Xwezî û sed xwezî ez bûma ji bedêla te!" Ew hilgirt û anî li hewşa mizgeftê dirêj kir û ji bo kefen kete nav bazarê. Çû heya gihîşte dikana Mam Hecî yê bazirgan û got: "Zilamekî hejar, aware, bêkes û kar ji nêzan miriye û ez hatime ji bo kefen. Tu kefen jê re çêke, şûştin û qebr jî li min." Hecî mijek ji cigareya xwe kêşa û awirek veda. Wek ku mar pê vede, yekser werimî. Pişt re kuxiya carekê, axivî û got: "Bi vê bazariyê ma te xêr û bereket aniye! Reş û rûtek miriye, ma min çi jê ye?" Dîsa hinekî gij bû û got: "Baş e, lezê neke, bila bazara me bibe, êdî were ezê kefen jê re çêbikim." Micewir aciz bû, serê xwe hejand û vegeriya. Di rê de, di bin lêvan re bi sixêf digot: "Belê, Mam Hecî! Term xwê bikim da bêhn nede, heya bazara te bibe, êdî ez werim xizmeta te! Tif li te û pereyên te! Çima ma mirî jî kel û pel û qumaş e, pesaw îhtîkar bike!.." Bir û bi cil û bergan ve veşart û got: "Şehîdê zilmê ye, kefen û şûştin jê re navê."

# Nivişta Amîne Xan

Qacir û Kanîpanke di gund in li devera Bokanê. Zeviyên wan di nav hev de ne, sînor û tixûbên wan bi hev ve ne. Cotê wan bi hev re digere.

Rehma xwedê lê be, Şêx Ehmedê Kanîpan, dema mala wî di wextê xwe de li Kanîpanke bû, mijûlî başkirina har û dînan bû. Ji bo hemû derd û êş û janên wan nivişt çêdikirin. Bi hawara hemû kesî ve diçû. Qet nizanîbû betilîn û bêzarî çi ye. Tiştên weke 'nizanim', 'nikarim' û 'ji min nayê' ji devê wî dernediketin. Xwedê jê razî be, ji bo kar û barê xelkê gelek jêhatî, zîrek û xêrxwaz bû. Ji dua û selewatan, ji nivişt û efsûnan, ji destgirtin û falgirtin, ji kel û pel, şîfa û derman, misilman bê beş nedikirin.

Xuya ye misilmanan jî bîr li vî tiştî biribû ku ev zilam bi şev û roj, bi nimêj û taqeta Xwedê û bi îş û karê wan ve mijûl e; nikare îş û karên din bike. Weke wî ku di riya Xwedê de bi hemû hawar û bangên wan ve diçe û xwe digihîjîne wan; ew jî

divê hinekî şerm bikin û destvala neçin xizmeta wî. Dua û selewata bê xizmet, nivîştên bê pere, derman û tîmarkirina bê malavayî fêde nake. Xêrek bi dest van jî nakeve û ew jî bê taqet dibin. Weke trêna reş û spî şev û roj bi pey hev de diçûn. Ev kes devê wî bi silavsitandin, çonçakî û duaxwendinê ve mijûl bû, destê wî jî bi nivîsandina nivîştan û kutandina geya û dermanan ve bû. Devê xelkê jî bi silav û selewat, dest bi diyarî û pişta wan jî bi bar di çûn û hatinê de bûn.

Her du alî dilê wan xweş bû û li hev hatibûn. Ev alî rojaneyeke baş bi dest diket, kêfa xwe jî dikir, pere û sermiyanekî baş jî ji xwe re kom kiribû û ne bi xêra tiştekî bû. Aliyê din jî kar û barê wan bi rê ve diçû, temen dirêj û malê wan zêde dibû û derd û bela ji wan dûr diketin.

Belê wisa ye! Hest û agahiyên padîşah rewa ne, dema bi şev fermanê di devera xwe de bide! Li ser seran û ser çavan! Ji wan were ku wiha ye. Vêca tu bi xwe her bibêje: "Wiha bû.. wiha çû.. bi çi diçe?!" Her weke wî bi xwe digot: "Dinya fanî ye û heya dawiyê ji kesî re namîne. Ewa bimîne, her qencî ye!" Piştî wê hemû qencî û xizmeta ku ji xelkê re kir, ji dinyayê çû, ber bi qiyametê bar kir. Lê ev ne weke hinek ji wan zilamê din ên qenc bû. Ji bilî qenciya wî bi tenê sermiyanekî baş ji bo zarokên xwe hişt. Êdî negiha xanî, gund û tiştên wiha bikire.

Dema çavê zarokên wî vebû, di demeke têr û xweşiyê de bûn. Xweşxwer, xweşik û bi nazdarî hatibûn perwerdekirin. Wan bi seretayiya jiyana bavê xwe nizanîbû. Nizanîbûn ev mal û sermiyan ji ku peyda bûye, bingeha vî mal û sermiyanî ji ku hatiye? Jiyana xweş, pereyên gelek, çûn û hatina xelkê jî qut nedibû, êdî çi? Baş e, ew xafil bûn û bi berjewendiyên xwe nizanîbûn. Erê, çima bavê wan ew fêr nekiribûn û gunehê wî bi misilmanan nehatibû?

Ez jî weke te di tariyê de me. Tu bibêjî ji tirseke wiha be, nû gihîştine, genc bûn ditirsiya ku nikaribin ragirin û tê de şaş bi-

bin. Yan jî nedixwest sirê kar û hunerê xwe bibêje ku sirê kar û hunerê heya niha jî li ba her kesî xoşevîst e. Yan jî ji pere û sermiyanê wan bê tirs bû? Lê bila axaftina me di nav me de bimîne, çî ji wan re bibêje û wan fêrî çi bike? Ew bi xwe fêrî çi bûbû heya ji wan veşêre! Kar û desthilatî di destê Xwedê de ye. Ew çi bike û çi bibêje? Beşê van tê de nebû!

Renca zarokên wî tê de nebû û pişta wan tê de neêşiyabû. Piştî bavê xwe şeş û bêş lêdan û texşan û bexşan kirin. Xwedê zêde bike, ewqasî zêde bû, bi vî rengî jî têra çend salekî kir. Kurên wî her yekî malek ji xwe re çêkir. Weke çîçikên serkeçel belav bûn. Ji ber destengî û nemana darayî û sermaya mîratî, berê xwe dan mala xalê xwe û mirîdên bavê xwe. Amîne Xan, birayê xwe yê piçûk û diya xwe bi cê hiştin. Ewa li wê navê bêdesthilat û hejar bû, Amîne Xana bedbext bû.

Dîsa heya diya wan mabû baştir bû. Ji ber ku diya wan her çiqas pîr û ketî û nexweş bû jî, cihê bîr û baweriya xelkê bû, bi pîroz dizanîn û weke tiberkê lê temaşe dikirin. Bi taybetî di nav jinan de axaftinên wê bi xêr û bereket bûn. Lê 'Nebûnî baş e, bêqidoşî xerab e.' Piştî çêbûn û belavbûna birayên wê, gelek tê ve neçû diya wê jî koç kir û bi pey bavê wê ket û çû bajarê bêdengan.

Êdî Amîne Xan bû mezinê mal û bû cîgirê dê û bavê xwe û xwediyê birayên xwe. Diviyabû îş û karê mal jî bike û bixêrhatin û dua û selewatê jî xelkê re bike û da û derman jî ji wan re çêbike. Ji ber vê yekê karê wê baş bû. Di dema xwe de keça bavê xwe ya bi tenê bû. (Keç jî xwe şêrîn dikin). Kêfa bavê wê jê re dihat û karê ber destê xwe pê dikir. Ji ber wê yekê hinekî şarezayê riyên îş û kar bû, hinekî jî derman û giyayên ku di dema xwe de ji bo bavê xwe çêdikir, nas kiribû û dizanîbû bi kar bîne. Ji gundê wê û gundê derdora wê kur û keç ji bo duayên mezin, şêranî û zewacê; jin û zilam jî ji bo zarokanîn û devgirêdan, da û derman berê xwe dabûnê û serê wê giran kiribûn.

Amîne Xan, weke ku nexweşik bû, lê ne ewqasî jî neşêrîn bû ku kes wê nexwaze. Di ciwaniya xwe de bala berz a pan û qelew, bejn û baleke rêk û pêk û ser û laş û dar û berekî baş pê ve bû. Lê xuya ye zilamê hejar û kurê cotkaran hevşanê wê nebûn û kesî din jî ew nedixwest. Ji ber vê yekê mabû. Di dema diya wê de tu axaftinên wê bi keçên mezin û jinên ciwan re nebû û tu têkiliyên wê bi kur û kalan re çênebûbûn. Ji neçarî bi hêviya rojeke şadî diranê xwe di dilê xwe de çikandibû û haya wê ji evîn û evîndariyê nebû.

Neba, dema yekser bi hemû rengan rû bi rûyî mişkileyên evîndarî, daxwaz û niyazên keç û kuran bû, di jêr çavdêriya xwe de jî nemabû. Her çend, gelek sal û heyv di ser re çûbûn tesîr li dîmena wê kiribû û hinarkên rûyê wê sîs, memikên wê fiş, çena wê qermiçî, mûyên spî ketibûn serî û diranên wê reş bûbûn. Lê weke tiriyê Nerabê heya ku xwe bixwe taltir dibe, ev jî nava wê zêde germ bûbû û agir ketibû dilê wê. Êdî neçar bûbû di dema da û dermanan û nivîştçêkirinê de ji kur û kalan re çav bişkîne û du henekan, du pêkenînên evîndarî bi wan re bike. Car û bar jî ji yên xweşik û ciwan re çavşikandinek texsîr nedikir. Bi keçik û jinên dilnerm re jî qala dildarî û vekirina dilê xwe bi xweşik û nexweşikiya genc û lawan û kur û pîrên gund dikir û xweşiyek jê werdigirt.

Bazara Amîne Xanê germ bû. Her kes bi xeyalekê û her yek ji bo karekî diçû cem û tim û dayîm mala wê qerebalix û ava bû.

Birayên wê ji ber vê yekê nerazî bûn ku xelkê berê xwe daye Amîne Xanê û diyariyan jê re dibin û xêr û bêr hemû ji wê re ne û tu kes berê xwe nade wan.

Ew her çiqas ne xwendevan jî bin, ser bi cemedanê mezin û rîşpan ve, wê bi çavê ziq temaşe bikin û jinek jî li cihê bavê wan rûne û bazara wê wiha germ be?!.

Birayên wê dest bi henekpêkirin û sivikkirina wê kirin û bi hezaran çîrok jê re çêkirin û çal li ber kolan.

Amîne Xanê jî li beramber wan bê desthilat ranewestiya û hemû pîsî û nebaşiyên wan li nav xelkê belav kir û li wan kire şeva reş û got: "Her çi ji min re dibêjin ew bi xwe xerabtir dikin, eger dibêjin ne xwendevan e û nizane bi duayan û niviştan çêke, ew jî weke min in. Ew jî ne xwendevan in û hîç bi tiştekî nizanin. Eger dibêjin dîyarî ji min re tên, ew jî her bi nanê xelkê xwe xwedî dikin, eger dibêjin ez diçim alîkariya kur û kalên bêgane, ew jî her ji dema bavê min ve bi pey keç û jinên bêgane diketin.

"Bi piştevaniya Xwedê çavên min li hîç tiştekî nîn e û ez ji bo xwedê di riya Xwedê de xizmeta xelkê dikim. Ez dibêjim bila ocaxa me kor nebe. Min bi vê pîrektiya xwe rêz li cihê xwe girtiye û wan ji bo kêfa xwe hemû belav kir û her yekî berê xwe daye aliyekî."

Xelkê jî nikarîbûn murşîdzadê xwe li derewê biqelibînin. Neçar man ji her du aliyan bawer bikin û hêdî hêdî têgihîştin ku ev bingeheke vala ye (mişkile li ser lihêfa Mela ye) û ew gêre û mişkile û şer û nexweşî her ji bo kirandina wan e. Êdî ji wan dûr ketin û dev ji her du aliyan berdan.

Amîne Xan dema çûn û hatina wê nema, diyarî û piştebar jê qut bûn, neçar ma li malan û di dema dexlê de jî li ser bênderan bigere û niviştan çêke, duayan bike û tiştan bi dest bixe. Ji bo çûna serbênderan kerek peyda kir, ji vî serî ve lê siwar dibû û ji wî serî ve dexl bar dikir.

Bênderên Kanîpanke xelas kiribûn, nanê salekê kom kiribû. Vêca dixwest ji bo pêwîstiyên mal û cil û berg hinekî din bi dest bixe û bifiroşe. Êdî ji bo ku heya saleke din bi cil û bergên ciwan û bi têr û xweşî jiyana xwe bibe serî.

Kurtanê kera xwe lê kir û lê siwar bû. Çû bi ber bênderên Gundê Qacir ve. Dema bi hevrazê Kanîpankeyê ve hilkişiya, di deştê de -gelek nemabû ji Çemê Tetehû re- bêndereke mezin dît. Bi dilekî xweş û hêviyeke mezin ker ajot ber bi bênderê ve.

Gelek tê neçû gihîşte nêzîk, temaşe kir Reşîdê Mam Ebas ku bavê wî dewlemendê herî mezin ê Qacir e, bi tenê li wir e û bi bêhnfirehî didêre, çend bênderên mezin sor kirine ji genim.

Amîne Xan silavek da, hinek dua di bin lêvan re kirin û pif kir bi ser bênderê de. "Xwedê zêde bike û dûr be ji çavan."

Reşîdê genc û ciwan dev ji dêranê berda û hate ber bi Amîne Xanê ve. Gelekî bixêrhatina wê kir û dewekî cemidî ji meşkê derxist û dayê heya ku têhna wê şikest. Li bin siya kolê rûniştin û Reşîd dest bi çêkirina çayê kir. Di ber re jî li îş û kar û rewşa hev dipirsîn.

Amîne Xan li rewşa Xeca xwişka Reşîd pirsî. Reşîd got: "Do, xwazgîniyên wê hatin û me da mêr." Dema qala zewacê hat kirin, birînên dilê Amîne Xanê vebûn, axînek kişand û got: "Erê Reşîd Can, bi xêr tuyê kengî jinê bînî?"

Reşîd: "Çarenûs di destê Xwedê de ye. Ka em binêrin bê wê çawa be."

Amîne Xan: "Belê, çarenûs di destê Xwedê de ye. Lê xortekî weke te ciwan û baş, çawa heya niha kes ji xwe re nedîtiye û ji kesî hez nekiriye? Xortekî weke te ciwan dibe ku jin bi dest nekevin?! Xwedê çêdike, ji bilî ciwaniya te, tiştek jî ji we kêm nîn e!"

Reşîd: "Ma ez çi bêjim! Kî bersiva min dide?"

Amîne Xan, bi naz û nazdarî: "Kuro, ma tu çi dibêjî? Ne heyf e! Ew çavên xweşik ên bi te ve, bi Xwedê xwişka te jî aşiqî te dibe!"

Reşîd: "Ma ez tiştekî ji te venaşêrim! Ez ji keçekê hez dikim, lê dikim û nakim bersiva min nade. Heger tu nivişteke ji min re çêbikî û ji min re bînî rê, tu çi bixwazî ezê bidim te."

Amîne Xan: "Reşîd Can! Divê tu serqelemane pêşekiyê bidî. Naxwe, tesîra nivişte çênabe."

Reşîd: "Baş e, tu çi bixwazî ezê bidim te, lê ez ditirsim tesîra nivişte nebe."

Amîne Xan: "Tu têrek genim bide min, ezê nivîşteke ji te re çêkim bi şert. Xwedê neke, eger tesîra wê nebû tu min dinasî."

Reşîd rabû têra Amîne Xan ji ser pişta kerê anî xwarê, tijî kir, dirû û danî. Hate binê kolê û got: "Ha va ye genim, vêca tu jî nivîştê ji min re çêke."

Amîne Xan parçeyek kaxiza pîs û qelem ji berîka xwe derxist û çend xetên reş û spî di ser re kişandin û pêça. Pişt re bû mine mina wê, pif kir nivîştê û got: "Bi serê bavê min, min nivîştek ji te re çêkir, heya niha min qet nivîştên wisa ji tu kesî re çênekirine."

Reşîd nivîşt jê wergirt û got: "Vêca ez çi ji vê bikim."

Amîne Xan: "Bixe dawa wê û deng neke, êdî ew bi xwe wê li te bigere."

Reşîd: "Ez ditirsim, tu destê min bibirî û min tûşî mişkilena bikî. Ji bo xatirê Xwedê Amîne Xan, ezê çawa bi xwe bixim dawa pîrekekê?"

Amîne Xan: "Reşîd! Wisa xuya ye tu gelekî bê bawer î û baweriya te bi qenc û pîran nayê, yan jî gelekî şermîn î. Ev nivîşta ku min ji te re çêkiriye, bi serê bavê min, tu bixî dawa pîrekeke dîndar a weke min jî, Xwedê heye, çavê min ne li tiştekî wilo ye, neçar e deng nake."

Reşîd dema wisa bihîst nemerdî nekir, yekser nivîşt xiste dawa Amîne Xanê.

Amîne Xanê got: "Kuro Reşîd! Te çi kir? Çawa te bîr bir û ew fen dît?"

Êdî Amîne Xan xwe li derewê neqeliband û pişt re nivîşt da dest Reşîd û got: "Ma niha te bawer kir ku tesîra wê heye. Vêca baş hilgire û bila ji bo hemû caran bi kêrî te bê."

Reşîd nivîşt xiste berîka xwe û genimê wê jê re bar kir. Amîne Xan bi têra genim ve ber bi Kanîpankeyê kete rê û Reşîd jî ber bi Çemê Tetehû ve lezand.

# Hêkên Hadî Xanî

Bêguman ji te re ecêb e, dibe ku li ba te wiha be; hêk ne di wateya xwe de ye yan jî Hadî Xan weke efsûner (sêrbaz) hêk kiriye.

Nexêr, hêk her hêk e. Hadî Xan jî ne efsûner e, ne jî mirîşk. Yek ji wan dewlemend û xwedî milkê zêde ye ku li Sine ji van kesan re dibêjin, 'Ehyan'.

Ev çîrokeke rast e, bûye û rû daye. Ne helbest e ku çêbûbe ne jî ristin û hûnandina bîr û xeyalan e. Eger tu sebir bikî û nelezînî, piçekî li ser xwe bî, heya çîrok bi dawî bibe bi ya min wê ji te re ecêbtir bê ewa di xeyalê te de. Weke li gor rewşa min, ji bo min gelekî ecêbtir e ji wêya ku Hadî Xan efsûner bûya yan jî bibûya mirîşk û hêk bikira. Ji ber ku wê demê her ew bû tiştekî ecêb rûda (qewimî) û bîneke pêkenînê jî lê peyda bû. Lê neba her destê xwe nediyê. Pêşî xwe tûşî acizî yan xem û xefletê neke, raweste heya çîrok bi dawî dibe, êdî bizane wê çi bibe, bi çi dirindeyan re tûşî şer bibe?

Ez serê te neêşînim, ez bi xwe jî nizanim cara çendan e ji destê rejîma dîktator û kevneperest min bazdida. Hevalekî min ê baş li Kirmanşahê ez sipartim zilamekî hêja da ku min bi rê bike. Ew zilamekî hêja û bi rêz bû, xelkê rêz lê digirt. Dinyadîtî û naskirî bû. Hinekî jî bi desthilat bû, lê bi van hemûyan re jî zilamekî sade û nefsbiçûk bû. Em ne bê armanc in, geracdar gelekî bi rêz li pêşiya tirembêleke ku diçû Sine cih ji me re veqetand. Bi me re hat bi heya devê geracê û em bi rê kirin.

Em bi rê ketin û ji bajêr derçûn. Ez di dilê xwe de gelekî ditirsiyam ku bi min zanibin. Ez piçekî bi xwe hatim, min bêhna xwe berda. Em hinekî din çûn. Dema min temaşe kir odeyek li ser qiraxa rê ye, ji ber alozî û maloziyan û bîrkirina têkel û pêkel ez li hîç tiştekî tênegihîştim. Hê bi tevahî em negihîştibûn cihê cih, yekser zilamekî devçeqel û rengtiryakî bi cendirmeyekî milzirav û zeîf -bi şivqeya serê xwe û bi bejn û bala xwe ya reqolî ve dibû weke kumkê pîs- hatin û pêşiya tirembêlê girtin. Min di ber xwe de got: "Ya rebî xêr be, em ji agir rizgar bûn bi ser maran de ketin." Zilamê hevalê min awirek da û got: "Ne tiştek e."

Şifêr dergehê tirembêlê vekir. Zilamê devçeqel bi kubarî ket tirembêlê, bê pirs û bixêrhatin, bi rûyêkî gij û axaftineke xav weke serxweşan û çavlixew got: "Yelleh! Bidin, zû bidin."

Her yekî derxist û pênc qiran danê, hevalê min jî ji bedêla me her duyan tumenek dayê. Lê xortekî nesekinî û pelpelok ku bi reng li çavvekiriyên gundên ser cadeyan diçû, kire qîje qîj: "Ezê ji ku bênim, nîn e, rojê tumenek jî bi dest me nakeve. Kirêya tirembêlê, delaliya geracê û fêl û finasên beqalan li dera ha, niha em pênc qiranan bidin. Min meşkek mast anîbû, têra du cem çayê û şekir pê kirî, bi Xwedê êdî hîç bi min re nemane!"

Zilamê devçeqel serê xwe di tirembêlê re dirêj kir, min di-

got qey dixwaze bangî cenderme bike û vî xortî daxin û bigirin. Lê ez nizanim hevalê min dilê wî pê şewitî, pêwendiyên wî pê ve hebûn, yan jî ji wilo ditirsiya me bi paş de vegerînin û gêre û mişkileyek.ji min re çêbibe; wext nedayê û yekser got: "Bigire."

Zilam awirek da. Pê re pê re tumenek xiste destê wî û got: "Pênc qiran ji bedêla vî xortî ve û êdî jî ji te re. Qermîçankê rûyê zilamê devçeqel piçekî ji hev kişiyan, ji kêfa hinekî beşişî û bi hêdî got: "Xwedê ji te razî be."

Ew daket û em bi riya xwe de çûn.

Xortê nesekinî dest bi axaftinan kir û got:

- Hey... hey..! Dewlet dixwaze bi pênc qiran û pênc qiranên rêwingiyê çûn û hatina dayîre û dezgehên xwe bi rê ve bibe..! Ji bo xatirê Xwedê, ma min çi ji cade û kolanên Kirmanşanê ye? Ezê ji bo çi pereyan bidim şarevaniya Kirmanşanê?"

Hevalê min got: "Kurê min, par ev axaftin dihatin kirin, dema Misediq bû. Niha bi kêr nayê û wê te bigirin û eziyetê bidin te. Hinekî hay ji devê xwe hebe."

Êdî bi van pênc qiranan weke mifteya telîsan an bi bismillaha zilamê baş rê li ber me vebû, bi bêastengî û bêqidoşî di tenişt Taqosan re, di ber yadîgara Ferhadê lehengê çîroka 'Ferhad û Şêrîn' re em çûn û di nav Derbend re derbas bûn.

Li çayxaneya Mile Mirwarî -her çiqas Remezan jî bû- em peya bûn. Ji ber hevalê min ê ku bi zilamekî mezin î oldar dihat naskirin, di enîşkekê de me xwarin xwar.

Hevalên me jî; rewşenbîrên wan ji çayê û nanxwarinê, zilamên pîr û hejar jî ji desnimêj û nimêjkirinê vebûn. Em ji nû dîsa siwar bûn û ketin rê. Te digot qey pênc qiranên bi nav û deng hê jî bereketa wan maye; em di ber çend cendermexaneyan re derbas bûn hîç gêr û astengiyek ji me re çênekirin. Lê bi rastî wiha xuya bû, hevalê min jî ji wan pênc qiranan bênirxtir nebû. Ji ber ku êdî hemû kesî ew nas dikir û cenderme

jî dema ew didîtin, bi dest silav lê dikirin. Vêca nizanim berê pênc qiran dabûn wan jî yan her bi dewlemendiya xwe weke nivîştên devgirêdanê, devê wan hişk dibû.

Tirembêlê bi wîre wîr riya xwe dibirî. Min jî bê tirs temaşeyî hevraz û serberjêr û çem û robaran dikir. Hevalê min jî bi reng ji ber tîrêjên rojê; bi rastî ji ber têrxwarin û sistbûnê di xew ve diçû. Rêwiyên din jî bi hev re diaxivîn heya gihîştin Çayxaneya (...). Em daketin. Herkes bi çayêcî û xelkê ve hatin pêşiya hevalê min. Tu nabêjî, çayxane milkê wî ye û ev xelk jî yan mirovên hejar in an jî zilamên wî ne.

Li wê derê me hinekî bêhna xwe veda. Pişt re ew ber bi Sine ketin rê, min jî ber bi avahiyê de berê xwe da kaş. Ez ne şareza bûm, min nizanîbû bi ku ve herim. Du zilamên ku kel û pelên mala hevalê min dibirin, hinekî li pêşiya min bûn. Min piçekî lezand û gihîştim wan. Her çiqas ew kurên kaş çiya bûn, lê ji ber ku barê wan giran bû, min jî di ber wan re baş dikir der!

Em bi ser şax û girekî ketin. Gundek ji me ve xuyabû. Min pirsî: Ev e gundê (...)?" Gotin: "Na! Ewê çi. Tu vê mij û morana serê wî çiyayî dibînî? Avahiya (...) li wir e."

Çiyayekî gelekî bilind û serberjêr û asê bû. Min texmîn nekir bilindahiya wî çiqas e? Heya pişt re zilamê xwediyê gund hat, carekê di nav axaftinên xwe de got: "Heft hezar pê ji derya ve bilind e."

Em di newalekê re hilkişiyan. Bêhna gul û gulzaran mirov mest dikir. Ji tenişta newalê û bi heya serê gir bax û bistan bûn. Dar û devî weke dostên bi emek û hevbîr serê xwe gihandibûn hev, te digot qey bi hev dişêwirin. Xweşik bûn û ciwaniya pelên şîn, bi xuşîna ba re bi ser hev de dişikiyan, weke muzîka xuşe xuşa avê ya ku ji serê çiya dihat xwarê; mîna dewlemend û Xwedêdayan, li ser şanoya kubaran te digot qey sema dikin û agahiya wan ji derd û mirina kesî nîn e.

Ev dîmen bi taybetî piştî demekê li zindanê, ewqasî xweşik û xemrevîn bû, bilindahiya çiya, bêtaqetî û betilandin ji bîra min biribû. Bi hêdî hêdî em bi hewa ketin heya ber bi rojava gihîştin Avahiya (....)

Piştî çend rojan xortekî Sineyî ku mirovê xanima min bû, bi serdan hate wir. Xortekî xwendevan û têgihîştî bû. Tiştê ez dizanim wî jî weke masî ji tirsa nêçîrvanan xwe veşartibû. Bi roj ji ber çûn û hatina cenderma, etar û xurdefiroşan ku gelek ji wan weke polîsên nehênî dihatin naskirin, em diçûn nav baxekî dûr ji Avahiyê.

Bax di cihekî gelekî xweş de bû. Her çiqas gêlas û mişmiş jî nêzîkî gihanê bûn, hê di ser wir re li ser serê çiyayê bilind î pişt de, çirîskên berfê xuya dikirin.

Hingî min zanî ew ava ku di nav baxê xwar re dihat, kaniya wê li cem wê berfê ye û bi ava berfê re tevlîhev dibe. Ji ber wê bi roj xuşe xuşa wê tê û bi şev dema berf cemed digire bêdeng, bi hêdî û aram dibe.

Di vî baxî de komek kirêkarên zeîf, bêhêz û rût herî çêdikirin. Dixwestin ku xaniyekî ji xwediyê bax re çêbikin.

Nava rojê serê yekî, sê nan didanê. Rojna jî dew pê re bû. Min ji Evrehmanê Baxevan pirsî: "Kirêya van çiqas e?" Got: "Hey ho! Ev îş û karê wan xizmetkirina vî baxî ye. Heger salekê teyrok û xilarîk li vî baxî tê, tiştekî wan namîne ku pê bijîn. Par saleke nexweş û nehatî bû. Zivistanê pere wergirtine di ber karê havînê de rojê bi tumenekî heya xwe gihandine biharê. Niha ji bo we evqasî kar dikin. Ew sê nanê ku didin wan jî ji qenciyê ye."

Nava rojê dema Evrehman diçû nan ji kirêkaran re bîne, me jî pere didanê da tiştekî ji me re bikire. Rojekê ji wan rojan me du tumen danê da hêkan ji me re bikire. Evrehman hat, nan li kirêkaran dabeş kir. Bi hewa ket û hate ba me. Hê çend gavek mabû bigihîje ba me, got: "Min nan û rûn ji mala Axê anî û

buhayê du tumenan jî hêk ji we re kirîn, lê çi hêk? Hêkên Hadî Xanî!"

Min ji xortê Sineyî pirsî: "Hêkên Hadî Xanî çi ne?" Got: "Bi Xwedê, ma ez çi bêjim!"

Evrehman hat pêş, tişt û mişt danîn. Agir pêxist, çayê danî ser û hêk û nanekî baş çêkir, me her sêyan dest bi xwarinê kir. Di ser xwarinê de min ji Evrehman pirsî: "Hêkên Hadî Xanî çawa ne?" Got: "Ma te nedîtin bê ma çiqas qelew û mezin bûn? Ha wa ne, temaşeyî qaşûlên wan bike." Min got: "Evrehman ma hûn ji hêkên mezin re dibêjin Hadî Xanî?" Got: "Belê, li vî çemê Gavero wilo dibêjin. Ev jî çîroka wê heye." Min got: "De ka çîroka wan ji me re bibêje."

Evrehman zilamekî rûxweş û devliken bû. Beşişî, dest pê kir û got: "Li wî şêwlê wî aliyê me, li xwarî Ewdelan gundekî mezin û avedan lê heye. Nêzîkî du sed malî ye û navê wî Nişûr e. Ji bilî bax û hewşa zêde gelek zeviyên fireh jî hene û av û hewaya wî gundî zor xweş e. Hadî Xanî yê xwediyê gund ji bilî hemû milkê wî, xaniyekî mîna koşkê çêkiriye. Du-sê heyvên havînê bi xwe û mala xwe ve ji bo xweşiyê tê wir. Zilamekî gelekî çavteng û rezîl e, ji xeynî zilamên dewletê pê ve mişk jî nanê wî tam nakin.

Cotkarên xelkê Nişûr weke hemû gundên din xerc, bêş, pûşane, runane, kavirane, hiryane, mîwane, ferucane û bêgaraneyên xwe didin. Dexl û dan û şînewerd ew xuya ye, yan nîv bi nîv e yan jî ji sêyan yek e. Baxê wan di van salan de ji bo tapo bi wan re bi nêvî kirine. Ewên hejar û bê milk in jî dîsa xortên wan, heyvê sê rojan diçin karê giran, eger pezê wan hebe, êdî runane, puşane, kavirane û hiryane jî didin. Lê Hadî Xan, ji hemû devereke zêdetir, bi jimara her serê mirîşkekê panzdeh hêkan ji xelkên hêjar û bêmilk distîne.

Dema mala Hadî Xan tê Nişur, Koxe dikeve nav gund û mirîşkan dijmêre. Ewên ku reş bin, digre û dibe ji axa re. Pişt re

ji wan re dibêjin her yekî çiqas hêkên wî hene, bibin. Ewên hejar û bê milk ku rêncber û cotkarên karbidestan in, li deştê bi kar ve mijûl in. Jin û zarokên wan bi zembîla hêkan hildigirin û dibin mala Hadî Xan. Hadî Xan jî ji bo pîvana hêkan textek qul kiriye û li wê daniye, xizmetkarê wî texte dixe destê xwe û li ber çavê Hadî Xan hêkan dipîve. Her hêkek ku di qulê re neçû hildigire, ewê ku di qulê de jî nerawestin nabe. Xwediyê wê neçar dibe bi paş de vedigerîne û bi hêkên qelew digire. Vêca ji bo wê di vê navê de bi nav û deng bûye, ji hêkên qelew re dibêjin, 'Hêkên Hadî Xanî.'"

Min got: "Evrehman, ma çima didin? Ma çawa, tiştên wilo di qanûnê de çêdibin?" Got: "Tu çi dibêjî? Ma nedin wê çi bikin? Hadî Xan ehyan e û mala wî li bajêr e, her ew bi xwe hesab e. Wê cendermeyan bîne ser me û bi lêdan wê zikê me bidirînin."

- Vêca hûn jî hemû bibin yek û herin cem dewletê şikayeta Hadî Xan jî û cendermeyan jî bikin.

- Belê di dema Dr. Misediq de me wilo kir û ez bi xwe jî niha derbiderê wê me: Diya min hêk biribûn mala Hadî Xan, hêk di qula text de ne sekinîbûn, zilamê xizmetkar hemû hêk li serê diya min a porspî şikandibûn. Dema êvarî ez ji kar hatim, serê xwe şûştibû, qala tiştekî nekir da ku ez rastî mişkileyan nebim. Lê ciranên me ji min re gotin. Min jî bi wê hêlakî û bêtaqetiyê ve rahişt dasa xwe û ez çûm mala Hadî Xan da ku weke ketê milê wî bibirim. Baş bû çûbû Sine. Ji bedêla wî min zilamê xizmetkar girt û sûravserkê Hadî Xan di serê wî re derxist. Heya ku nema xwe lebitand min lêda û min serê wî bi dusê cihan şikand. Êdî dinya bû weke mastê meyandî û nema qala hêkan hat kirin. Heya ku desthilatdariya Misediq nema. Ji nû ve dîsa Hadî Xan ji car caran xerabtir dest bi zilm û zorê kir û cenderme anîn da ku min bigirin. Min jî ji ber bazda û va ye ez li vir baxevan im.. Lê birayê min ê piçûk kete destê

wan û ew girtin. Niha li Kirmanşahê, di zindanê de ye. Ma we nedît, dema hûn hatin ez jî di tirembêlê de bûm û bi ser zilamê devçeqel de hilbûm. Ez çûbûm Kirmanşahê, min serek dabû birayê xwe.

- Evrehman, wê demê te got min mast aniye firotinê.

- Erê çawa? Ma ez bêjim ez Evrehman im û bila min bigirin. Wele bes min mast nebiribû firotinê, lê wekî din hemû axaftinên min rast bûn. Dema ku min mast dibir firotinê, ew hemû hatibûn serê min.

- Evrehman, cotkar bi tenê nikarin li beramber xan û beg û cendirmeyan rawestin. Bi rewşenbîr û zehmetkêşên bajaran re bi rê kevin. Ew xwendevan in û riyên kar baştir dizanin. Bila we fêr bikin.

- Erê ev baş e. Ne xwendevan weke koran in. Ji ku dizanin wê çi bikin? Niha divê em bajar bi bajar pey wan de bigerin yan divê ew bên û me fêr bikin? Her çawa be, wan nanek ji berhemê renca me xwariye?

- Gotina te ye Evrehman, lê nelezîne, bila ew jî bi tevahî xwe tê bigihînin, êdî wê we jî fêr bikin.

- Erê weleh, em jî ji darê tirpanê jî amadetir in. Belkî em hemû bi hev re bikaribin pîrejin, mirîşk û hêkan ji vê gêre û nexweşiyê rizgar bikin.

# Ji bedêla pereyên bertîlê ve xwendina Qur'anê

Berî Şerê Cîhanê yê Duyem rojekê saet heştê sibehê bû. Giruhban Rezaî, serokê Qereqola Cendermeyan a Bokanê, hate dayîreyê û çû odeya xwe, li pişt maseya xwe rûnişt. Cigareya xwe pêxist û bawişkiya. Destekî xwe dabû ber çena xwe, bi destê din jî car caran cigareya xwe dixist nav lêvên xwe û mijeke tund lê dida, devê xwe vedikir, dûkêl di pey hev re ji devê wî dibû rêz. Ji ser maseyê bi heya aqdê xetek weke pêçana mar kişiyabû. Te digot qey parçeyekî sersotê ye, şewitiye di nav menqelê zivistana mala feqîrekî de û dûkêl dike. Ji ber sermayê dergeh yan pencereyê venakin û bi dûkêlê razî ne. Bi rastî dûkêl ne dûkêleke normal a cigareyê bû, bêhna şewitandinê jê dihat. Ewê ne şareza bûya wê bigota dûkêla tiryakê ye ku ji şevê di nava wî de maye û niha tevlî dûkêla cigareyê bûye û tê derve. Lê na, bêhna şewitandina cerg û dilê wî bû, agir ketibû nava wî, xem û xeflet, ya baştir em bêjin tirs û xofê ew bêhêz kiribû. Zû bi zû baweşk dihatinê. Xuya bû bi şev rane-

zabû, niha jî bi alîkariya cigareyê xem û xefletên şevê di serê xwe de li bêjing û moxilê dikirin. Piştî bîrkirineke zêde, ne bi dengekî serokayetî, bi dengekî ji normalê jî nermtir bang kir:

- Hiseyn Qulî!

Hiseyn Qulî ku ji hemû cendermeyan devpaktir û jêhatîtir û bi teşqeletir bû, hate hundir û bi hev re herdu piyên xwe li hev dan. Destê xwe yê rastê bi heya ber guhê xwe bilind kir, bi destê di ber guhê xwe de û bi zikê mezin te digot kûpê Terxêne ye.

Rezaî: "Çendê heyvê ye?"

Hiseyn Qulî: "Bîst û siyê heyvê ye."

Rezaî, bêhneke fireh kişand û di ber xwe de got: "Yanî hefteyek maye." Êdî berê xwe da Hiseyn Qulî.

- Vê heyvê rewşa me gelekî ne xweş e. Heger ez meaşê xwe û meaşê we jî bixwim ser hev dernaxe. Ezê pênsed tumenî ji ku bînim? Bi rastî jî ji bo vê derê pênsed tumen gelek e. Bi taybetî di biharê de, pereyên xelkê jî nemane û berhemên wan ên salane jî neketiye destê wan. Li nav wan gir û çiya belav bûne, bi îş û kar ve mijûl in, ne şikayet û şikayetkarî heye û ne jî kêşe û şer.

Hiseyn Qulî: "Vêca bila em vê heyvê hinekî deyndar bibin, pişt re emê bidin."

Rezaî: "Tiştekî seyr e, ev çendîn sal e tu cenderme yî?! Niha jî tu axaftinên wiha dikî. Ma tu nizanî ku axaftinên wilo bi serê Serheng de naçin? Tiştekî wiha bibihîze wê me hemûyan ji vir biguhêze. Dibe ku astengiyan jî ji me re çêke. Eger em kel û pelên xwe jî bifiroşin divê em pereyan jê re temam bikin. Lê ew deynê ku tu dibêjî, em dikarin di nav xwe de kom bikin. Yanî vê heyvê emê tene bi meaşê xwe bijîn û pişt re emê dest pê bikin."

Hiseyn Qulî: "Belê belê ez têgihîştim, niha çiqas ji pereyên Serheng kêm e?"

Rezaî: "Dused tumen."

Hiseyn Qulî: "Xwedê te bihêle, ma dused tumen çi ye? Dewriyekê bide min, dewriyeke din jî bide Receb Qulî, emê pereyên Serheng jî temam bikin û wê hinek ji we re jî bimîne."

Rezaî: "Ewên ku bimînin ez bêyî we naxwim, lê ma di hefteyekê de ev tê kirin?"

Hiseyn Qulî: "Çima nayê kirin? Çare nîn e. Madem em zilamê dewletê ne, divê em zehmetiyê bikşînin."

Rezaî: "Ez çiqas tînim bîra xwe, difikirim, niha dewriyeke wiha nîn e li hemû gundan bigere, tenê dosyaya mazatê* ya par heye. Niha bi vê biharê jî mazata çi? Eger kar mezin bibe û bigihîje gilî û gazin û hawarê, emê tûşî teşqeleyeke mezin bibin."

Hiseyn Qulî: "Nexêr, ez nahêlim bigihîjê şikayet û tiştên wiha. Ez bi xwe dizanim ezê çi bikim. Tu ji min re binivîse."

Rezaî dema dosyeya mazadî ya par derdixe, dibêje: "Çar qezayên Bokan hene: Turcan, Yeltemir, Yextecî, Behê. Bi hemûyan dused û çil gund in."

Hiseyn Qulî axaftina Rezaî birî û got: "Na, na! Turcan û Yeltemir rût û qût in. Wilo zû tiştek ji wan venabe. Min rê bike Yextecî. Receb Qulî jî bila here Behê."

Rezaî hinekî ji xwe re fikirî, dest avêt qelem û nivîsî:

"Cenderme Hesen Qulî! Pêwîst e here ba xwedî milkên Qezaya Yextecî. Her kesê ku mazada par li wan maye, yekser bar bike û bişîne Mehabad. Eger li mahneyan geriyan, wan bînin vê derê."

Hiseyn Qulî û du cenderme tivingên xwe avêtin milê xwe, siwar bûn û çûn. Dizanîbû ku der bi berhem e ku der bê ber-

* Mazat: Ji xwedîmilkan hinek genim distandin, bi wî şiklî ku ji wan zêde ye û pêwîstiya wan pê nîn e. Dewletê ji bedêla wî genimî de yan pere nedida yan jî tiştekî kêm dida.

hem e. Xwedî milkên ku têkiliyên wan bi serleşker û Serheng re hebûn, nêzîk nedibûn û di ser wan re dibihûrîn. Berê xwe da xwedî milkê navendî. Ewê mazad li ser mabû 15-20 tumen ji wan distandin, ewên ku lê jî nemabûn digot, navê te jî bi wan re hatiye. Here Bokan cem serokê cendermeyan, belkî li wê derê bê diyarkirin ka te daye yan na.

Li ber hev didan û diçûn vî alî û wî alî heya dawiyê bi 5-6 tumenan razî dibûn da ku ew rê nekevê pêşiya wan.

Hiseyn Qulî di 4-5 rojan de dused tumen kom kir. Êdî hewl dida zêdetir bi dest bixe. Nêzîkê nîvro gihîşte Gundê Kanîtomar. Li wir firavîn xwar û li Seyd Hesenê xwedî milkê gund mahne kirin da ku wî bi rê bike Bokan. Seyd Hesen ji xwar ve û Hiseyn Qulî ji banî ve pê de hatin û dest bi bazarê kirin. Piştî axaftineke zêde bi deh tumenan li hev hatin. Hiseyn Qulî deh tumenên xwe wergirtin û ber bi Hecîkent ve ket rê. Berêvarkî gihîşt Hecîkent. Hesen Axayê Hecîkent li dîwanxaneyê bi çend mêvanan re rûniştibû. Dema ji dûr ve çavê wî bi cendermeyan ket, yekser bang kir Mîrza û got: " Here, bi çi rengî be karekî wiha bike da ku herin, bila nebin mûyê ber bêvilê li mêvanan."

Mîrza ber bi wan ve çû, bi wan re dest bi bazarê kir da ku wê şevê ji wan bikire; her çiqas be bide da herin gundekî din. Hiseyn Qulî ji bîst tumenan û Mîrza ji pênc tumenan dest pê kirin. Ew tumen tumen dihat bi xwar ve û ev jî tumen tumen diçû bi banî ve. Hiseyn Qulî ji duwanzdeh tumenan daneket. Dema Mîrza temaşe kir ku ji duwanzdeh tumenan nayê xwar, duwanzdeh tumen danê. Hiseyn Qulî wergirt û xist paşila xwe, kêfa wî hat û ber bi Daregirdele ket rê.

Roj çû ava ew gihîşt wir. Li mala Mam Elî daketin. Ew çende Daregirdele gundekî hejar bû, dîwanxaneyeke Mam Elî ya wilo jî nebû ku cihê bêhnvedanê be. Lê bûbû şev û cihekî cendermeyan jî nebû, neçar man li wir bimînin.

Hiseyn Qulî şeveqê jî xew rabû. Di ber malan re çû, da here ser hewz dest û rûyê xwe bişo. Li ber dergehê malekê dengê Quranxwendinê dihat. Li wir rawestiya. Fikirî û di dilê xwe de got: 'Ev her kî be yan mela ye yan hecî ye, seyîd e, tiştekî wiha ye. Dibe ku şivqe jî li serê wî nebe. Ku wilo bê tiştek jê bi dest dikeve.'

Bîrkirina wî bi reng û tevgerên cendermeyan rast bû. Ji ber ku dewletê qanûnek derxistibû ku divabû hemû kes çakêt û pantelon li ber be û şivqe jî li serê wî be. Cil û bergên kurdî ku bergên neteweyî yên kurdan bûn, qedexe bû. Her yekî ku li ber ba li gor wê qanûnê tûşî gelek astengiyan dibû.

Hiseyn Qulî bêpirs û ra çûye jor. Mele Kerîm ku zilamekî pîr, rehspî û melayê gund bû, nimêja sibehê kiribû, hê li sicadeyê ber bi qublet rûniştibû û Qur'an dixwend. Metika Menîce ya jina wî çayê çêkiribû û li cem rûniştibû heya ku Mela ji xwendina Qur'anê vebe.

Mela Kerîm dema zanî wê şeveqê ji bedêla xêr û bereketê ve ew bela jê re çêbûye, spî bû û xwendina Qur'anê lê tek çû. Bixêrhatina Hiseyn Qulî kir û ji jina xwe re got: "Wê çayê dagire."

Hiseyn Qulî bi nîv kurdî û nîv tirkiyekê got: "Ez çayê venaxwim, ezê herim mala Mam Elî. Zû xwe amade bike, divê tu werî Bokan."

Mela: "Ez ne di riya hîç tiştekî de me, tu karê min bi baş û xerabiya dinyayê nîn e. Pîr û ketî me, ezê ji bo çi werim Bokan?"

Hiseyn Qulî: "Tu rêz li qanûnên dewletê nagrî, ne şivqe li serê te ye û ne jî çakêt û pantelon. Ma ev ne bêqanûnî ye?"

Heme Şerîfê cîranê Mela, dema temaşe kir ku cenderme çûn mala Mela, yekser hat da ku bi çi rengî be, Mela ji destê cendermeyan rizgar bike.

Heme Şerîf berê xwe da Hiseyn Qulî:

- Kuro şerm e, tu çi ji vî zilamî dixwazî! Ev wê çawa bikaribe were Bokan? Dev jê berde, qencî tiştekî baş e.

Hiseyn Qulî: "Ez zilamê dewletê me û van axaftinan jî nizanim. Divê ez fermana dewletê bi cih bînim." Heme Şerîf, Hiseyn Qulî bir hewşê, hinekî kirin piste pist bi hev re û hatin jor. Heme Şerîf got: "Min ew bi pênc tumenan razî kiriye da ku dev ji te berde, meyzînin ka hûn pênc tumenan jê re peyda nakin."

Jina Melê, jineke pîr û hişk û hola bû. Ji tirsan dilerizî, bi zorê rabû ser xwe û destê xwe bir nav bexçik û mexçikên xwe. Dawiyê du tumen dîtin. Ew dan dest Heme Şerîf û got: "Bi Xwedê, ji van zêdetir di mala me de nîn in." Heme Şerîf jî li bêrîka xwe xebitî, tumenek tê de dît, derxist û bi du tumenên Jina Melê re da dest Hiseyn Qulî û got: "Nîn e, tiştekî wan nîn e! Wa ye li ber çavê te bi xwe min tumenek xist ser. Ê min jî ew tenê bû, naxwe min texsîr nedikir."

Hiseyn Qulî, dema zanî ku tiştekî din ji dest wan dernayê, sê tumen wergirtin û berê xwe da Melê:

- Mamoste, ez ji bo xatirê Qur'anê werdigirim. Vêca ev dusê heyv in dayika min miriye. Ji bedêla wan her du tumenên din jî Qur'anê ji dayika min re bixwîne!

# Ne bi dîtina hecî ne bi xewa mizgeftê

Dîsa wê rojê bê dilê wî ew biribûn kar. Ji gava ku ro avêt heta çû ava nehiştin bêhna xwe jî vede. Wê roja biharê pê de ew westandibûn. Kesê berpirs devê wî vebûna venebûna dest bi çêran dikir. Te digot qey devê wî çerxa aş e, gav bi gav te hew dît qîre qîr pêket.

Bayîz xortekî jîrek û li ser xwe bû. Gelekî ji xwe razî û bawer bû, lê nedixwest galegalê bi zilamekî re bike ku ji tirsa kar û kirêkaran bûye bermaxwirê Axa û wiha bi rûreşî dengê xwe bi ser hevalê wî de hilde. Wê rojê jî heya êvarî herî strabûn ji mala Axê re. Êvarî, ber bi rojava bi dest û piyên herî ve hat malê. Tûrikê wî yê ku çaydana bafûn, piyale, binik û hinek çay û şekir tê de bû, da dest jina xwe. Çû ser kaniyê, dest û piyên xwe şûştin û hat.

Xezala jina wî şorba bi hêk çêkiribû, jê re rûkir. Bayîz dusê parî nan hûrkir şorbê. Heya Xezal agir kir û bi çayê ve mijûl bû, Bayîz ji nêza bi xwe jî nizanîbû çawa ew pillor xwar.

Xezal: "Hinek xwarin maye, ma ez ji te re rûkim?"

Bayîz: "Min navê, na, ji min re rûmeke!" Kîsikê xwe yî tûtinê derxist. Cigareyek pêça û pêxist. Carna mizekê lêdida û temaşeyî çaydana reş î li ser êgir dikir.

Xezal gelekî xembar bû, li Bayîz dimeyizand. Wê êvarê bê deng û mat bû. Xezal carekê di dilê xwe de digot: 'Dibe ku berpirsê wî pê pev çûbe.' Carna jî digot: 'Bi van rojên dirêj karê heriyê kiriye, bêhêz û hêlak bûye.' Dilê wê hebû jê bipirse, lê poşman bû, got her çibe bila bibe ez neyînim bîra wî çêtir e.

Çay çêbû. Xezalê piyaleyek jê re dagirt û bi rûyekî xweş li ber danî û got: "Çayeke xweş e, dema xwe baş berdaye, vexwe da ez ji te re dagirim, belkî westa te bigre."

Bayîz ji ber bîr û ramanên xwe hay ji wê dilsoziya Xezalê nebû. Rahişt piyala çayê û dest pê kir vexwar. Tama çayê axaftinên Xezalê anîn bîra wî û got: "Destê te xweş be, tu rast dibêjî, ji min re dagire da ez bêhna xwe berdim!"

Xezalê jê re dagirt. Te digot belkî Bayîz rojiya xwe dişkîne, cigareyeke din pêça, pêxist, weke ku di bîrkirina xwe de gihîştibe biryara dawî, hilmeke din bi tundî li cigareya xwe da, bi pêkenîneke sar got: "Bi palûteyan me dikujin, nahêlin em îş û karekî ji xwe re bikin. Ya herî baş, em serê xwe hilgirin û herin."

Xezal: "Baş e, ma tu dixwazî em biçin kûderê? Em herin ku derê, her wiha ye. Axa û Koxe û Gizîr, qir bikevê nav hemûyan, li hemû gundan hene."

Bayîz: "Ew tu çi dibêjî? Ez ji derdê van serê xwe hildigirim. Hîç nakim herim ciyekî rojek erê, rojek na; Koxe were karê xwe bi min bide kirin."

Xezal: "Lê naxwe, tuyê herî ku?"

Bayîz: "Emê herin Seblax, Seblax."

Xezal: "Kuro, Bayîz! Emê li Seblaxê çawa bijîn? Ev çi xeyal e ketiye serê te?"

Bayîz: "Çima em najîn? Vê heriya ku em li vir bi palute distirin, em li wê derê bikin, emê gelekî baştir bijîn. Vêca niha ne zarokên me hene û ne tiştekî din. Em tenê du kes in. Eger em kar ji xwe re bikin, birêvebirina du kesan her peyda dibe. Wî li vir ev e rewşa me. Ji bilî paluteyan, dê û bavên me jî ji çalan dertînîn."

Xezal: "Baş e. Çawa ji te re xweş e, wilo bike."

Hinek kinc û minc û sênî û mêniyên wan hebûn, kom kirin û çûn. Çûn Seblaxê, li Taxa Berdaşekon odeyek kirê kirin û rûniştin. Hemû rojan Bayîz diçû kirêkarîyê. Jiyana wan li gor dema ku li Gêçawa bûn, bi gelekî baştir bû. Hêdî hêdî hinek pere kom kirin. Bayîz li Gundê Şarewêran şareza bû. Vê dema li Mehabadê jî hinekî çavê wî vebûbûn. Dest bi çûn û hatina gundan kir. Hêk, mirîşk, rûn, penîr, fêkî, şînayî û tiştên wiha dikirîn û dianîn li Mehabadê difirotin. Heya dawiyê dikanek kirê kir û bû dikandar. Êdî xaniyekî serbixwe jî girt.

Xortekî rastgo bû. Fen û fêl li kiryaran nedikir. Ewqas tê ve neçû, gelek dost û heval peyda kirin. Xelkên Kêçawa û wan derdoran, bazara wan li ba Bayîz bû. Xizm û dost û hevalên wî dema dihatin bajêr li ba wî dibûn mêvan. Di nav çend salan de du zarokên wan jî çêbûn. Êdî xaniyê wan biçûk bû û cihê wan tê de nebû. Bi Xezalê re tedbîra xwe danîn da ku xaniyekî bikirin.

Bayîz dest bi pirsê kir û delal (tellal) agahdar kirin. Xaniyek li Taxa Quleqebran dît û kirî. Êdî bi yek carî bêhna xwe berda.

Têkiliyên wî yên bi dost û cîranan re tesîr li Bayîz kir. Bi wan re çû mala şêx û bû sofî. Bayîzê Gêçawayî bû Sofî Bayîz. Her şev berî banga melê diçû mizgeftê, xitm û cemaet dikirin.

Ji roja yekem ve ku mala wî çû wê taxê gelek caran dema sibeha diçû mizgeftê, Hecî Rehîm berî wî, li wir bû. Di dilê xwe de digot: 'Ev Hecî çi zilamekî ayînperest e. Wisa xuya ye

bi şev dema radize her xitm û cemaet di xeyala wî de ne.' Hêdî hêdî bû dostê Hecî Rehîm. Heya Mele dihat û bang dida, Hecî ji Bayîz re diaxivî û çîrok digotin. Axaftinên Hecî zêdetir li ser çûna Hecê bûn. Xeyala Hecê ketibû serê Sofî Bayîz. Axaftinên Hecî roj bi roj pê xweştir dibûn.

Şevekê Hecî got: "Sofî Bayîz! Weke min bihîstiye çûn û hatin û mêvanên te zêde ne. Zarokên te jî hene."

Bayîz: "Bi alîkariya Xwedê û hîmmeta şêx, xulamên te bin, du hene."

Hecî: "Ê jin, kî te li mal heye, mêvanan bi rê bike û zarokan jî bixew bike?"

Bayîz: "Welle, her dayika zarokan e."

Hecî: "Sofî Bayîz, tu zilamekî ji Xwedê bi tirs î, tu çawa vê zilmê li wê jinê dikî?"

Bayîz: "Hecî Can! Dê û xwişkên min nîn in. Pîreka min jî tu kesî wê nîn e. Eger na, ez dizanim ew jin gelekî hêlak dibe, lê çare çi ye?"

Hecî: "Çawa çare nîn e? Şerîeta Xwedê û pêxember rê daye, jineke din bîne. Hem sinet e û wê hem jî mala te bi rê ve bibin. Hezar nexweşî û serêşî heye. Yek ji wan nexweş dikeve, ya din wê çavê wê li zarokan be û mêvanên te bi rê bike. Yek ji wan ducanî dibe, ya din wê kar bike. Şikir, rewşa te jî baş e. Li ser xwedîkirinê jî tu astengî ji te re çênabin."

Bayîz: "Axaftinên te baş in, lê pîreka min jineke gelekî baş e, bi min re gelek nexweşî dîtine, ji dilê min nayê ez dilê wê bişkînim."

Hecî: "Bê qeza be! Ew hemû zilamên ku du jin û sê jinan tînin, ma xwe ne pîrekên wan ên pêşî hemû xerab in û dîsa jî jineke din tînin?"

Ev xeyal di serê Bayîz de cemidî, bîr kir ku jineke wiha bibîne ku bi jina wî re jî bi rê keve û bi kêrî malê jî be. Piştî fikirîna çend rojan dawiyê biryar da. Ji Hecî Rehîm pirsî: "Wê

şevê te tedbîreke baş ji min re kir. Tu bi xwe xelkê vê taxê yî, ma tu jineke baş nas nakî?"

Hecî: "Çawa nas nakim? Keça Hecî Kerîmê me, Zêba. Tu li vî bajarî hemûyî bigerî, jineke wiha nabînî. Hecî Kerîm xelkê vê taxê ye û bi zilamekî maqûl tê naskirin. Zilamekî dewlemend e û çavên wî ne li malê te ye, xwedî xizm û eşîret e. Tu jî zilamekî bi tenê yî, gelekî pêwîst e zilamekî wiha li pişta te be. Hezar tengavî di dinyayê de hene. Keça wî jî qert e. Bi tenê û bê zarok e, baş bi kêrî malê tê."

Bayîz, Hecî Rehîm û du sê zilamên maqûl bi rê kirin mala Hecî Kerîm û Zêba xwestin. Ew li xwe mar kir, şahî jê re çê kir û guhest.

Zêba û çi Zêba! Wilo xuya dikir hingî nexweşik bû mabû û kesî ew nedixwest. Ji bo kar û bar jî weke gayê pîr, te agir li ser pişta wê bikira di xwe nedianî der. Xezal ji aliyekî ve ji bo dilê Bayîz, ji aliyekî din ve jî ji ber ku Zêba bûka nû ye, bi hemû bedbextiyên xwe ve, xizmeta wê jî dikir.

Zêba ji bedêla ku bikeve nav kar û tevgerê her ku diçû tiral û qure dibû. Weke ku Xezal kirêkar be, bi ser wê de diqîriya. Eger Bayîz karek dispartiyê, di ser guhê xwe re diavêt û digot: "Ez bi xwe ne kirêkar im, ji jina xwe ya kurmanc re bibêje!" Hêdî hêdî Bayîz jî ji pite pita wê aciz dibû. Hino hino dikir ku gotina xwe bi ser ya Bayîz jî bixe: "Here wê de kurmanc! Gundiyê gêj, aqilê te li ku bû!" Bayîz jî ji tirsa Hacî Kerîm û xizm û kesên wê, nediwêrî tiştekî ji Zêba re bibêje. Lê belê, Xezal perîşan û têkçûyî bû. Êdî gelek caran xwarin çênedikir û nan nedipat. Her rojê şer, pevçûn û qar û qîj bû.

Şevekê heta nîvê şevê Zêbayê bi ser Xezal û Bayîz de diqîjand û bi wan re şer kir. Di dawiyê de Bayîz lihêfa xwe hilgirt û çû mizgeftê da ku li wir rakeve û sibê rabe here ser karê xwe. Dema ku çû hundirê mizgeftê, dît ku seriyek ji bin cilika nimêjê rabû. Ew Hacî Rehîm bû. Bayîz bi mirûstirşî silavek

dayê.

Hacî Rehîm: "Eleykumeselam! Were birayê min. Were tu gelekî bi xêr hatî!"

Bayîz bi sistî bersiva wî da.

Hecî: "Çi ye, çi qewimî? Tu çima wiha belengaz î?"

Bayîz: "Rebî, mala te wêran be! Tu ji kur û keç bibî ku te ev yek anî serê min."

Hecî dest bi henekan kir: "De de! Ne hewce ye ku tu bixeyidî, ka were, were. Ha li wirê ji xwe re raze. Eşîra Hecî Kerîm her wilo ne. Ew adeta wan e, hinekî tûj in. Xwişka Hecî Kerîm jî bi min û jina min a mezin re her wilo tevdigere. Ma qey Xweda qebûl dike ku ez bi tenê li mizgeftê razêm?"

Bayîz ji qehran bersiva wî neda, ji xwe re çû li dereke din xwe dirêj kir. Lê belê, bi tu awayî xewa wî nehat. Li vê rewşa xwe difikirî ku çawa bi destê xwe mala xwe xera kiriye: "Heke ez li Kêçawa bi zor diçûm kar, qe nebe ez bi şev li malê bêhna min derdiket. Niha karê min jî bûye weke berê dîsa û vehesîna min a şevê jî ji kîsî min çûye. Dost û hevalên min ji min qetiyane. Xezal jî ewqasî perîşan bûye ruh pê ve nemaye. Ez ji ber axa revîm û li vê derê min bi xwe axayek danî ser serê xwe.

Hecî pê hesiya ku Bayîz xwe dide vir û wî aliyî û xewa wî nayê, got: "Camêr, xwe ewqasî aciz neke. Niha ji xwe re raze, sibehê xweşik min têbigihîne ka çi li te qewimiye. Ezê ji te re tedbîreke baş bibînim."

Bayîz, bi bole bol: " Weke tedbîra ewil! Eger îşev jî li min bibe sibe, êdî ne dîtina Hecî û ne jî xewa mizgeftê!"

# Çaya dîwanxanê

Dîwanxane nû kiribûn, dîwarê wê nû hatibûn sîwaxkirin. Her sê pencereyên wê şûştibûn. Merşên nû û baş lê raxistibûn. Lê pêwîst nedikir xwe bi hêwanê ve biwestînin. Herweha ne li bendê bûn ku her ji du rojan carekê Axa û siwarên xwe dakevin û bibin mêvan; Axa li hundir û noker jî li hêwanê bên mêvandarîkirin. Ji ber ku Mîrza Rehman Axa bazirganekî Seb-lax (Mehabadî) bû û hê nû Gundê Qacir ji kurê Heme Salih Xan ji bedêla deyn û faîza deynan ve, sitandibû.

Ne êl û eşîreta wî hebû, ne jî xizm û qewmên xwedîmilk. Çiqas ji xwedîmilkên wan derdoran dewlemendtir û xwedîpe-retir bû, lê Axawatên Debukirî û begzadeyên Feyzullah Beg, her bi qumaşfiroşekî Mehabadî lê temaşe dikirin. Ew nedixis-tin rêza xwe û ewqas qîmet pê nedidan ku zû bi zû serdana wî bikin. Ne siwarekî baş, ne jî nêçîrvanekî baş bû heya ku di nav nêçîrvanan de cih bidinê da car caran piştî nêçîrê li mala wî peya bin.

Mîrza Rehman Axayê ku bi dirêjayiya jiyana xwe di nav vî xelkê dinyayê de, tenê bi ser Xanim û aşpêjê mal û şagirtiyê dikanê de ferman dabû, niha dema didît xwedîmilk e û şêstheftê malên hejar di ber destan de ye, di dilê xwe de digot: 'Şende ji mende ne kêmtir e, çiqas ez berê Mehabadî û qumaşfiroş jî bim, niha ez derebegekî temam im. Ji şeş beşên vî gundî berpirsiyar im û kesek ji min mezintir nîn e. Ya herî baş ew e dîwanxaneyeke min hebe da ku malên hejar ji min bitirsin û axa û beg jî henekên xwe bi min nekin.' Vêca dest bi xemilandina dîwanxaneyê kir. Du nokerên siwarî û çayêciyek jî girt. Ferman da û li hêwanê yek-du ber raxistin. Maseyeke mezin, baş û qewîn lê danî, semawerekî xweşik û mezin, çaydaneke sor î çînî, yek-du dest piyale û jêrpiyale, sêniya jêrpiyale, qendan û qotiya çayê, maşik û dûkêlkêş, sîtil û xelaz û tiştên ji vî babetî li hêwanê amade kir.

Melayê gund, rehspî û koxeyên Qacir yek bi yek û cot bi cot dihatin bixêrhatin û pîrozbahiya Axayê nû. Xuya ye bi destê betal jî nedihatin, her yek ji wan gîskek, kûpek rûn, kûpek penîr yan qet nebe mirîşkek yan jî 15-20 hêk bi xwe re dianîn.

Mîrza Rehman Axa, dema çavên wî bi vê xêr û bêrê ket ku ji xwe re bi ser de dirije, ji kêfan roj bi roj qelew dibû û cihê wî di eyarê wî de nedima, weke axa û began bang dikir:

- Kî li wê derê ye?

Yek ji nokeran yan çayêcî:

- Fermo, fermo, Axa.

- Çayê werîne!

Çayêcî, çayê dadigirt, piyaleya çayê didanî ser sêniyê û çend qend didanî ber. Yekî ji nokeran radihiştiyê û dibir hundir. Ji aliyê serî ve dest pê dikir û li ber mêvanekî didanî. Dîsa dihat piyaleyeke din dibir. Weke çayxaneyan çênedibû du-sê piyaleyan bi hev re bibe, ji ber ku dîwanxaneya axa û began wisa ne; divê her bi piyale piyale çayê bibin û deynin.

Resu, berî niha jî demekê bûbû çayêciyê dîwanxaneyan, ji çayêcîtiya axayan baş fêm dikir. Şeveqan zû, berî ku roj derkeve bin semawer pêdixist, bi şev heya dema razanan nedihişt vemire. Bi dirêjayiya rojê û hinekî ji şevê her ku Axa bang dikir, "Çayê bînin!", Resu yekser çayê dadigirt, qet dereng nedima û mehne nedikirin. Bi vî awayî çend heyv bi ser de çû. Mîrza Rehman Axa fêrî rê û şivîleyên axatiyê bûbû. Fêm kir ku malên hejar nerm in, bi çi aliyekî de hefsarê wan bikşînê wê bi wir de herin, êdî pêwîst nedidît ku her hejarek were diwanxaneyê bi piyaleyeke çayê wan bike mêvan, ya baştir em bêjin, wan ji rê derxe-. Jixwe niha jî cejnane û pîrozbahiyane nemaye. Çi wextekî dihatin dîwanxaneyê jî ji bo gilîkirinê bû. Mesele, gayê Sofî Rehîm çûye nav baxê Heme Kerîm yan vî ava wî girtiye û tiştên din ên wiha... Êdî ji bo kar û barê wiha ku qet xêrek tê de nîn e, pêwîst jî nake ew çayê vexwin.

Şevekê Mîrza Rehman Axa li mal bi kirêkaran re diaxivî, bi hemû rengekî li ber xwe dida ku meseleya çayê çareser bike. Di dilê xwe de digot:

- Ev beg û axa aqlê wan wilo ye, ji ber wê dikevin bin deyn û faîzan û milkên wan ji dest wan diçe. Li dikanê dema kiryarek tê û buhayê sed-dused tumenî qumaş ji me dikire, serê tumen du qiran yan jî ji sedî bîst me fêde dikir. Ji nû heya ku me çayek ji wan re dixwest. Niha zilamê kurmanc tê û dibêje, Sofî Rehîm ziyan kirine, ez jî bang bikimê û bê da çayê jê re bînin? Ev karekî gêjane ye.

Xanim, yekser Mîrza Rehman agahdar kir û got:

- Axa! Qend û çayê incex têrî du-sê rojan bike, hê ji niha ve bişîne Bokan qend û çayê bikire.

Mîrza Rehman got: "Çi zû xelas bû? Niha bû min çayê û qend kirî?"

Xanim: "Ev tu çi dibêjî? Ji te weye weke caran e û em li bajêr in? Ew qend û çaya ku bi salekê me li bajar dixwar, niha

15-20 rojan tê xwarin. Zêdetir jî. Ne ji xwe re em bûne xwedî milk û Axayê gund! Vêca eger wilo berdewam bike nagihîje du salên din wê sermiyanê me yê bazirganiyê jî ji destê me here. Ji nû ve li rûyê me nayê em herin bajêr jî." Axaftinên Xanimê gelekî bi dilê Mîrza Rehman Axa bûn, lê nedixwest xwe bişkîne, got: "Xanim, divê ji bîra te neçe ku niha em ne dikandarê Mehabadî ne. Niha em xwedîmilk û axa ne, di rêza wan axa û begzadeyan de ne. Pêşiyên me gotine, 'Mezinatî serfiyetê divê'. Dîwanxane û nan û xwarina me divê hebe. Eger ne, emê bihetikin û hîç kesek me bi zilam nadeyne. Niha ne dema berhemên kişt û kal e, bila bigihê êdî tuê bizanibî milk çawa bi xêr û bereket e. Ji van 60-70 malên gund, ji nêzîkayî ve ji çaran yek berhemên wan ê me ye. Milk ji zêr û xezîneyan jî baştir e, qet nabire."

Xanim bêdeng bû, lê Mîrza Rehman di dilê xwe de got:

- Bila milk weke zêr û xezîneyê jî be, hesab her hesab e. Qet kesî nedîtiye ewê li bazaran ku bi hezaran jî heye şahiyekî xwe bi belaşî dabin hineke din. Ê min weke wan axa û began ji xwe re milk nehatiye destê min. Ev xwîna nava min e, hemû bi qiran qiran, bi şahî min kom kiriye. Ev dîwanxane eger çayxaneyek ba li bajar ji bilî ku zerar nedikir, wê hemû rojan fêdeyeke baş bikira. Wê xelat û şagirtiyanê çaycî û nokeran jî derxistiba û wê tiştek jî ji ber maba. Nexêr, divê ev mesele bê çareserkirin!

- Baş e, eger ez dîwanxaneya xwe daxim, bi dirêjayiya van rojan wê ev kurmanc û mirmanc bên û her yekî karekî wî heye. Wî çaxî divê ev çeq û req di nav jin û zarokên min de bê kirin. Ev jî nabe!

- Eger semawer û tişt û miştên çayê kom bikim, belkî yekser mêvanekî mezin û maqûl hat, ji ku ev tişt wilo zû wê hemû werin dîwanxaneyê? Ji bilî ku ez di nav van kurmancan de sivik bibim, dibim pizika ser zimanê beg û axayên cîran jî.

Yekser weke ku feylesofek bîr li meseleyeke gelekî girîng bike û ji xwe re îlham jê re bê, ronakî ket nav çavê Mîrza Rehman. Bi xweşî beşişî û got: "Xanim, baş e, ezê sibe bişînim qend û çayê, emê destê xwe jî pê ve bigrin."

Serê sibehê weke hemû rojan çû dîwanxaneyê. Yek-du kes hatin. Bangî Resu kir û got: "Ji wan re çayê bîne." Axaftina xwe kirin, çaya xwe vexwarin û çûn. Piştî wan bangî Resu kir dîsa û got:

- Role, kurê min! Pêwîst nake her dema ez bêjim çayê bînin, tu yekser çayê dagrî. Carekê bibêje qend nemaye, divê ez herim ji mal qend bînim, carekê bibêje çayê nemaye, carekê bibêje min ji nû av xist semawer heya ku bikele ezê bînim. Ez dibêjim, 'çayê bînin!'. Lê hûn hemû carê bi mahneyekê xwe kerr bikin.

Resu: "Belê, Axa li ser çavan."

Êdî ji wê demê ve ew qend û çaya ku li wir bû, weke tiştekî tiberk û pîroz, li cihê xwe mabû, kesî destê xwe nedidayê. Resuyê çayêcî jî bêhna xwe berdabû. Kar û pîşeyê wî ew bû: "Qend nemaye, divê ez herim ji mal bînim, ji nû min av xistiye semawer, ezê herim çayê bînim, hê av sar e..."

Çend rojan dilê Mîrza Axa ji qend û çayê rehet bûbû. Tu karê Resu jî ji "Belê Axa" û çend axaftinên din pê ve nebû. Rojekê ber nîvrokî bi dengekî bilind bû ewte ewta kûçikan. Dida xuyakirin ku çend mirovên biyanî hatine nav gund. Dema di pencereya dîwanxaneyê re Mîrza Rehman Axa temaşe kir, dît ku pênc-şeş siwar cenderme gihîştin nav gund. Ewê li pêşiya wan bê tiving bû. Xuya bû ku efserê wan e. Mîrza Rehman, Resu şande malê da ku bibêje cenderme hatine û zû ji wan re xwarinê amade bikin. Ew û bi du nokerên xwe ve hatin xwar û çûn bi heya sikakê pêşwaziya wan. Bang kir sêçar hejaran jî da ku hespê cendermeyan bibin girêbidin. Efser û cendermeyên xwe peya bûn. Mîrza Rehman bi bixêrhatin ve

ew dan pêşiya xwe û çûn dîwanxaneyê. Çiqas dikir ku yek-du peyvên farîsî ku di zarokatiya xwe de fêr bûbû yan bi dirêjayiya temenê xwe de bihîstibû, bîne bîra xwe da ku bixêrhatin û şelafiyan ji wan re bike! Qermiçonkên nav çavên xwe ji hev kişandibûn û zû bi zû devê xwe ber guhên xwe da ku ji wan re bide xuyakirin ku bi hatina wan şahî di dilê wî de digere. Car caran weke gayê cot ku dasu girtibe zimanê xwe dipêça, devê xwe zirav dikir û wûşeyên farisî nîve nîvî û têkçûyî derdiketin da ku efser tê bigihîjîne ku bapîrê wî yî mezin jî mehîr û şelem nexwariye, ewqasî fars e ji Kaşaniyan jî bêhtir! Bê rawestan digot: "Hûn gelekî bi xêr hatin, ser çavê min, we ez mezin kirim, pêlava we li ser serê min." Di nav axaftinên wî de:

- Resu çayê dagre!

Resu: "Axa, qend nîn e. Va ye ezê herim ji mal bînim."

- Bi rastî, eger hûn car caran serdana van gundan nekin, diz û mirovên xerab tiştekî nahêlin.

- Resu, zû çayê bîne.

- Axa, çayê nîn e, va ye ezê herim ji ba Axajinê çayê bînim.

- Belê belê, qurban! Eger çavê we li welat nebe û car caran me mezin nekin û teşrîf neyînin, ev hejar wê har bibin û bersiva me jî nadin. Ew ji dewletê ditirsin. Eger na, guh li axaftinên Xwedê jî nagrin.

- Resu, çi li çaya te hat? De zû!

- Av sar e, hê kel nehatiye semawer.

Di wê kêliyê de efser temaşeyî cendermeyekî kir, wisa dihat xuyakirin ku bibêjê: "Ev zilam her axaftinên qelew dike. Xuya ye naxwaze piyaleyek çayê jî bide me."

Ji temaşekirina efser û cenderme ruh ji Mîrza Rehman çû. Ji ber ku baş dizanî eger bixwazin li mehneyan bigerin û teşqeleyan bikin, ji wan re ji av vexarinê jî hêsanîtir e.

Dibe ku cenderme here derve berê deh-duwanzdeh fîşekan

bide dîwarêkî yan tewla hespan yan jî di nav kayê de vala bike, pişt re dest bi pişkinînê bikin û bibînin. Êdî wî çaxî bi pereyên sê-çar sal qend û çayê jî rizgar nabe. Weke ku mar bi Mîrza Rehman Axa vede, yekser bazda hêwanê û bi sebir got:

- Kuro Resu! Tu dixwazî çi belayê bînî serê min? Çayê dagre birayê min, çayê... Weleh û bileh ez bi rastî dibêjim, kuro bi telaqê min ez bi rastî dibêjim! Dagre!!!

## FERHENGOK

Awênya: Neynik, awêne.
Çarpel: Du pê û du dest.
Dasu: Lexab, li devê ga didin.
Enwa: Saman, mal, darayî.
Erzî: Sermaye, malê taybetî, wek bibêjin 'dikana min erzî ye'.
Fils: Ji dînar piçûktir, pereyê Iraqî.
Gizîr: Axayê piçûk, şagirtî, polîs.
Goledasu: Dema di cotkirinê de li devê ga didin.
Kelên: Kun, qul, qelş.
Kemacar: Cihekî ku geya lê zêde be û heywan lê biçêrin.
Kunkê avê: Tişta ku şivan an rêncber ava xwe dixiyê.
Koxe: Axayê piçûk, cîgirê Axa.
Qiran: Ji tumen piçûktir, pereyê Îranî. Deh qiran dikin tûmenek.
Micewir: Xizmetkarê mizgeftê.
Mirawî: Ordek.
Paranewe: Mirov xwe bavêje şêxekî yan jî ji xwedê tiştekî daxwaz bike.
Piştên: Şutik.
Rehêle: Barana xweş û zêde.
Reşayiya leşker: Dema leşker bi rêz radiwestin.
Rîçewe: Di bin de, di binî ve, ji bingeh ve.
Role: Ji bo bangkirina zarok, bi taybetî kur.
Sewqat: Diyarî.
Sur û sad: Di çîrokê de bi maneya zor û birçîbûnê hatiye bikaranîn.
Şahî: Ji qiran piçûktir e, pereyê Îranî ye.
Şeştîre: Çekek e.
Şifte: Xwarinek e ku bi qîme tê çêkirin.
Şiwênwar: Tişên xwezayî yên kevin, eser.
Tayîfe: Eşîret.
Tekane: Yek zarok.
Tumen: Pereyê Îranî.
Xamoş: Mat, bêdeng.
Xeluz: Komir.
Xerîk: Mijûl.
Xwerayî: Belaş.
Zel: Qamîş, çîtik.

"Xwezî gelek kesên wek Hesen Qizilcî di nav me de hebûyana!..
Ger em ji bo xwe bin, wê gelekên wiha ji nav me rabin."

Qazî Muhemmed

Pêlewanên çîrokên Qizilcî, qet yek ji wan jî ji xwendevanên kurd re xerîb nayên. Hemû ji çîn û tebeqeyên civaka kurd hilbijartine. Mamoste Qizilcî civaka kurdan ji hemû kesî bêhtir nas kiriye. Xwendevan di van çîrokên kurt de nimûneya jiyana derebegekî zalim, kevnebegekî barkêş î kewitî, şêxekî destbir, derwêşekî zergweşên, cotkarekî zilm lê hatî kirin, zirnokerekî zimandirêj, karbidestekî bertîlxwer û biyanî, bazirganekî sûtxwer û temakar, casûsekî niştimanfiroş, jineke tenê ya bedbext û bêbeş a kurd dibîne.

Hêmin Mukriyanî

ISBN 975-7112-49-6

9 789757 112495

avesta